

Åsa Wedin

Ziman û fêrbûn

- axaftin le zaroxane û salanî berayî fêrgeda

Nûser: Åsa Wedin

Nawî kitêb be zimanî swêdî: Språkande i förskolan och grundskolans tidigare år

Weşanxaney: Studentlitteratur 2010

www.studentlitteratur.se

Nawî kitêb be zimanî kurdî:

Ziman û fêrbûn - axaftin le zaroxane û salanî berayî fêrgeda

Tercemey le swêdîyewe: Asos Şefîq

Dîzayn: Heme Zanko

Stockholm 2016

Torî Fêrkarîy Biradost www.bradost.net

Weşanxane û nûser moletyan dawê be tercemekirdinî em kitêbe bo zimanî kurdî. Em terceme kurdîye pêşkeşe be mamostayanî kurdistan, bo bazar û firoştin nîye.

Têbînî: perawêzekanî em kitêbe berhemî terceme kurdîyeken.

Em berheme be elfbêy aramî:

[https://komak.nu/Kurdi/Kteebkhane/KteebiKOMAK\\_PDF/Ziman\\_u\\_Feerbun.pdf](https://komak.nu/Kurdi/Kteebkhane/KteebiKOMAK_PDF/Ziman_u_Feerbun.pdf)

## **Pêrist**

Pêşgutar.....	4
Pajî yekem: Destpêk .....	5
Pajî dûhem: Mirovî axêwer .....	9
Pajî sêhem: Firajûtinî ziman lay zarok – Zarokî axêwer.....	19
Pajî çiwarem: Tomarî zimanekî û şêwezarî hemereng.....	30
Pajî pêncem: Tomarî akadêmîy zanyarbêj.....	40
Pajî şeşem: Le axaftinewe bo nûsîn.....	52
Pajî heftem: Janre le berayî temenda .....	65
Pajî heştem: Xwêndinewey dengdar .....	72
Pajî nohem: Axaftinî nûsirawî elektronî .....	76
Pajî dehem: Firajûtinî ziman û zanyar - rêbazêkî têkbeste.....	82
Serçawe .....	88

## Pêşgutar

Mirov, wek zorbey şîrderekanî dîke, xulyayekî behêzî heye bo karûbarî civakî û bo danûstan, belam twanay berzî afirandin û xwastî hemecor, taybete be mirov. Em kitêbe bas lewe dekat zarok û mirovî riskaw çon wêkira û be şêwazî firecor, be zimanî firecor û be destawêjî firecor, pere be danûstan deden. Mirov heta zêdetir biçête bincubinawanî û bikoşêt bo peybirdin be danûstanî mirovkar<sup>1</sup> û firajûtinî ew danûstane, pitir sersam debêt bew firerengîye sinûrbedere, bew alozî û gorane berdewame. Ewca ême derik dekeyn bewey hergîz natwanîn be teselî têbigeyn mirov çon fêrî ziman debêt û çon perey pê dedat. Ême tenha detwanîn girîmaney helkişîw darêjîn derbarey ew rewte. Lem kitêbeda demewêt wêneyekî binaxeyî pêşkeş bikem lewey deyzanîn derbarey zarok çon letek dewrûberda pere be ziman dedat û bekarî dehênêt, hem zarekî û hem be nûsîn.

Hem tojînewekanî em buware û hem ezimûnekanî jiyânî xoyişim bûnete derawî em kitêbe. Beşêkî ezimûnekanîm degerênewe bo awayî Docksta y serbe deverî Ångermanland y bakûrî Swêd, ke nişîmenîy mindalîme û lewê ezimûnekanî zimanekîy xom hatine dariştin. Kargey darbirînekey Doksta û helûmercî dewrûberî ew kargeye tawî gewrey leser firajûtinî min hebû. Xwêndinîm le fêrgekanî ew devere: Dockstaskolan, Nätorskolan û Ådalsskolan wêneyekî seretayî pê bexşîm derbarey zarawe<sup>2</sup> (dyalekt) çon dîdî mirov le xoy û le beranber derengênêt. Bo xwêndinî astî bala<sup>3</sup> autobusî fêrge be nêw Skuleskogen da rûwew bakûr deybirdîn bo Bjästa. Paşan bo xwêndinî amadeyî autobus berew başûr deybirdîn bo Kramfors. Em hatûçoyane cêgorkêyekî tenha fîzîkî nebûn, hawkat “zarawekî” îş bûn. Bebîrim dêt çon bedem rewî autobusewe hestim dekird ziman degorim.

Ew kesaney le temenî xomda tûşim hatûn, wek fêrxwaz, ferîkemamosta, mamostay astî berayî, mamostay fêrgey mamostayan û tojer, giştyan û be şêwey firecor yarîder bûn le dariştinî zanistî min derbarey zarok, ziman û fêrkarî.

Supasî taybetim bo...

Vikmanshyttan, september 2010  
Åsa Wedin

---

<sup>1</sup> Mirovkar: serbe mirov. Em paşgirî “kar” e lêreda bo awelnawe, wek sûrkar û spîkar.

<sup>2</sup> Zarawe: dialect (diyalekt). Biriwane “şêwezar”.

<sup>3</sup> Xwêndinî fêrgey bineretî kirawete sê ast: astî berayî: bo polekanî yekem ta sêhem, astî nêwend: bo polekanî çiwarem ta şeşem û ewca astî bala bo polekanî heftem ta nohem.

## Pajî yekem: Destpêk

Ziman sengî taybetî heye bo fêrge û xwêndin. Sexte karûbarêkî fêrge bidozîtewe ziman şanorey têda nebêt. Lêreda fêrge cudaye le buwarekanî dîkey civak, bo nimûne tensazî,<sup>4</sup> bazirganî û pişesazî. Le seranserî xwêndinda girînge, derikî zûtirî fêrxwaz, twana û zanistyan bikirêne serşar. Kewate ême debêt wêneyekî dirustiman hebêt lew ezimûne zimanekîyey fêrxwaz heyetî û lew twana zimanekîyaney perey pêdawin. Em kitêbe le riwangeyekî “civakî – ferhengî”<sup>5</sup>-yewe deriwanête ziman (Säljö 2005), ziman debête diyardeyekî civakî, ferhengî û mêjûkird bo tojînewe.

Zarok dêne bestênî civakîyewe û bedem beşdarbûn le afirandinî zimanda, pere be ziman deden. Zarok le nêwan jîngey zimanekîy cudawazda xerîkî hatûçon û lewêda danûstan û karlêkî firecoryan debêt letek ewane tûşyan dên. Kewate serşarî bas eweye, ême le civakêkî firezimanda dejîn û ew zarokaney le zaroxane û fêrgeda tûşyan dêyn, zûtir le bestênî cudada tûşî zimanî cuda hatûn. Ew firezimanîyey lay ewan geşey kirdûwe debêt paşan le fêrgeda pitir geşey pê bidirêt bo ewey fêrxwaz bibine mirovî firezimanî xawen twanay danûstan û karlêk letek kesani dîkey em civake firezimane. Boye firezimanetî<sup>6</sup> lem kitêbeda wek norm helsûkewtî letek dekirêt.

Nerêtî fêrge le Swêd normêkî takzimanî hebûwe. Pêşmercî xwêndin ewe bûwe gişt fêrxwazan be paşxanî wêkçûy zimanekîyewe dêne fêrge, wate yek takezimanî swêdî. Belam civakî Swêd takziman nîye û hergîz wehayîş nebûwe. Salanî 1500-1600, katêk helmetî bernamedar bo xwêndewarîy cûtyaran le Swêd xiraye ger, hemerengîy ziman berîn bû. Gel be zarawey corawcor deaxfîn, ke zoryan be sextî lay yekdî berderik<sup>7</sup> bûn. Le herêmî Tornedal<sup>8</sup> şêwezarêkî<sup>9</sup> finîy<sup>10</sup> birewî hebû cudawaz le şêwezarî dîkey birewyan hebû le deverekekanî dîkey danîştûy finîyan zor bû, betaybetî le deverî daristane berînekan. Samekan<sup>11</sup> be şêwezarî corawcorî zimanî samî dedûwan û behasanîş le nêw xoyanda berderik nebûn. Cige lewaneş, bazirganî aliman maweyek le Swêydda degeran û herweha Valonî<sup>12</sup> fransîzimanîş sengêkî gewreyan hebû le kankarîda.<sup>13</sup> Paşayetî û begzadan le serdemanêkda kemuzor fransîziman bûn û herweha grûpanî roman (dom)<sup>14</sup> - yiş lemêje be zor şiwênî welatda bilawin. Kesani kerrîş herdem hebûn û zimanî firecorîy amajeyan bekar birdûwe.

Em firezimanîye hemîşe le Swêd hebûwe, lem penca saley raburdûda firewantir bûwe, hokarîş ziyadbûnî koç, geşt û danûstane ke bal dekêşet beser herêmî êtinî û zimanekîy corawcorda. Leber ewe karêkî lebare ger xoman le normî takzimanetî labdeyn û têbigeyn ke zarok le dewrûberêkî

---

<sup>4</sup> Tensazî: tendirustî, saxlemî, be kemêk çawpoşîn debête çemikêkî giştî, saxlemîy hem leş û hem derûn degirêtewe.

<sup>5</sup> Riwaney civakî - ferhengî: sociocultural perspective.

<sup>6</sup> Firezimanetî: multilingualism. Firezimanekî: multilingual.

<sup>7</sup> Berderik: comprehensible. Dekirêt derikî bikeyt, pey pê berît, têy bigeyt.

<sup>8</sup> Tornedal: herêmêke dekewête bakûrî rojhelatî Swêd û bakûrî rojaway Fînland.

<sup>9</sup> Şêwezar: variety (linguistics). Çemikî “şêwezar” serbe buwarî zimanewaniye û mebest lêy şêweyekî zimane û xoperêze le bekarhênanî çemikî “ziman” yan “zarawe” ke car heye derhawîştêy hestyarî debêt. Biriwane “zarawe”.

<sup>10</sup> Fînî: zimanî fînî, finnish language, zimanî gelî fînî, danîştwanî welatî Fînland.

<sup>11</sup> Sam: gelêkin herêmekanî bakûrî welatanî Skandinavya û Rûsya niştîmanyane, pêy degutirêt Samestan: Sápmi, Sameland. Zimanekeyan, zimanî samî destezimanêke, wek fînî, serbe xêzanî zimane uralîyekan: uralic languages.

<sup>12</sup> Valonî: Walons, gelî herêmî Wallonia (Valon) le welatî Beljîk.

<sup>13</sup> Kankarî: mining, karkirdin le kanda bo derhênanî kerestey naxî zewî.

<sup>14</sup> Roman: romani people (dom).

firezimanda heldesûrêt û pêwîstîyan be yarmetîye bo peredan be twanay firezimanekîy xoyan. Debêt em dîde bikeyne serşar bo karûbarî zaroxane û fêrge.

Deşbêt bizanîn ke piley firezimanetî corawcore û leber ewe bestên heye bas le fêrxwazî takziman û fêrxwazî fireziman dekat. Bo nimûne ew zarokey le nêw xêzanî xoyda zimanêkî dîkey heye û hêştâ zimanî zorîne (swêdî le Swêd) be heman astî hawpolî swêdîziman - ewaney zimanî nêw xêzanyan tenha swêdîye - nazanêt, pêwîstî be cexitî zêdetire Leser geşey ziman. Kewate ew çemikey zarokî takziman û fireziman lem kitêbeda bo ew mebestane bekar dehênrên. Tenanet çemikî yekemziman û dûhemziman dête pêş bo ravekirdinî dozî peywend bew zarokey zimanî swêdî pêş yek yan çend zimanêkî dîke fêr debêt.

Helgêranewey çemikekan bewey firezimanetî bibête norm kar dekate ser dîdîman lewey fêrge çî be kêşe bizanêt. Normî takzimanetî pelkêşiman dekat berew bawerhênan bewey firezimanetî kêşeye. Le mêjûy fêrgey Swêdda debînîn ke tenha le buwarêkî berteskda twanîwmane pêdawîstîy fêrxwazî fireziman dabîn bikeyn. Edî ger firezimanetî be norm bigirîn çî karîgerîyekî debêt? Lewaney ew dem bitwanîn ew bûne hêzekîye<sup>15</sup> bibînîn ke heye le zanistî fêrxwazî firezimanda. Lewaneyîşe bibête mayey derikkirdinîman bewey fêrxwazî takziman heye pêwîstî be yarmetîye bo peredan be tomar û şêwezarî dîkey zimanekî.

Mirovî fireziman her ewe nîye çend zimanêk dezanêt, letek eweşda hunerî bekarhênanî ew zimananeş dezanêt, key û letek kê biyanxate kar. Kewate, lebirî em riwange kemasîbîney emro hemane, detwanîn ew twana, zanist û ezimûnaney fêrxwazî fireziman derik bikeyn ke legel xoyan dehênine fêrgewe.

Le nerêtî fêrgey Swêdda, fêrgey bineretî û betaybetî salî yekem, cexitî xistote ser fêrkirdinî “*sewad*”.<sup>16</sup> Betaybetî fêrbûnî xwêndinewe şanorey hebûwe. Belam mawey bîst salêk debêt sewad pitir wek rûkar le firajûtinî ziman seyr dekirên. Hawkat derikîş bewe kirawe ke dinedanî çalakîy zimanekî le zaroxane û polî amadekar<sup>17</sup> sûdbexşe nek tenha bo fêrbûnî sewad, belkû bo fêrbûnîş begîştî. Leber eweye êsta çemikî “firajûtinî ziman, sewad” birewî peyda kirdûwe û bote beşêkî girîng le çalakîyekanî ne tenha salanî berayî fêrge, belkû salanî ber le fêrgeş. Hawkat hoşyarîyş firewantir bûwe derbarey girîngîdan be firajûtinî sîstemî nûsîn le gişt mawey xwêndinda.

Em gorankarîyane bote hoy goranî ew mercaney hen Leser karmendî em buware: zaroxane, polî amadekar û salanî berayî fêrge. Zorbey mamostayan xawen birwanamey mamostayetî le salanî berayî fêrgeda, xwêndinêkî binaxeyîyan heye derbarey helûmercî firajûtinî sewad lay mindal, belam le zor barda çî xwêndinêkiyan derbarey firajûtinî ziman begîştî lay mindal, nedîwe. Mamostayan û çawdêranî zarok le zaroxane le hendêk barda core xwêndinêk debînin derbarey firajûtinî ziman lay mindal belam begîştî derbarey helûmercî firajûtinî sîstemî nûsîn nîye. Firajûtinî ziman lay ew zarokaney le jîngeyekî firezimanda gewre bûn, beşêk nîye le xwêndinî riştey mamostayetî, meger degmen.

Leber ewe mebestêkî em kitêbe pirkirdinewey ew boşayîyeye. Kitêbeke bas le helûmercî binaxeyî bo firajûtinî ziman dekat û cexitî Leser zarokî yek ta dûwazde sale, hem ew zarokey le jîngey takziman da gewre debêt û hem ewey le jîngey firezimanda.

Le pajî dûhemda mirov wek bûnewerêkî axêwer rave dekirêt. Mebest le zimanzanî, zanînî zimanêk watay çîye, herweha cudawazîy zimanî zarekî û nazarekî çîye, lêreda dêne berbas. Wêray eweş, dozî

<sup>15</sup> Bûnî hêzekî: potential, biriwane Celîzade, “*Mirov û dewrûber*”.

<sup>16</sup> Sewad: twanistî xwêndinewe û nûsîn, xwêndewarî, *Literacy*.

<sup>17</sup> Polî amadekar: polî sfir, polî ber le polî yekemî fêrge.

zimanî girîng bo karûbarî zaroxane û fêrge, bo nimûne zimanî xwêndin beranber zimanî standard û herweha pirsî cudawazîy ziman û zarawe, beser dekirênewe.

Pajî sêhem bas le helûmercî firajûtinî ziman dekat lay zarok, hem ewaney be piley yekem le jîngey takzimanda gewre debin û hem ewane le jîngey firezimanda gewre debin. Çend bîrdozeyek<sup>18</sup> derbarey firajûtinî ziman pêşkeş dekirên û herweha sengî “*bestênî civakî*” bo firajûtinî ziman rûn dekirêtewe. Betaybetîş cexit dexirête ser peywendîy nêwan firajûtinî ziman û zanyar le fêrge û zaroxaneda.

Pajî çiwarem terxane bo ravey firajûtinî tomar yan şêwezarî corawcorî zimanekî, hem firajûtinî firezimanetî û hem firajûtinî zimanî cuda bo bestênî cuda. Sengî taybet dedirête firezimanetî le zaroxane û le fêrgeda. Encamî tojînewe derbarey rêkxistinî corawcor bo xwêndinî fêrxwazî fireziman, pêşkeş dekirên.

Le pajî pêncemda, raveyekî bineretî heye derbarey ew zimaney xwêndin ke zanyarbêje<sup>19</sup> û le fêrgeda bekar dehênrêt bo derbirîn le zanyar û bedem helkişanî salanî xwêndin le fêrgeda, geşawetir debêt. Çemikî wek: *jêrxan, jûrxan, zimanî nêzîk*<sup>20</sup> û *zimanî dûr*,<sup>21</sup> û herweha “*zimanzanîy danûstên*”<sup>22</sup> û “*zimanzanîy zanyarbêj*”<sup>23</sup> gutûbêj dekirên.

Peywendîy nêwan axaftin û nûsînî corawcor le layek û “*tomarî akadêmî*”<sup>24</sup> le layek, dête berbas. Serbarî eweş karîgerîy hem “*karlêkî nêw pol*” û hem xwêndin leser geşey zimanzanîy zanyarbêjî fêrxwaz le fêrgeda, rave dekirêt.

Pajî şeşem bas le twanay firecorî zimanekî dekat ke weha başe zarok pereyan pê bidat ber lewey firajûtinî sîstemî nûsîn bikewête ger. Destpêkî em paje kurtebasêke derbarey xwêndinî zimanî nûsîn le Swêd. Ewca amojgarîy kirdekîşî têdaye bo peredan be zimanî zarok, betaybet le zaroxane û polî amadekarda. Lêreda cexit dexirête ser twanay têkstkarî<sup>25</sup> û herweha sengî karlêkî nêw pol. Ke dête ser ravey firajûtinî sîstemî nûsîn, ser sewad, cexit dexirête ser fêrxwazî serbe zimanî dîke. Tojînewe derbarey helûmercî bineretîy bo firajûtinî zarok le axaftinewe bo nûsîn, be yek yan çend zimanêk, ezimûnî welatan berawird dekat. Amojgarîş heye bo firajûtinî hemerengî le xwêndinî sîstemî nûsîn le astî cudawazda.

---

<sup>18</sup> Bîrdoze: theory, tîurî, tiyorî, nezerîye... Lem kitêbeda “bîrdoze” bekarhênrawe leber ewey le hemwan pitir xoşkar û xoşgerdane, bo nimûne bîrdoz: theorist, bîrdozekî: theoretic, theoretical, bîrdozane: theoretically, bîrdozandin: theorization û... htd.

<sup>19</sup> Zanyarbêj: peywendîy heye be zanyarewe. Lêreda zimanî xwêndinî zanyarbêj wate ew zimaney le xwêndinda bekar dêt û peywendîy heye be zanist û hunerewe. Biriwane çemikî “*zimanzanîy zanyarbêj*”.

<sup>20</sup> Zimanî nêzîk: zimanî sade, ew zimaney bekarî dehênît bo ravey basî nêzîkedest, ewey êsta û lêreda rû dedat û bîser yan xwêner agadaryetî. Bo nimûne ew zimaney dû kes bekarî dehênin bo basî babetêkî henûkeyî ke herdûkiyan pêy aşinan. Biriwane “*zimanî dûr*”.

<sup>21</sup> Zimanî dûr: zimanî ferimî, ew zimaney bekarî dehênît bo ravey basêkî dûredest, ewey kat û cêy rûdanî dûre lêman û bîser yan xwêner şarezayan nîye. Bo nimûne ew zimaney to le fêrgeda bekarî dehênît bo ravey basêkî serbe zanist û huner. Biriwane “*zimanî nêzîk*”.

<sup>22</sup> Zimanzanîy danûstên: *Basic Interpersonal Communicative Skills (BICS)*, wate twanay danûstanî rojane, bo nimûne le nêw dostanda, BICS be piley yekem basî le danûstanî rûberûwe, danûstanî doxbend û bestênbende. Bo berawird biriwane çemikî “*zimanzanîy zanyarbêj*” (CALP).

<sup>23</sup> Zimanzanîy zanyarbêj: *Cognitive Academic Language Proficiency (CALP)*, karameyî zimanzanîne le xwêndinda. Bo berawird biriwane çemikî “*zimanzanîy danûstên*” (BICS).

<sup>24</sup> Tomarî akadêmî: ew zimaney le bestênî fêrgeda, le layen mamosta, fêrxwaz û kitêbî fêrgewe bo xwêndin dête bekarhênan.

<sup>25</sup> Têkstkarî: sewadî têkst.

Le pajî heftemda, janre<sup>26</sup> genre -î cudawazî zimanekî dêne berbas ke girîngin bo firajûtinî zimanî fêrxwaz le salanî berayî fêrgeda. Janrey “bêjandin”<sup>27</sup> betaybet basî dêt. Amojgarî dedirêt derbarey çonetîy bekarhênanî bêjandin be şêwazî corawcor le xwêndinda û çon çîrokî zarekî û nûsirawî fêrxwaz detwanêt bibête dinederî firajûtinî ziman û zanyar le layan.

Pajî heştem bas le şanorey xwêndinewey dengdar dekat, wek beşêk le firajûtinî zimanî zarok. Betaybetî ravey xwêndinewey dengdar dekirêt le ferhengî cudawazda û ew derencamaney xwêndinewey dengdar le ferhengî cudawazda heyetî bo karûbarî zaroxane û fêrge. Çend rûkarêkî karîgerîyan heye leser fêrxwazî fireziman, lêreda rave dekirên.

Le pajî nohemda bas lew zimankarîye dekirêt ke zor mindal bedyar dîmenderî<sup>28</sup> komputerewe pêwey xerîkin. Amojgarîy hemecorîş dedirêt derbarey bekarhênanî komputer bo firajûtinî ziman, betaybetîş geşey sîstemî nûsîn le fêrgeda. Herweha pirsî cêwrêy bekarhênanî komputer le fêrgeda dête berbas, bo nimûne mercî zanistîy niwê, pêwîstîy stratêjî niwêy xwêndinewe û dozî serber akar û pêdagogî. Têkstî firedox,<sup>29</sup> wate têkstî weha ke nûsîn, axaftin, deng, wêne... htd têhelkêş deken, derfetî hemecor derexsênin, destawêjî elektronîş derfetî dîke bo fêrxwazî fireziman derexsênin, emane lêreda basyan dêt.

Le kotapajî dehemda, wek derfetêk bo firajûtinî ziman le zaroxane, polî amadekar û salanî berayî fêrgeda, rêbazêk rave dekirêt le rûy zimanekîyewe berokgîre. Amojgarîy berhest<sup>30</sup> pêşkeş dekirêt derbarey planrêjîy wane, be şêwazêkî weha ke yarmetîy fêrxwazî serbe zimanî dîke bidat bo firajûtinî hem ziman û hem zanyar be heman corî fêrxwazanî dîkey takzimanî poleke.

---

<sup>26</sup> Janre: genre, janr, şêwaz, cor, rêbaz.

<sup>27</sup> Bêjandin: narration, baskirdin, gêranewe. Biriwane bêjekî: narrative.

<sup>28</sup> Dîmender: display/monitor, be kirmancî: dîmender, şaşey amêrî elektronî, komputer, mobayel, televîzyon û... htd.

<sup>29</sup> Firedox: multimodal, firedoxetî multimodality, mebest lew diyardeyeye ke peyda debêt katêk têkstêk sîstemî derbirînî firecor lexo bigirêt û bewêş destawêjî firecor bekar bihênît, wek têkst, deng, wêne, enîmêşin...

<sup>30</sup> Berhest: berceste, konkîrêt – Berhestandin: concretization. Bo pêçewanekey biriwane “*derhest*”.



## Pajî dûhem: Mirovî axêwer

Mirov bewey axêwere debête bûnewerêkî tak û zimanîş bo mirov şanorey heye. Zor car ziman be wişe û rêziman bas dekirêt. Le fêrgeda zor car le mamostayanî debîstim ke bas le fêrxwazî koçhên<sup>31</sup> deken, delên: “zimanî nîye” yan “çar nîye, her debêt wişekan fêr bêt”. Emeş derbirînêkî berteske le ziman, çunke ziman zor firewantire lewey tenha wişe bêt. Nêwan dêrekan derbirîne le gelêk bas. Cige le derbirînî rastewxoy zarekî, mirov pena debate ber çend sîstemêkî dîkey sîgnaldan. Ger derbirînêkî berfirewan bo ziman bekarbihênîn detwanîn bilêyn ziman gişt corekanî danûstane.

Giyaneweranîş be sîgnalî corawcor danûstanyan heye belam tenha mirove twanay heye ziman be şeweyek bekar bihênêt derfet birexsênêt bo afirandinî derbirîn be endazeyekî sinûrbeder.

## Zimanî giyanewer

Bo peybirdin be mirov wek bûnewerêkî axêwer, weha başe berawirdêk bikeyn letek sîstemî danûstanî giyaneweran. Zor le şîrderan sîstemî helkişawî danûstanyan heye û bekarî dehênin bo agadarkirdinewey nêwxoyan. Em sîsteme be piley yekem bo parastinî bûnî corî giyanewerekeye. Hesp, bo nimûne, le doxî siruştîda giyanewerî nêçîre. Kewate pêwîstyan be sîstemî başe bo agadarî û helatin ger goştخور<sup>32</sup> nêzîk bêtewe. Hesp leber ewey be rew dejîn, sîstemî sîgnalî helkişîwyan heye bo agadarkirdinewey yekdî.

Leber eweye çawî hesp weha kewtûn riwangeyan be lay cudawazda hebêt, belam giyanewerî goştخور çawekanî weha kewtûn sêregîrî yek xal bin. Ew hespey hest be metirsîyek dekat xêra sîgnal dedate endamanî dîke reweke bewey serî beriz û giwêy cût rûwew şiwênî metirsîdar radegirêt.<sup>33</sup> Ger barekeş aram bêt ewa ser danewandin, wek ewey xerîkî lewer bêt, dekate sîgnal. Ger hespêk mebestî bêt dostayetîy beranber hespêkî dîke binwênêt, bew şeweye boy naçêt ke goştخور pelamarî nêçîr dedat, belkû be serî newîyewe, kemêk emser û ewser dekat, wek ajelêkî katî lewer. Cige leweş hesp çaw nabirine çawî yekdî çunke emyan be reftarêkî hêrişberî giyanewerî goştخور lêkdederîtewe. Lebirî ewe hesp wehay pê xoşe be tenîşt yekdyewe rawestin û seyrî şiwênî cudawaz biken. Le nêw hespekanda eme reftarêkî dostaney nêwxoye bo pasgirtin, ke dekatewe çawgêran be deruberda. Leber eweye zor car hespêk debînît le nêw rewda rawestawe û pas degirêt katêk ewane dîke rakişawin û le pişûdan.

Seg, wek giyanewerêkî dîkey malî le doxî siruştîda giyanewerêkî goştخور. Sîstemêkî firajîy heye bo pelamardanî geldestî nêçîr. Wate seg debêt twanay danûstanyan hebêt letek yekdî bo ewey katî hêriş bizawtînyan hawaheng bêt. Belam ew tundûtîjîyey pêwîste bo raw, le nêw seggelda debûwe mayey sergerdanî ger hawkat sîstemêkî sîgnalî firajîyan nebaye bo rêkxistinî fermandarî û fermanberîy nêw xoyan.

---

<sup>31</sup> Koçhên: ew mirovey koç dekat bo êre. Koçber: ew mirovey lêre koç dekat bo nişîmenêkî dîke.

<sup>32</sup> Goştخور: carnivora.

<sup>33</sup> Bedem tercemekirdinî em basewe, mamosta Rêbîn Hemed le “Fêrgey Biradost” ewe em serincey ferimû: “bo pasgirtin hemîşe dû hesp, nek yek, pas degirin. Tenanet ger tenha dû hespîş bin, herdûkiyan bo pasgirtin raste û çep dewestin. Hesp ger hest be metirsî bikat giwêy qut dekat, ger dilnyaş bû le bûnî ew metirsîye, bo agadarkirdinewey ewaney dîke, depirimênêt”.

Sîstemî sîgnalî seg wek sîstemî mirov waye çunke herdûkiyan giyanewerî goştخورin. Eme hokarêkî girînge bo ewey seg twanîwetî cêy xoy bikatewe le nêw “mirovgel” da û tenanet le nêw malekaniyanda bijyêt. Belam hesp ke giyanewerêkî nêçîre, zorî belawe sexte sîstemî sîgnalî ême derik bikat û xoy letek şêwejiyanî êmeda biguncênêt. Kewate ew mirovey bîyewêt danûstanî letek hespda baş bêt naçare xoy fêrî ew sîstemî sîgnale bikat giyanewerî nêçîr deyzanêt. Hesp wek rewegiyanewer çawî le bûnî rêberêke le metirsîy çeparey bidat. Nihênî gewreş le ramkirdinî hespda her dirustkirdinî mtimaneyê lay hespeke.

Car heye mirov têkoşîwe bo rahênanî giyanewerî corawcor bo nasînewey wişê, nîşane yan wêney weha ke mirov bekaryan dehênêt. Diyardeyekî bawe mirov bibînît seg û hespî fêrî wişey fermander kirdûwe, wek: danîşe, rakişê, raweste... Betaybetî şîmpanizêkî letek mirovda jiyawe car heye fêrbûwe nîşane û sîgnal lêk bidatewe û bekar bihênêt. Belam mirov neytwanîwe şîmpaniz fêr bikat xoy nîşaney corawcor têkbibestêt bo dirustkirdinî derbirînî watadar, bew corey zarokî biçûk deyken. Car heye mirov twanîwetî şîmpaniz fêrî zêdetir le sed wişê kirdûwe û tenanet têkbestinî beşêk lew wişaneş. Belam hergîz negeyştote ewey şîmpaniz bitwanêt rêziman fêrbêt û derbirînî tazekird pêk bînet ke zûtir tûşî nehatibêt. Keçî zarok detwanî le temenêk zûda ew kare bikat. Leber ewe deşêt bilêyn astî here berzî zimanî mirov ke şîmpaniz twanîwetî bîgatê, astî zarokî dû salane.

Belam mirov nazanêt hokarî ew helnekişaney şîmpaniz dirust çîye, aya twanay zimanekîyan kurtî dehênêt yan nexwastine. Fêrbûnî zimanî mirov lay şîmpaniz wabestey xelatkirdin bûwe be xorak, çî kunçkawyekî zimanekî le lay şîmpaniz bedî nekirawe wek ewey lay zarokî deybînît ke amaje bo şîtek dekat û delêt: “ewe çîye?”.


## Ziman çîye?

Hemû gelêk zimanekî pêkhênawe bo derbirîn lewey le nêw ew geleda pêwîstî be derbirîn hebûwe. Weha bawe ke pênc hezar ta şeş hezar zimanî mirovkar heye. Be her yek lew zimanane mirov detwanêt jimareyekî sinûrbeder le derbirîn darêjêt. Deysa ziman çîye? Zûtir gutiman “çemikêkî berfirewanî ziman” delêt ziman dekatewe gişt corekanî danûstan. Beweş em pênamey muzîk, zimanî rûxsar û ceste û tonî deng. Weha bawe mirov “zimanî zarekî” le “zimanî nazarekî” cuda bikatewe. Zimanî zarekî bo zimanî mirovkar terxan kirawe ke xawen wişê û rêzimane. Zimanî nazarekîş bo sîstemî sîgnalî giyanewerane, bo zimanî cestey mirove û bo sîstemî nîşaney bo nimûne nîşanekanî tirafîk û tonekanî muzîk.

Belam sinûrî nêwan zimanî zarekî û nazarekî tewaw rûn nîye. Gisela Håkansson (1995) pêşnyazêkî dîkey heye û cudawazîy nêwan zimanî zarekî û nazarekî be zincîrebend<sup>34</sup> debînêt. Em ristey girîmane dekate nimûne bo cemserî zarekî, areqekirdinewe û çawfirewandinî rîfilêkskaraneş dekate nimûney ewey dîkeyan. Em nîgare bo rûnkirdinewe ew zincîrebendeye:

---

<sup>34</sup> Zincîrebend: continuum.



Zimanî nazarekî taradeyekî zor nêzîke le sîstemî sîgnalî giyanewerewe. Lewaneye bo derbirînî hest dest bidat belam bo derbirînî hevbandî û encamgîrîy aloz, kemtir lebare. Zimanî zarekî dekatewe zimaney mirovkar. Emyan natwanêt tewaw cêy zimanî nazarekî bigirêtewe. Mirov natwanêt, bo nimûne, hestî behêz tenha be zimanî zarekî derbibirêt.

Tenanet “zimanî amaje” î<sup>35</sup> serbe mîlletanî corawcor, deçine xaney zimanî zarekîyewe. Zimanî amaje wêkiçûnî letek zimanî axaftinda zore belam cudawazîşî heye. Zimanî amajey mîllî her wek zimanî axafetinekey, twanay derbirînî heye le jimareyekî sinûrbederî derbirîn û begîştîş herçî be ziman bigutirêt deşêt be zimanî amajeş bête derbirîn. Zimanî amaje be heman şêwey zimanî axaftin nayete nûsîn belam baştir detwanêt sûd le “şiwên” bibînêt, bo nimûne detwanêt amaje bidat yan şiwênî nişîmen pêşan bidat.

Begîştî katêk mirov bas le ziman dekat, mebestî zimanêke xawen naw, wek swêdî, çînî û îngilîzî, belam hêştâ mebest le ziman rûn û yeklakerewe nîye. Hîç zimanêkî zîndû nîye negor û dawestaw bêt, belkû gîşt zimanêk le goranî berdewamdaye. Ewey êmey pêy delêyn zimanî swêdî le rastîda birîtiye le komelêk şêwezarî hemecor. Herêmî corawcorî ciyografîy xawen zarawe û şêwezarî corawcorî nawçeyî xoyanin. Mirovî serbe grûpî cudawazîş, “lazarî civakî”,<sup>36</sup> lazarî grûp, lazarî gelêr<sup>37</sup> û jargon<sup>38</sup> -î taybetî xoyan heye. Gîşt ew şêwezarane beşêkin lewey ême pêy delêyn zimanî swêdî û le buwarî mêjûy zimanda rewî firajûtinyan, bedem têperînî katewe, dexirête berbas.

Car heye kemêk be şoxî degutirêt: cudawazîy nêwan ziman û zarawe birîtiye lewey zarawe zimanêke leşkirî nîye. Lêreşda amaje heye be rehendî deselat le çemikî zimanda. Zimanî swêdî nimûneyeke lew zimananey letek helbestinî dewletî nasyonaldâ, dirust kiran. Deselatdaranî gewretirîn şarî ewey deba bibête pêtextî Swêd, zor be hasanî yek le zarawekanî welatekeyan helbijard û kirdayane zimanî standerd û zimanî mîllî. Helbet çî seyr nîye leweda ke zarawey Mälardalen<sup>39</sup> -yan helbijard ke xoyan pêy dedûwan.

Le zor welatî dîkey ewrûpaş her heman bas bû. Le Franse zarawey Francien be zimanî mîllî helbijêrdira ke şêwezarî deverî Parîs bû. Şêwezarî wek Breton, Corsican û Occitan xefe kiran û carûbarîş yasabeder kiran, bo nimûne le fêrgeda. Le Spanya şêwezarî Castilian beriz kirayewe bo

<sup>35</sup> Zimanî amaje: sign language, signed language.

<sup>36</sup> Lazarî civakî: sociolect or social dialect, çemikêkî serbe “zimannasîy civakî” sociolinguistics ye, mebest lêy şêwezar yan “lazar” î taybet be grûpî civakîy taybet.

<sup>37</sup> Lazarî gelêr: *slang*, şêwezar yan “lazar” î rojaney mirovgel.

<sup>38</sup> Jargon: jargon, şêwezar yan “lazar” î taybet be destê û torî taybet, lazarî pişeyî, bo nimûne lazarî mamostayan, lazarî endazyaran...

<sup>39</sup> Mälardalen: herêmêkî Swêde û Stockholm-î paytext degirêtewe.

zimanî mîllî keçî şêwezarî Galician, Basque, Catalan, Valencian û herweha Balearic tenha statuyekî berteskî herêmîyan pê dira.

Tenanet le Swêdîş bo maweyekî dirêj bekarhênanî zimanî wek samî, finî û meänkieli (finîy Tornedal) le fêrgeda yasabeder bû. “*Zimanî amaje*” y swêdî-yiş, gerçî zimanêkî bêlayene bo kesanî kerr, bo maweyekî dirêj le fêrgeda çalakane dijayetî dekira. Her ewey hawkat xwêndin be zimanî dîke hebûwe, wek îngilîzî, alimanî, latîn û fransî, tenanet bo îngilîzîyeke naçarîş bûwe, pêşanî dedat ke helbijardinî ziman peyweste be hokarekanî deselatewe.

Kewate helbijardinî şêwezarêk bo zimanî mîllî û berizkirdinewey beser şêwezarî dîkeda peywend nîye bewey emyan firajîtir yan parawtîre, belkû be piley yekem xwastî siyasîy bûwe şêwezarêkî diyarî kirdûwe be zimanî mîllî. Her em xwaste siyasîyeşe debête hokar bo ewey çî be ziman nawzed bikirêt û çî be zarawe. Her leber emeyîşe diyarîkirdinî jimarey zimanekan cîhan hasan nîye. Eweta le her cêyek hokarî xoy heye bo nawzedkirdinî şêwezarêk be ziman yan be zarawe.

Cudawazîy nêwan swêdî û norwêjî, bo nimûne, hênde keme zorbey axêweranî emyan zimanekey dîkeş têdegen. Legel eweşda ême berbeyar be dû zimanî cudayan nawzed dekeyn. Serbarî eweş, le Norwêj *bokmål* û *nynorsk* be dû zimanî cuda dadenên gerçî zorbey gelî Swêd û Danmark cudawazîy nêwan *bokmål* û *nynorsk* nabîstin.

Welatî çîn wehay pê başe zimanî çînî be yek ziman bizanêt, keçî şêwezarî baladest: *putonghua* yan *cantonese* (kantonî) hênde cudawaze le dûhem şêwezarî *gewre*, *mandarin* (mandarîn) axêweranyan le yekdî nagen. Leber ewe mandarîn ke zimanî 55 mîlyon mirove, be zarawe dezanrêt. Ewca leber ewey sîstemî nûsînî hawko le çîn Leser gutin (derbirînî zarekî) helnenirawe, axêweranî kantonî û mandarîn detwanin têkstî yekdî bixwêndinewe.

Nimûne zorin pêşanî deden çon şêwezar wabestey deselat û pêgeye. Yek lewane komêdyay *Pygmalion*<sup>40</sup> e ke muzîkalî<sup>41</sup> “*My Fair Lady*” lê saz kirawe, lewêda profîsor Higgins biryarî xoy dedat Eliza bewe bikate keybanû fêrî şêwezarî erîstokrataney îngilîzîy bikat lebirî ew şêwezarey “*cockney*”<sup>42</sup> (keknî) ke pêy dedûwêt. Le nimûne swêdîyekey em şanogerîyeda, ke Margareta Garpe salî 2010 sazî kirdûwe, Eliza şêwezarî le keknî-yewe debête şêwezarî cewananî gerekî Rosengård<sup>43</sup> î şarî Malmö -y Swêd.

Mirovgel be şêwezarî corawcor depeyvî û ew şêwezaraneş berdewam le gorankarîdan. Le zor barda, lebirî zimanî cuday xawen sinûrî rûn le nêwanda, dekirêt bas le “*zincîrebendî zimaneke*” bikeyn. Le başûrî Sahara “*biyabanî mezin*” î Afirîka, zor nimûney weha heye. Zimangelî<sup>44</sup> bantû (Bantu languages) ke gewretirîn zimangelî Afirîkaye, birîtîye le 500-600 zimanî cuda. Le zor herêmda zimane cudawazekanî bantû zincîrebendin, zimane hawsêkan wêkiçûnyan zore letek yekdî belam cudawazîyan zore letek zimane dûrekan. Her bo berarud deşêt awir le zimangelî hîndoewrûpayî bideynewe ke zimanî swêdî têyda endame. Debînîn swêdî û norwêjî wêkiçûnî zimanekeyan zore belam farsî, bo nimûne, ke ewîş her endame lew xêzane zimanekeyeda, letek swêdîda cudawazîy zore.

<sup>40</sup> Pygmalion, dastanêkî nêw efsanekanî Yonanî dêrîne û lewêda nawî dû paşaye. George Bernard Shaw (1856-1950) şanonamey *My Fair Lady* lê dariştewe.

<sup>41</sup> Muzîkal: musical theatre, şanoy muzîkal.

<sup>42</sup> Cockney: (keknî) şêwezarî nawçey East End -î London.

<sup>43</sup> Gerekî Rosengård le şarî Malmö biyanî zore û cewanî ew gereke şêwezaryan taybete. Lêreda amajeye bewey ew şêwezare, wek “*Cockney*” îngilîzî, pêgey cudaye.

<sup>44</sup> Zimangel: grûpî ziman.

Le welatêkî wek Tanzania pitir le 120 ziman learadan. Beşêkiyan tewaw leyektir cudan û cudawazîyan zore letek zimananî dewrûberî xoyan, belam zorbey zimanekan serbe zimangêlî “bantû” -n û zor car axêweranî zimanêkiyan le zimanekanî dewrûber tèdegen, wek ewey ême [-y swêdî] le norwêjî û danmarkî tèdegeyn. Dûrkewtinewey nawçekanîş debine hoy dûrkewtinewey zimanyan. Le barî weha kesêkî sêyhem ke serbe nawçeyekî nêwanî ew dû herême dûreye dekwête nêwan û detwanêt be terceme û lêkdanewe yarîder bêt. Em diyardey tercemekirdine bo yekdî le zor şiwênî Afirîkada bawe. Tenanet le Swêdîş, gerçî cudawazîy zarawekan zor kembotewe û giştiman bo axaftin nêzîk bûynetewe le swêdîy standard, diyardey “zincîrebendî zarawe” her debînîn.

Doxî xorisk le hemû cîhanda eweye gelan be şêwezari corawcor bidûwên. Heye firezimane û heye “lazarî civakî” bekar dehênêt, wate le bestênî civakîy cudawazda be lazari cudawaz depeyvêt. Weha bawe mirovî fireziman, le bestênî cudada yan buwarî zimanekîy cudada, zimanî cuda bekar bihênêt. Bewe delêyn: mirov zimanî cuda le “kaye”<sup>45</sup>-î cudawazda bekar dehênêt, le “kayey xêzan”-da zimanêk bekar dehênêt, le kûçe û bazarda zimanêkî dîke û le “kayey ferimî”-da, wate le fêrge û buwarî kar û peywendî letek deselatda, zimanêkî sêhem.

Le Swêd û le zor welatanî dîkey ême pêy delêyn cîhanî rojawa, zimanî standard tewaw normbexşe. Wate zimanî swêdî zimanî xwêndine le fêrge û gişt fêrxwazanîş le rêy zimanî swêdîyewe fêr dekirên. Cige leweş çawerê dekirêt gişt fêrxwazan twanayekî berizyan hebêt le swêdîda, ewca le zor buwarî girîngîşda, bo nimûne xwêndinî beriztir û buwarî kar, swêdîzanîni baş dekirête merc.

Kêşey em doxe letek ziyadbûnî koçda aşkiratir bûwe, belam girîngîşe bizanîn ke Swêd hergîz welatêkî takziman nebûwe bew watayey swêdîy standard zimanî yekemî gişt danîştwanî bêt. Hemîşe fêrxwaz hebûn be zimanî dîkewe hatûnete fêrgey Swêd. Kewate fêrxwazî fireziman diyardeyekî niwê niye.

Le Swêd, cige le kemayetîye ferimîyekan: sam, romanî, fînî û axêweranî yîdiş<sup>46</sup> ke bezimanêk dedûwên tewaw cudaye le swêdî, heta raburdûyekî kurtîş zarawe hebûn tewaw cuda le zimanî standard. Le deverî Ångermanland î salanî riskanim le pencakan û şêstekanî sedey pêşûda, danîştwanî be zaraweyekî taybet dedûwan: zarawey *vibyggerå*. Fêrge bo zorbey mindalanî serbe gundekanî dewrûber debûwe berkewt letek swêdîy standard ke zorukem lay ewan namo bû.

Kerstin Johansson le kitêbî “*Som om jag inte fans*” - “*Her delêy bûnim nebû*” (2003) rûnî dekatewe salanî fêrge le kiçêkî deverî Tornedal î ew deme çon deguzera ke zimanî *meänkieli* yasabeder bû. Herweha Johannes Marainen, ke “sam” êkî bakûrîye, destpêkî fêrgey xoy bas dekat. Yekem rojî fêrge dêt û tûşî zimanî swêdî debêt ke lay em tewaw namoye, gerçî pêş hatinî lanîkem aşinay sê zimanî dîke bûwe. Le mal be zimanî samî dûwawin û deşilêt hêndey norwêjî zanîywe twanîwyetî le dûkan binêştî pê bikirêt. Bem core bas le dîdarêkî xoy dekat letek zimanî swêdî:

*Le rûy ziman û ferhengewe destpêkî fêrge bo min beserhatêkî şokbexş bû. “Zimanî dayikza” le salanî berayî fêrgeda waney here baw bû, belam min zor direngtir têgeyîştim ke “zimanî dayikza” wate zimanî dayik.*

*Çemikî “zimanî dayikza” lay min tewaw rûn nebû belam selmandim ke dekatewe zimanî swêdî - xo neydekirdewe eatnangiella (ke zimanî dayikzay xome). Minîş her ewendey hapolekanim lem “zimanî dayikza” ye degeyîştim, wate hiç. Salanêkî zorî bird heta twanîm em zimane bo axaftin bekar bihênim. Behîç corêk bom nebû le fêrge zimanî xom bekar bihênim, tenanet le wiçanîşda. Tumez mebest “guncandin” man bû le çewey “zimanî dayikza” da be zûtîrîn kat. Paşan têgeyîştim ke biryarêk heye le peyrewî “fêrgey koçeran” da delêt mindalî samekan deba siza bidirên ger zimanî xoyan*

<sup>45</sup> Kaye: domain, (dumeyn), warge, buwar, bestên.

<sup>46</sup> Yîdiş: Yiddish, zimanêkî cêrmanîye nêzîke çîwar mîlyon cûyî cîhan bekarî dehênin.

*le katî fêrgeda bekarbihênin û em biryare katî wiçaniş degirête. Em biryare heta 1956 kara bû.*

(Marainen 2007)

Emro swêdîy standard tewaw zale betaybetî le rêy firewanbûnî tawî masmedyawe. Hawkat grûpî dîkeş xerîkî koşanin bo rahêzanî şêwezarî xoyan. Le zimanî kemayetîyekan, pênc ziman: meänkieli, samî, yîdiş, romanî û finî be ferimî pêgey zimanî kemayetîyan pê bexşirawe, ke dekatewe çend mafêkî zimanekî, bo nimûne mafî xwêndinî zimanî dayikza tenanet ger jimarey fêrxwaz kemtirîş bêt le pênc kes. Herweha zimanî amajey swêdîş le hendêk buwarda pêgey zimanî kemayetî pê dirawe. Danîştwanî deverî Älvdal pêkhatûn leser parastinî şêwezarî xoyan, beşêkî xwêndinyan be şêwezarî xoyane, kitêbî pê çap deken û le rêwresimî ferhengîda bekarî dehênin.

Hawkat şêwezarî niwê dête meydanewe, bo nimûne lew gerekaney biyanyan zore le şarekanî Stockholm, Malmö û Göteborg. Weha bawe bem şêwezarane bigutirêt: zimanî fireferhengî cewanan. Natalia Ganuza (2008) le tojîneweyekî nêw cewananî çend gerekêkî şare gewrekanda pêşan dawew cewanan çon le nêwan swêdîy standard û şêwezarî nawçey xoyanda, zimangorkê deken. Lêreda nimûne dehênêtewe û pêşan dedat em cewanane çon ristebendî çewt bekar dehênin le şêwezarî xoyanda belam ristebendî dirust bekardehênin ger letek kesanî derewey grûpî xoyan bidûwên. Bemeş rûnî dekatewe ke ew çewt bekarhênane berhemî nezanîn nîye, belkû pêşandanî destebendî û grûpbendîye. Zarawe û lazarî civakîş rêk weha bekar dehênrên. Zor kesî le mal bar deken bo xoyan têbînî deken çon letek nişîmenî tazeda xo deguncênin belam ke dênewe ser axaftin legel xêzan û xizmî nawçekey xoyan, degerênewe ser zarawî nişîmenî konî xoyan.


Le civakî dêmokratda debêt zarok mafî xwêndinêkî hebêt ew zanist û ezimûne corawcoraney ew zaroye zûtir heybûwe û le paşxanî corawcorî xoy peyday kirdûn, bikate binaxe. Wate mamosta, le civakêkî fireferheng û firezimanî wek emey le Swêd heye, û zûtirîş hebûwe, pêwîstî be zaniste derbarey em fireferhengîye. Mamosta pêwîstî be dariştinî helwêst û destawêje bo pêşwazî lem doxe. Hawkat civakî xawen armançî dêmokrat debêt derfetî wêkiçû bo fêrxwazan birexsênêt bo peredan bew twana zimanekîyey le salanî dahatûy xwêndinda pêwîstyan pêy debêt.

Gişt fêrxwazan pêwîstyan be rageyiştine bew zimane standarde berznirxêndirawe, belam kar bewew tewaw nabêt ke fêrge fêrxwaz amade bikat bo xwêndinî bala. Ewaneyiş ke berdewam nabin leser xwêndinî zanko, pêwîstyan be peredane bew zimaney pêwîstiyane.

## **Zimanzanî**

Deysa zanîni zimanêk watay çîye û zimanzanî dekatewe çî? Zimanzanî be çendîn şêwe rave dekirêt. Yekem pênasey mirov bîrî lê dekatewe zanîni wişey zor û rêzimanî zore. Lêreşda dûr nîye mirov rojgarî xwêndinî xoy le zimanî îngilîzî yan her zimanêkî dîkey biyanî kirdibête serşar. Axir weha baw bû mirov bo fêrbûnî ziman xerîkî wişezanî û rêsa û saxtarî rêziman bêt. Ewîş diruste ke wişezanî û rêziman layenî girîngin le zimanzanîda. Bo zalbûn beser zimanêkda, debêt mirov zor wişe bew zimane bizanêt, deşbêt bizanêt çon wişekan le derbirîni rageynda daderêjêt. Belam emane bes nîn. Xalî dîke zorin debine beşêk le zimanzanî.

Bachman & Palmer (1996) zimanzanî dekene dû beş: “*danûstanzanî*”<sup>47</sup> û “*stratêjzanî*”<sup>48</sup>. Danûstanzanî eweye le danûstanda karî pê dekirêt. Em wêneye serçawe le danûstanzanîy ewanewe degirêt:



Danûstanzanî birîtîye le “*twanay sazimanekî*” û “*twanay kirdekî*”. Twanay sazimanekî deşêt be “*twanay serbe zimanewanî*” nawzed bikeyn. Emîşyan debête dû beş, “*twanay têkstzanî*” û “*twanay rêzimanzanî*”. Twanay rêzimanzanî birîtîye le wişezanî, ristesazî<sup>49</sup> syntax, wişesazî<sup>50</sup> û dengnasî<sup>51</sup> (derbirînî wişe). “*Twanay têkstzanî*” serleberî têkst degirêtewe, hem zarekî û hem nûsiraw, wate rêsakani rêkxistinî ziman le yekey dirêjda bo rageyandinî peyamî rûn be layenî wergir. Bas leweye axêwer çon çîrokî xoy debêjêt, ferman dedat yan gutarêk denûsêt. Herweha bas le “*rêzimanî têkst*” e, wate çon le ristekeda peywendîy kat, peywendîy nêwan şakes<sup>52</sup> û lakes<sup>53</sup> pêşan dedeyt, çon têksteke têk debestît û çon têksteke sêregîr dekeyt bo ewe xalî girîngî têksteke rûn bêt.

“*Twanay kirdekî*” dekatewe çonetî girêdanî derbirîn û nûsîn letek amancî danûstanekey axêwer (twanay karkirdane) û herweha letek bestênêkeda (twanay civakî - zimanewanî). “*Twanay karkirdane*” peywendîy nêzikî heye letek bestênda. Girîmaneyekî ferimîy wek: “êre zor germe”, lewaneye le barêkî taybetda bikatewe: “min pêm waye êre radebeder germe. Detwanît pencereyek bikeyewe?”. Watay rastîney ke destewajeke werî degirêt peyweste be bestên û be kesani beşdarî baseke. “*Twanay civakî - zimanewanî*” dekirêt be pendî “cûtyar be zimanî cûtyaran bidûwêne, basewadan be latînî!” lêkî bideynewe. Mebest twanaye bo berhembênan yan lêkdanewey ziman be

<sup>47</sup> Danûstanzanî: communicative competence.

<sup>48</sup> Stratêjnasî: strategic competence.

<sup>49</sup> Ristesazî: syntax (sîntaks), dariştinî riste.

<sup>50</sup> Wişesazî: morphology (morfolojî) beşêkî zimanewanîye xerîkî wişe, saxtar, şêwe û gerdanî wişeye.

<sup>51</sup> Dengnasî: phonology (fonolojî).

<sup>52</sup> Şakes: kes yan kesayetîy yekem, biriwane “*lakes*”.

<sup>53</sup> Lakes: kes yan kesayetîy lawekî, biriwane “*şakes*”.

corêkî guncaw letek wergir û bestênda. Mirov be yarmetîy “twanay civakî - zimanewanî” detwanêt wabestebûnî xoy be grûpêkewe, yan mewdagîrîy xoy lêyan, pêşan bidat.

Ke dête ser “*stratêjzanî*”, Bachman & Palmer (1996) bas le stratêjî serbe “*mêtazanandin*”<sup>54</sup> (mêtakognetîv), biryardanî armançî gutar, helsengandin (xo-pêdaçûnewe û rastkirdinewe) û herweha planrêjî, deken. Rod Ellis (1985) ew çemikî “*stratêjzanî*” ye firewantir dekat û sê beşî têda diyarî dekat: “*stratêjî fêrbûn*”, “*stratêjî berhemhênan*” û “*stratêjî danûstan*”.

“*Stratêjî fêrbûn*” ew hunerane ye mirov deyangirête ber bo fêrbûnî zimanêk. Be nimûne, mirov bo fêrbûnî wişe dêt wişekan destebend dekat, bo ewey wişey hawdeste wêkira fêr bêt. Wek endamanî leş, poşak, mîwe, kar, destewajey ser be keş, rêgedozî... htd. Stratêjî dîkey fêrbûn lewaneye firepatkirdinewey wişe bêt, gutinyan bêt be dengî beriz, firepat nûsîneweyan... Stratêjî fêrbûn lewaneye dozînewey derfet bêt bo bekarhênanî zimanêke, geran bêt be dûway bernamey radyo û televîzyon bew zimane.

“*Stratêjî berhemhênan*” ew hunerane ye mirov deyangirête ber bo berhemhênanî ziman, ewey deçerxêt le nêwan bîr û derbirînda. Beşêkî zorî em stratêjane agabederin. Belam rahênan û xorewtandin<sup>55</sup> debête mayey berhemhênanî derbirînî dirustitir. Lêreda bas le *çerxandin*<sup>56</sup> ziman dekirêt, bo nimûne: helbijardinî wişe, dariştinî derbirîn, helbijardinî rêsay guncawî rêziman û gutinî ew derbirîne.

Corî sêhemyan “*stratêjî danûstan*” e. Emyan birîtîye lew hunerane ye mirov penayan bo debat katêk deyewêt basêk derbirêt belam twanay zimanekîy xoy bo ew derbirîne tewaw bir nakat. Hem mindal û hem kesanî dîke xerîkî fêrbûnî zimanin, ger twanay zimanekîy xoyan bir nekat, stratêjî lem babete bekar dehênin. Lewaneye mirov wişeyek nedozêtewe û naçar mebestî xoy be corêkî dîke derdebirêt, wişey nêzîk bekar dehênêt, ravey dekat, zimanêkî dîke bekar dehênêt yan pena debate ber zimanî ceste. Lewaneyişe bo gorînî şêwazî derbirînêk bêt, lebirî “*dûwênî çûm*” bilêt: “*dûwênî min çûn*”.

“*Stratêjzanî*” betaybetî bo kesêkî xerîke fêrî ziman bêt, çî mindal bêt û çî kesanî dîkey fêrxwaz. Ewey jimareyekî zor stratêjî danûstan bekar bihênêt derfetî bo danûstan zortir debêt, ziman hem werdegirêt û hem dehênête berhem. Emeş bo fêrbûn sûdbexşe. Debête yarîder bo fêrbûnî wişe û saxtarî weha ke mirov carê aşinayan nîye. Belam girîngîşe bizanîn ke zor car zimanêke tewaw dirust dernaçêt. Mirov lêreda, bo pêkanî amancî danûstaneke, çaw le kemasîy zimanêke depoşêt.

Zimanzanî be şewey corawcor dête ravekirdin. Hansegård (1986) bem corey bas dekat:

- corayetîy şêwaz, nexşî ristekarane, wişe, destewaje... htd ke mirov têyan degat yan detwanêt bekaryan bihênêt
- zimandirustî
- radey xorewtî, xoşrewtî
- twanay afirandin û dahênan le zimanekeda
- zalbûn beser karkirdekanî bîr, wîst û hest le zimanekeda
- zengînî be lêkdanewey kesekî
- sewad

<sup>54</sup> Mêtazanandin: metacognition. Mêtaderik, derik derbarey derik, wate prosey hizirîy beriz derbare prosey zanandinî mirov xoy, çon bîr dekatewe çon fêr debêt...

<sup>55</sup> Xorewtandin: automatization.

<sup>56</sup> Çerxandin: processing. Xistine nêw prosewe, çerxandin le pêvajoda.



Sê xalî yekem begîştî beşêkin le xaney “twanay sazimanekî” û lewey bawe pêy bigutirêt “zimanzanî”. Belam lewaneye weha baw nebêt babetekanî çiwar xalekey kota be beşêkî zimanzanî dabînên keçî mercî gewre dadênên bo zalbûn beser zimanda. “*Twanay afirandin û dahênan le zimanekeda*” corêke le zimanzanî, hênde bîrî lê nakirêtewe. Mirovêk em twanayey hebêt ziman be şêweyekî dahênerane bekar dehênêt, wek dariştinî pexîşan û helbest. Tenanet le axaftinda, le şêwezarî gelêr û lazarî pîşeyî (jargon)îşda dahênan le zimanda bawe. Le nêw muzîkî cewananda, betaybetî le hunerî “rap” û “hîp hop” da rêk em dahênanî zimanekîye girînge.

Xalî “zalbûn beser karkirdekanî bîr, wîst û hest le zimanekeda” birîtîye le bekarhênan ziman wek destawêjêkî hizirî, bo derbirînî wîst û hest. Car heye mirov le zor buwarî hemecorda zale beser zimanekeda, belam hest dekar zimanekî bir nakat bo derbirînî hestî tund, bo nimûne evîn, rik û tûreyî. Piyadekirdinî peyrewkarîy<sup>57</sup> aloz û helkişîwî hizirî be yarmetîy ziman, mercî beriz Leser zimanzanî dadênêt.

“*Lêkdanewey kesekî*” wate mirov wêneyekî taybet le naxî xoyda peyda bikat le wişe yan destewajeyekî diyarîkiraw. Bo nimûne, watakêşekê<sup>58</sup> le ezimûnî zûtir û rûdawî mirov têda bûbêt, yan hestêkî dête wirûjan. Emîş hunerêke katî dewêt heta mirov le zimanî niwêda fêrî debêt. Bo nimûne berawirdêk bike le nêwan bertekî xot le wişeyekî xawen watay behêz, wek wişeyekî peywest be temenî mindalîy xot yan endamanî xêzanî xot, letek wişeyekî hawwata belam be zimanêkî dîkey kemtir deyzanî.

Katêkî dirêjxayen dewêt heta mirov fêrî zimanêk debêt le giyanîda reng bidatewe. Her bo nimûne bebîrim dêt katêk le welatî Jengewar (Jengebar, Zengbar, Zanzibar) mamostay riştey mamostayetî bûm, ger fêrxwaz erikî malewey cêbecê nekirdaye yan dreng hatiba, penam debirde ber zimanêkî tundtir û girijtir lewey le Swêd bekarim dehêna. Keçî paşan ew hestî xecaletiyem nedekêşa ke hemîşe deykêşim ger be zimanî swêdî fêrxwaz serzenîşt bikem. Lewê be zimanî sewahîlî (Swahili) dersim degutewe, ke zor başim dezanî belam diyare ew rengdaneweyey le hestekanimda nebûwe.

Nimûneyekî dîkey kemêk diwar dehênimewe: le waneyekî xomda le Swêd dawam le mamostayanî bîser kird nimûne bihêninewe le dahênanî derbirîn lay Astrid Lindgren,<sup>59</sup> yekyan gutî: “*du fattas mig*” (“to lêm kemît”). Em guteye wehay hejandim naçar bûm bo çend xulekêk daway molet bikem ewca bêmewe ser xom. Em destewaje ciwaney Mattis le dastanî “*Ronja Rövardotter*” (“Rony-ay Çetêzade”) -da be Skalle-Per î delêt ke demirêt, her ewe bû minîş be bawkim gut ke xiraye tabûtewe. Min çawerê nebûm kesêk em destewajeyê bilêt û zûtir hergîz weha be rûnî hestim bewe nekirdibû “*lêkdanewey kesekî*” ke mirov le destewajeyekî dirust dekar, çî hêzêkî karîgerî heye.

Dûwa xal le lîstekey Hansegård-da “*sewad*” e. Ême le fêrgey swêdîda pêman waye karêkî belgenewîste fêrxwaz swêdî bixwênêtewe û binûsêt, belam aya çend bîr lewe dekeynewe ke fêrxwazî fireziman pêwîstî heye bewey be zimanî xoyîşî bixwênêtewe û binûsêt? Kesî riskaw çawerêy lê dekirêt sewadî hebêt, eme tenha Swêd nagirêtewe. Kewate ew fêrxwazaney ke yekem yan dûhem weçey koçhênin, pêwîstyan heye bewey be zimanî xoyan bixwêndinewe û binûsin. Dena metirsî heye ke le nîştîmanî zûtirî xoyan rêzyan lê negîrêt. Emane tûşî rêbest dên ger bo nimûne biyanewêt agayan le dengûbasî welatekey xoyan bêt, rojname û dengûbasî îternêtyan pê naxwênêtewe, wajey nûsiraw be zimanî xoyan pê naxwênêtewe.

Kiçêkî le tojîneweyekda çûme dîdarî, paşxanî finîye û le Swêd gewre bûwe, rûnî kirdewe ke rêk em kemasîyey sewadî finî kêşey here gewrey bû. Em kiçe le ast hawtemenekanî xoy le Fînland hestî be

<sup>57</sup> Peyrewkarî: procedure. Rutîn û xiştey taybet bo cêbecêkirdinî karubarî diyarîkiraw.

<sup>58</sup> Watakêşekê: association, biriwane Celîzade, “*Zarawesazîy pêwane*”.

<sup>59</sup> Astrid Lindgren (1907-2002) nûserêkî swêdîye, be taybetî le wajey zarokanda nawdare. “*Pîppî gorewîdirêj*” yek le şakarekanîyetî.

şermezarî dekird lewey xwêndinewey weha xawe û nûsînî hênd pir heleye. Dayikûbabî fêrxwazî fireziman zorin ke nûsirawî zimanî dîke bekar dehênin û zor carîş be sîstemî nûsînî cuda. Marilyn Martin-Jones û Kathryn E Jones (2000) le tojîneweyekî welatî Birîtanyada pêşanyan dawê mindal çon dekewête nakokîy nêwan mercekanî sîstemî nûsînî fêrge û hî xêzan. Beşêk lew xêzanane be “*zimanlawaz*” dadeniran gerçî endamî riskawyan têda bûwe xawen zimanêkî nûsînî zor çalak û helkişîw. Emane helbest û têkstî gorañyan be zimanî corawcor daderişt û herweha sîstemî nûsînî hemecorîşyan bekar dehêna. Aya ta çend zaroxane û fêrgey Swêd girîngî dedat be zimanî dîke û sîstemî dîkey nûsîn lay dayikûbawan?

Monica Axelsson (2005) tojînewey heye derbarey mindal le zaroxaney swêdîda ke xêzanekanyan firezimanin û pêşanî dedat gerçî dayikûbab çalakane zimanî nûsîn be çend zimanêk bekar dehnên û pêşyan xoşe mindalekanyan fêrî sewad bin be zimanî xoyan belam le zaroxaneda handan تنها bo zimanî swêdî bûwe. Zaroxane le bekarhênanî nûsînda peyrewî nexşî nerêtîy Swêdî kirdûwe, meger mindalêk xoy bikewête ser basî nûsînî zimanî dîke û bo nimûne bas lewe bikat ke xwêndinewey nûsînî erebî le rastewe bo çepe, ewca basî weha dexiraye berbas. Eme basêkî berokgîre bo zaroxane û fêrge ke sûdmend bin be ezimûnî fêrxwazanyan le sîstemî dîkey nûsîn.

## Pajî sêhem: Firajûtinî ziman lay zarok – Zarokî axêwer

*“ger mebestitane yarmetîy kesêk biden pere be zimanî xoy bidat, debêt ew kospane labden ke dête rêy bekarhênanî zimanî ew kese le barudoxî wehada ke pêwîstî be bekarhênanî ziman heye. Debêt yarmetîy ew kese biden pey berêt bewey wîstî heye, xwastî heye, twanay heye, dewêrêt, detwanêt, boy heye...”*

Teleman 1991

Mirov bûnewerêkî civakîye û ziman le guzeranî civakîy mirovda şanorey heye. Mindalî biçûk twanayekî zigmakî heye bo fêrbûnî zimanî mirovkar le rêy karlêkî civakîyewe letek kesanî dîke. Çend doxêkî kemjimarî nasiraw heye ke têyanda zarok le jîngeyekî dabirawda gewre bûn bê ewey derfetî hawjînîy civakîyan hebûbêt letek kesanî dîke û fêrî zimanêk nebûn lew corey ême pêy delêyn ziman. Dûwayîş ke derfetyan bo rexa letek mirovî dîke têkel bibin neyantwanî le zimanêkî sakar pitir têhelkişên. Ewca leber ewey bas le tenha çend doxêkî kemjimore, natwanîn be dilnyayî tewawewe hokarî diyarî bikeyn belam weha pêdeçêt ew civakandin<sup>60</sup> û karlêkey berayî temen karîgerî hebêt leser firajûtinî ziman lay mindal.

Le nêw kesanî le mindalîda kerr bûn zor heye delên paş ewey fêrî “zimanî amaje” bûn ewca twanîyan pere be zimanî xoyan biden, bo zorîş lewan ew base dûwakewt heta geyîştine salanî xwêndin, carîş heye geyîştote temenî herzekarî. Hokarîş bo ewey em mirovane twanîwyane pere be zimanî amaje biden, pêdeçêt bigerêtewe bo ew peywendîye civakîye xoşrewte û ew danûstane mirovkarey heyabûwe le berayî temenewe.

Fêrbûnî ziman diyardeyeke le bestênî civakîda cêgîre, wate firajûtinî ziman le lay zarok cuda nakirêtewe lew bestêne civakîye têyda deçerxêt. Zarok be civakandin fêrî ziman dekirên û civakandinîşan be ziman dekirêt. Hevbendîy heye le nêwan herdû prosey firajûtinî ziman û fêrbûn le rêy zimanewe. Cige lewe dekatewe ewey “civakandinî ziman” le ferhengî cudawazda be şewazî cudawaz çilûrebest debêt.

### Civakandinî zimanekîy zarok

Lay zorbey xêzanî Swêd û beşêkî gewrey cîhanî rojawa weha bawe zaroy korpele bidûwênin zor zûtir lewey mindaleke xoy fêrî derbirînî wişe bibêt. Mirovî gewresal mindaleke rûberûy xoy degirêt û “giftûgo” -y letek dekat. Xnexn û rûxsar gorînî mindaleke wek bersiv werdegîrêt. Ragnhild Söderbergh (1988) em nimûneye le Catherine Snow (1977) degêrêtewe wek nimûneyekî karlêkî dayik û kîjolekey ke sê mangî temene:

---

<sup>60</sup> Civakandin: socialization, ew proseyey mirov pêyda têdeperêt bo ewey le bûnewerêkî bayolojîyewe (le jînewerêkewe) bibête bûnewerêkî civakî.

Zarok (bizey dêt)

Dayik: dey, ewe pêdekenît emro! Ay çend ciwan pêdekenît...! Hey hey!

Zarok (kirpî dêt)

Dayik: aferîn lem kîjole zîreke! Eme kirpêkî dirust bû! Dey bo kirpêkî dîkeş?

Zarok (girugal dekat)

Dayik: dey, awhaye? Erê minîş pê m waye.

Zor carîş bo dûwandinî mindal şêwe zimanêkî taybet bekar dehênîn û pena debeyne ber wişey wek: ayay, wewe, pişe, cûce... Leber ewey ême rahatûyn bem core axaftine legel mindal wehay bo deçîn ke eme karêkî xoriske û dayikûbabî baş debêt mindalî xoyan bidûwênin. Belam em reftarey ême ke korpe be hawdem dadenêt ber lewey xoyan fêrî derbirîn bibin, diyardeyekî cîhanîye.

Tojînewey cudawaz heye derbarey şewazî bekarhênanî ziman bo civakandinî zarok le ferhengî cudawazda û tojînewekan encamî firecor pêşan deden. Le tojînewey weha cexitî taybet dexirête ser ewey pêy degutirêt "*Caretaker talk, Motherese*" ("*zimanî dayikane*"), wate çendûçonî karlêkî zimanekî ew kesaney serperîştîy zarokî biçûk deken. Tojeran Bambi Schieffelin & Elinor Ochs (1986) bas lem kirdewe zarekîyane deken ke bawe mirovî riskaw deykate bo yarretîy zarok ke têbigen le rûdawî dewrûber û fêrbin be şeweyekî guncaw reftar biken:

- Rakêşanî serincî zarok bo ewey xerîke rû dedat, bo nimûne: "êsta em kitêbe dexwênînewe", "êsta celû<sup>61</sup> dêt".
- Pirsiyarî rêniwên mindaleke han dedat bo gutey dirust, wek, katêk mindaleke şitêk werdegirêt lêy depirsît: "ewca mirov delêt çî?".
- Hasankirdinî nêwerok û saxtarî zimaneke katî wiryakirdinewe le rûdawêk yan handan bo basêk, bo nimûne: "na, dest na!" (destî bo mebe!), "temaşa, babe hatewe!".
- Firepatkirdinewe rahênanêkî zarekî katêk mindaleke temaşaçîye.
- Firewandinî derbirînî zarok berew astêkî dirustitir, bo nimûne zarok delêt: "seg xwardin", pêy delêynewe: "erê, segeke xwardin dexwat".

Schieffelin & Ochs cexit deken leser ewey hemû civakêk gişt ew kirdewane piyade naken. Xalî dûhemyan, pirsiyarî rêniwên ke bo zarokî rûn dekatewe çî bilêt, xalêke le zor şiwên bawe, belam xalekanî dîke be pêy ferheng degorên. Bo nimûne le welatî Samwa (Samoa)<sup>62</sup> y Schieffelin & Ochs tojîneweyan lê kirdûwe, ew xalane baw nîn. Lewê zarok le nêw xêzanî gewreda gewre debêt û hemîşe dewrey be kesanî dîke dirawe. Zarokî biçûk be layenêkî hawdem nazarêt û zimanî sakarîşî letek bekar nahênrêt. Ger zarok bikewête derbirînî xwast û pêwîstîy xoy bo kesêkî riskaw, em kese rû le kesêkî dîkey cewantir dekat û fermanî dedatê bedem mindalekewe biçêt. Emyan debête welamderewe mindaleke. Bem core mindal le temenêkî zûda fêr debêt derik be nexşî alozî civakî bikat ke nexşî alozî danûstanîş degirêtewe.

Bambi Schieffelin rûnî dekatewe çon kesanî riskaw le nêw gelî "kalulî" -y welatî "Papwa Gînyay Niwê" (Papua New Guinea) zarok, cewan û gewresal le xêzanda têkdebestin. Em zarokane heta çend salêk nebirin çawerêy gutinyan lê nakirêt. Yekemîn wişey le zarok werdegirêt "daye" û "meme" ye. Herçî pêş ewe dête derbirîn naçête xaney gutinewe. Ber lewe, kesî riskaw lebirî mindaleke qse dekat. Kesî riskaw mindaleke rûberûy kesêkî dîke degirêt, bo nimûne dayegewrey mindaleke, ewca bew şewaze silaw le dayegewrey dekat ke le mindaleke çawerwan dekirêt. Ew deng û hewildaney mindal bo gutinî ber le axaftin, wate ber lewey mindaleke ewe bilêt ke be wişe dête jimardin, wêl dekirên. Zarok lêreş

<sup>61</sup> Celû: train, tirên, şemendefer, qîtar, biriwane Celîzade, "*Zarawesazîy pêwane*".

<sup>62</sup> Samwa: Samoa, Independent State Of Samoa (Western Samoa).

le nêw grûpî gewrey mirovda gewre debêt û axaftinêkî zory le dewre belam axaftin arastey mindaleke nakirêt.

Em şêwazane, lay kesanêkî rahatûn be şêwazekanî xoman bo civakandinî zarok, zor seyr dêne pêşçaw, belam zarokî kalulî û samwa, her wek zarokî nêw xêzanî cîhanî rojawa, fêrî ziman debin. Cudawazîyeke lewedaye mindalî kalulî û samwa le temenêkî zûda fêrî hunerî civakî debin, bo nimûne çon bidûwên letek kesani xawen temen yan piley cuda. Schieffelin & Ochs (1986) le berawirddi pêşani deden ke xêzanî serbe çîni maminawend le cîhanî rojawada dewrûber deguncênin letek zarokda, eweta be zimanêkî sakar deydûwênin û her zû wek layenêkî hawdem refatî letek deken, belam le kalulî û samwa zarok deguncênin letek dewrûber. Her rêk ewey le kalulî û samwa fêrî ziman debêt bê ewey rastewxo axaftinî araste bikirêt pêşani dedat ke em reftarey ême pêwîstîyek nîye bo firajûtinî ziman lay zarok. Bemeş tojeran degene encamgîrîyekî delêt hokarî yekemî geşey ziman lay zarok lasayîkirdinewe nîye, belkû şêwey fêrkirdinyane.

Salanî hefta û heştakanî sedey bîstem tojeranî dîkeş xerîkî wirdbûnewe bûn le çonetîy civakandinî zimanekîy zarok le jîngey xoyda. Kathryn Au & Claire Asam (1981) bo nimûne xerîkî tojînewe bûn le nexşî dastanî serzar le Hawayî (Hawaii). Tojer Karen Ann Watson-Gegeo (1992) xerîkî tojînewe bû le nexşî karlêk le Durgekanî Suleyman (Solomon Islands). Tojer Susan Philips salî 1993 xerîkî nexşî karlêkî nêw xêzanî *Warm Springs Indian Community*.

Lem buwareda tojîneweyekî *Shirley Brice Heath* le Piedmont Carolina, USA berhemêkî rêçkeşkêne (Heath 1983). Emyan tojînewey le nêw xêzanî sê çîni civakîda encam da, çîni maminawendî spîpêst, çîni maminawendîy respêst, û çîni kirêkarani respêst. Tojînewe pêşani da ke civakandinî zarok le buwarî ziman û sewadda le nêw xêzanî serbe çîni maminawendî spîpêst nexşêkî heye rêk dêt letek ew nexşî karlêkey le fêrgeda peyrewî dekirêt, belam zarokî xêzane respêstekanî çîni kirêkar nexşî wehayan peyrew dekir le fêrge cêy serinc nebûn.

Heath maweyekî dirêjmewda xerîkî çawdêrîy komelêk xêzanî ew sê desteye bû. Tojer boy derkewt civakandinî zarok le nêw xêzanî respêstanî serbe çîni kirêkar, şêwazî helkişîwî zarekî dekate amanc. Em zarokane le temenêkî zûda stratêjî beriz bo axaftin fêr debûn. Civakandinî zarok le xêzanî respêstî maminawendda rûy le behagelî mesîhayetî bû. Rahênanêkî girîngî xwêndinewe birîtî bû le xwêndinewey geldestî Tewcîl,<sup>63</sup> belam bêjandinî xoyekî û xeyalbazane mayey bayexpêdan nebûn. Katî xwêndinewe girîngî dedira be rêzgirtinî têkst û lêkdanewey zor wirdî têksteke.

Belam çîni maminawendî spîpêst bo civakandinî zarokî xoyan peyrewî nexşêkiyan dekir zorî hawbeş bû letek nexşî fêrge. Kesani riskaw xoş xoş çîrokiyan bo mindalan dexwêndinewe û be şêweyekî rêk bêt letek şêwey fêrgeda. Zor car mindal be pirsiyarî wek: “ewe çîye?” û “eme nawî çîye?” ... ke le fêrgeda bawe, han dediran şitan nawzed biken. Tenanet pirsiyarî kontrolkar, wek ewey le fêrgey cîhanî rojawada bawe bo dilnyabûn le astî zanistîy zarok, le xêzanda zû zû arastey zarok dekirêt, bo nimûne: “çend pişîle lem wêneyeda debînt?”.

Her ewey civakandinî zarok le ferhengî cudawazda şêwey cudawazî heye, debête hokar bo ewey le civakî fireferhengda zarok be ezimûn û zanistî corawcorewe bêne zaroxane û fêrge. Ewca bo ewey karmendanî zaroxane û fêrge bitwanin be şêwazêkî yeksan pêşwazîy le gişt fêrxwazan biken, ewa debêt beranber boçûn û reftarî wêk neçû, sînefirewan bin. Zor car le nêw ferîkemamosta û mamostada debîstim bas le “xêzanî baş” û “xêzanî kemptir baş” dekirêt. Mebestîşyan le “xêzanî baş” ewanen ke zarok têyanda bem şêweyey mamostayan reftar letek ziman deken, wate xêzanî weha ke zarok têyda han dedirêt bo giftûgo letek kesani riskaw. Emyan dîdêkî reçekekperist<sup>64</sup> (êtnosenrîst) e, wata mirov ferhengî xoy, şêwazî bûn û guzeranî xoy, be siruştî bizanêt û ferhengî kesani dîke be

<sup>63</sup> Tewcîl: Bible, kokurteye bo Tewrat (peymanî kon) û Încîl (peymanî niwê).

<sup>64</sup> Reçekekperist: ethnocentrism, êtnosenrîst, dîdêk gîrodey reçekek bêt.

kemtir siruştî. Lêreda bas le başe û xirapey şewazî civakandin nîye, bas leweye zarok ger le ferhengêda be şewazêk bête civakandin û paşan çawenorî dîkey lê bikirêt û be nexşî civakî dîke bête helsegandin bê ewey derfetî hebêt bo aşinabûn bem çawenorî û pêwerane, tûşî kêşe dêt.

Heath (1983) ew twana cudawazane pêşan dedat ke zarok lew sê cfate cudawazeda fêrî debûn. Pêşanîşî dedat ke ew mindalaney civakandinyan wêkçûy normî fêrge bû, ewaney serbe çînî spîpêstî maminawend bûn, le fêrgeda lêy sûdmend bûn belam mindalî serbe jîngekanî dîke ke civakandinyan corêkî dîkeye û serincgîrî twanagelî dîkeye, ziyanmend bûn. Heath eweş pêşan dedat ke mamosta ger destawêjî hebêt bo têgeyîştinî şewazekanî karlêk û bekarhênanî ziman û sîstemî nûsîn lay xêzan, detwanêt wanebêjîyekey xoy baştir biguncênêt. Le pajekanî şeşem, heftem û heştenda, letek basî geşey sîstemî nûsîn, em xale beser dekeynewe.

Gişt mindalêk mafî heye pere bew şewazî bekarhênanî zimane bidat ke le jîngey xoyda zale. Le Swêd dekatewe ewey gişt zarok pêwîstyan heye be fêrbûnî twanay helkişaw le zimanî swêdîy standardida. Emeş dekatewe stratêjî firajî bo sewad, herweha twanay helkişîw le axaftinda. Hawkat girînge karî zaroxane û fêrge, zanist û ezimûnî zûtirî mindaleke bikate binaxe û herweha gişt zarokan bew paşxane cudawazaney heyane, rêzyan lê bigîrêt.

Leber ewe girînge karmendan biryarî pêşdestyan nebêt derbarey mercî “xêzanî baş” û reftarî dayikûbabî baş. Ger mamosta pêşdawerî hebêt derbarey xêzanî diyarîkiraw, yan core paşxanêkî zimaneke be kem bigirêt, metirsîy zore bigat bewey mindaleke wek kesîş behaşkên bikirêt. Derbirîni wek: “ew zaroke hîç zimanî nîye” rêk pêşanî dedat ke mamosta bayex dananêt bo ew zanistey fêrxwazî serbe xêzanî taybet letek xoy deyhênêt. Ger mamosta lebirî ewe bilêt: “ew fêrxwaze erebî dezanêt” ewa zanistî fêrxwazeke be şeweyekî tewaw cudawaz repêş dexirêt.

Bo rûnkirdinewey sengî girîngîdan be zanistî zûtirî fêrxwaz, çîrokêkî biçûk degêrmewe le fêrgeyekî xom karim lê kirdûwe. Tonia (Tonya) le nêwerastî terimîni xwêndinda rastewxo le Yonanistan-ewe hatibû bo polî sêhem. Xoy hîç swêdî nedezanî belam amozayekî le polekeda hebû, hem swêdî û hem yonanî dezanî û debûwe yarîder. Tonia ke hêştta swêdî nedezanî û aşinay pîtekanî ême nebûbû, katêk ke fêrxwazî dîke xerîkî erikî takekesîy xoyan debûn, min naçar debûm babetêk bidozimewe em le polda xerîkî bêt. Fêrxwazî dîke deba çîrokî xoyan le nêw “*guzername*” da (ke birîtiye le kaxezî nuştawey A4 terxane bo nûsînewey çîrokî xoyan) binûsinewe, min guzernameyekim dedaye Tonia û be yarmetîy amozakey dawam lê dekird çîrokî xoy binûsêtewe û nîgarkêş bikat. Berhemekanî Tonia pêşanî da ke nîgarkêşêkî behremende û destuxetî yonanîşî zor ciwane. Zorî pê neçû em pîte ciwan û nasikane serincî hawpolekanî rakêşa û be sersamîyewe lêy kobûnewe.

Hergîz lebirîm naçêtewe çî şanazîyeyk le gişt giyanîda degeşayewe. Ber lewe, Tonia lay ême تنها kiçêkî niwê bû ke natwanî letekiman bidûwêt, paşan be nûsyarî xoy pêşanî dayn çî kîjoleyekî desalaney berzeberheme. Her ewendey mamostay “zimanî dayikza” -y peyda bû, dawam lê kird têkstekey Tonia tercemey swêdî bikat. Mamosta terceme swêdîyekey le jêr dêrekanî xoyda nûsî. Ke katî ewe hat fêrxwazan çîrokî xoyan bixwêndinewe, Tonia têkste yonanîyekey xoy dexwêndewe û nîgarekanî pêşan deda û minîş terceme swêdîyekem dexwêndewe. Ew pesin<sup>65</sup> û behendgirtiney hawpolan pêşanyan deda, betaybetî bo ew xetuxale yonanîye ciwaney, bûwe yarîderêkî gewre bo firajûtinî em fêrxwaze le xwêndinî fêrgeda. Bê ewî pêwîstiman be deramedî ziyade bêt û bê ewey min yonanî bizanim, twanîman twana û zanistî fêrxwazêk repêş bixeyn.

---

<sup>65</sup> Pesin: medih.

## Firajûtinî berayî ziman lay zarok

Bo cexitkirdin leser sengî “*civakandin*” bo firajûtinî ziman le lay zarok, çemikî “*civakandinî ziman*” bekar dehênêrêt û mebestîş “*civakandin*” î zaroke bo zimanêk. Lêreşda cexit leser eweye ke zarok twanayekî zigmakî heye bo fêrbûnî ziman le rêy hawjînî û karlêkî civakîyewe. Zarok heye her zû fêrî “*awazî ziman*”,<sup>66</sup> ahengî tûn<sup>67</sup> û cudawazîy nêwan dengî kurt û dengî dirêj debêt. Car heye debîstît zarok destewajey dirêj “*delêt*” bê ewey wişey dirustî têda bêt. Car heye zarok pêşanî dedat ke “*awazî corawcorî ziman*” eke fêrbûwe bewey telefon degirêt û be şêwazêk “*deaxfêt*” be axaftinî dayikî deçêt, yan kitêbêk dekatewe û be şêwazêk “*dexwênêtewe*” be şêwazî xwêndinewey bawkî deçêt.

Zarok hen zû dekewine axaftin be “*ladan*” î zorewe le “*zimanî amanc*”.<sup>68</sup> Zarokî dîke hen direng ziman degirin belam dirustitir dêne go. Zorbey zarok ber le temenî dû salîda detwanin ristey sakar saz biken dû peyvî hebêt ewca ber le sê salî saxtare bineretîyekanî zimanekeyan le la geşe dekat. Ew zarokey zimanî swêdî yekem zimanîyetî, lem temeneda şariste û pariste cuda dekatewe. Zimanî swêdî yekêke lew zimananey cîhan ke rîzbendîy wişe têyda watabexşe û ew rîzbendîyey wişe le şaristeda cudaye le hî pariste.

Ew zarokey letek dû ziman yan zêdetirî terîbda gewre debêt, “*firajûtinî hawkatî dûhem ziman*” î debêt. Bo nimûne zimanî dayikza cudaye le zimanî bab û heryekeyan yeknewa<sup>69</sup> zimanî xoy letek mindalekeda bekar debat. Ew dem mindaleke terîbane zimanî cuda fêr debêt. Lewaneyişe dayikûbab yek zimanyan hebêt belam mindaleke le berayî temenewe biçête zaroxane û lewê zimanêkî dîke kara bêt. Lêreda zor car firajûtinî zimanî swêdîyewe lay em zaroke debête “*firajûtinî pilepiley dûhem ziman*” çünke firajûtinî “*yekem ziman*” î mindaleke zimanî axaftinî maleweye.

Ew xaley biryar dedat lewey firajûtinî ziman lay mirovêk firajûtinî “*yekem ziman*” bêt yan “*dûhem ziman*”, birîtîye lewey aya ew mirove zûtir çi sîstemêkî zimanekîy dîke fêrbûwe yan na. Firajûtinî “*dûhem ziman*” be şêwazêk deçerxêt cudawaz le firajûtinî “*yekem ziman*”. Firajûtinî “*yekem ziman*” lay zarok - ewca yek ziman bêt yan çend zimanêk - lew bestêneda deçerxêt ke mindalekey têdaye. Firajûtinî “*dûhem ziman*” - ke emîşyan dekirêt yek yan çend zimanêk bêt - pena bo zimanzanînî zûtir debat, boye em firajûtineyan cudaye lewey yekem, deşkewête ber karîgerîy xalî wek: kameye ew zimane/zimananey mirov zûtir fêryan bûwe û destpêkî em firajûtine le kam temendaye.

Firajûtinî binaxey yekem ziman, wate zimanzanîy bineretîy, begîştî bêkêşe bedem “*fêrbûnî naferimî*” yewe, deçerxêt, ke hîç wanebêjîy têda nîye. Belam bo firajûtinî dûhem ziman, wanebêjî sengî gewretirî heye bo yarmetîy fêrbûn û amajedan bew kospaney dêne rê. Heta destpêkî em fêrbûney dûhem ziman dûwa bikewêt, sengî fêrkarîyewe ziyad dekat.

Diyardeyekî bawe ke zarokî fireziman le salanî berayîda ziman be şêwazî corawcor têkel deken. Car heye wişey em zimane be rêzimanî zimanêkî dîke bekar dehênênin. Carîş heye wişey serbe zimanî cuda le yek rîsteda tîhelkêş deken. Ewîş her bawe ke zarok le mawey cudawazda pena debene ber stratêjî zimanekey cudawaz. Begîştî geşey her zimanêk le berayî temenda lay zarokî fireziman xawrewte. Belam weha diyare paşan zarok têy dehênêtewe û tojînewey corawcor heye pêşanî deden ke zarokî serbe dû zimanî cuda, ger berdewam le temenî helkişanîda piştîwanî bikirêt, ewa amadeyî

<sup>66</sup> Awazî ziman: prosody.

<sup>67</sup> Ahengî tûn: intonation (linguistics), ew tûney le axaftinda bekar dehênêrêt. Berzî û nizimîy tûn bo nimûne bekar dehênêrêt bo cudakirdinewey girîmane le pirsîyar.

<sup>68</sup> Zimanî amanc: target language, ew zimaney tercemey bo dekeyt, ew zimaney mebeste fêrî bibêt. Emyan beranber “*zimanî deraw*”: *Source language* dewestêt ke dekatewe ew zimaney tercemey lêwe dekeyt, yan ew zimaney xot deyzanît.

<sup>69</sup> Yeknewa: consistently.

tewaw dekat û zale beser dû zimanda. Belam em geşekirdine xorisk narwat belkû be dirêjayî salanî xwêndin pêwîstî be yarmetîy berdeewame.

Kewate yarmetîdanî herdû zimaneke girînge bo firajûtinî firezimanetî û kesanî riskawî dewrûber debêt derik biken bewey xawrewtîy geşey ziman û têkelkirdinî ziman le salanî berayîda diyardeyekî xoriske. Her ewey zarok, bê fêrkarî patewpat,<sup>70</sup> bedem katewe fêr debin zimaneke le yekdî cuda bikenewe, belgeye bo twanay zigmakî mirov bo peredan be ziman le rêy bestênî civakîyewe.

### **Bîrdoze derbarey firajûtinî ziman lay zarok**

Le sedey bîstemda dîdî mirov bo firajûtinî zimanî zarok tewaw bertawî rêbazî rewîştayetî<sup>71</sup> bû. Rewîştayetî delêt zarok be lasayîkirdinewey gewresalan fêrî ziman debin. Lêreda jînge dekirête nimûneyek lewey zarok deba lasayî bikatewe. Rahêzanî ayetî beranber reftarî dirust û herweha amajey nayetî û rastkirdinewey beranber hele deba zarok bixene ser rêbazî dirust. Noam chomsky le gutarêkî nawdarda salî 1959 le dîdêkî neytîvîzim<sup>72</sup> nativism ewe rexne le dîdî rewîştayetî degirêt. Neytîvîzim delêt twanay zimanzanîy zarok û herweha twanay rêzimanzanî taybetmendîy zigmakin. Bîrdozey neytîvîzim, ke mênalîzim<sup>73</sup> mentalism yişî pê degutirêt, delêt zarok be “zimanpjên”<sup>74</sup> language acquisition device (lad) ewe dezêt û beşêk lem “zimanpjên” e birîtîye le “rêzimanî cîhanî”<sup>75</sup> universal grammar (ug). Gerçî tojînewey berfirewanî têda kira belam tenha çend binemayekî giştî darêjra bo şewazî rêkxistinî em rêzimanî cîhanîye.

Lem bestêne zansîte, tojînewey “dûhem ziman” serî helda. Emyan bîrdoze û rêbazî nêw tojînewey “yekem ziman” î dekirde riwangey sirûş. Tojeran fêrbûnyan be prose debînî û şagirdyan<sup>76</sup> be endazyarêkî çalak dana ke xerîkî helbestinî rêzimanêkî nawekîye. Em doxe serincî le fêrkarîyewe gorî be fêrbûn.

Tojînewey serbe zimanî zarok, le heftakan û heştakanî sedey bîstemda, serincî le karlêk û lewêşda betaybetî le zimankarîy zarok xoy, gîr dekird. Bemeş dîdêk le ziman peyda bû, deygut zarok kesêkî çalake xoy zimanî xoy heldebestêt û lem kareşda xawen twanayekî zigmakî diyarîkirawe. Ragnhild söderbergh yekêke lewaney nûsînî heye derbarey firajûtinî zimanî zarokî swêdîy le berayî temenda û lem kareşda ew riwangeyey heye ke delêt zarok be hawsemay dewrûber, çalakane zimanî xoyetî deafirênêt (1988). Rêk ew rastîye ke zarok derbirînî taybet be xoy heldebestêt bê ewey zûtir bîstibêtî, lem riwangeyeda kiraye girîngtirîn belge dij bew dîdey rewîştayetî ke deygut fêrbûnî ziman be lasayîkirdinewey debêt.

Tojîneweş derbarey fêrbûnî “dûhem ziman” lay gewresalan encamî wêkçûy dedat, ke kesî şagird bo fêrbûnî zimaneke, rêzimanêkî taybet be xoy, rêzimanêkî nêwekîy, daderêjêt. Ew zimaney şagirdêke

<sup>70</sup> Patewpat: explicit, rûn, aşkira, diyarîkiraw.

<sup>71</sup> Rewîştayetî: behaviorism (behaviourism), rûkarêkî zanistî - derûnnasîye serincgîrî reftar û rahênane.

<sup>72</sup> Neytîvîzim: nativism, nativist theory, bîrdozeyeke delêt twana û şewazî têgeyîştin taybetmendîy zigmakin yan le cînda amade kirawin, ewey fêrkarî deyk tenha çalakandinî ew twanageley.

<sup>73</sup> Mênalîzim: mentalism, mentalistic theory.

<sup>74</sup> Zimanpjên: Language Acquisition Device (LAD).

<sup>75</sup> Rêzimanî cîhanî: Universal Grammar (UG), bîrdozeyekî zimanewanîye delêt fêrbûnî rêziman bernamey zigmakî heye le mêşda nexşênrawe.

<sup>76</sup> Şagird: learner, kesêkî xerîkî fêrbûne.



pêşanî dedat, “zimanî katekî”<sup>77</sup> interlanguage yan “zimanî fêrbû”,<sup>78</sup> zimanêkî rêsabende belam beşêkî rêsakan tewaw rêk nayan letek rêsakanî zimanî armanca, wate ew rêsageley axêwerî resenî zimaneke bekarî dehênin.

Hatch (1979) delêt zarok bo peredan be twanay ristesazî xoy, wate twanay dariştinî riste û destewajey xoy, le “saxtarî stûnbar”<sup>79</sup>-ewe deçêt bo “saxtarî asobar”.<sup>80</sup> Zarokî biçûk be yarmetîy kesêkî şarezatir dête go, ke be pirsiyar û be firewandinî wişekanî ew zaroke, harîkarî dekat, bo nimûne:

*Zarok: bûkele*

*Yarîder: ewe bûkeley toye?*

*Zarok: bûkele xewtin*

*Yarîder: êsta bûkeleke dexewêt?*

*Zarok: textexew*

*Yarîder: kewate bûkeleke Leser textexew dexewît*

*Zarok: bûkele xewtin textexew*

Nimûneke pêşanî dedat çon zarok be yarmetîy kesêkî dîke le derbirînî takuşewe heldekişêt bo derbirînî firewişe. Destewajey “saxtarî stûnbar” û “saxtarî asobar” amajen be şewey zimaneke le nûsînda. Destpêk wişekan le jêr yekda rîz debestin, stûnbarin. Paşan destewajey takwişe û derbirînî dirêjtir le risteda ko debinewe, asobarin. Zarokî biçûk wabestey yarmetîye le kesêkî şarezawe bo dariştinî derbirînekey xoy, be saxtarî stûnbar. Belam bedem katewe pere be twanay xoy dedat bo ewey xoy bîrokey dirêjmewda derbibirêt, be saxtarî asobar.

Riwangey kotay newedekan û seretay salanî dûhezar bo firajûtinî ziman kewte bertawî bîrdozekanî Lev Vygotsky. Vygotsky delêt zarok, le rêy harîkarî û karlêkî saxtarinbendewe letek kesanî le xoy riskawtir, pere be twanay civakî û hizirîy xoy dedat. Em cexitîş dexate ser ewey bekarhênanî zimanêk rêk hewraztir lewey mindaleke zale beserîda, debête dineder bo ew mindale. Vygotsky be çemikî “*nêziktirîn zonî firajûtin*” (ZPD)<sup>81</sup> pêşanî dedat ke derfetî firajûtinî zarok rêk le serû ew nihomeweye êsta ew zaroke têyda zale. Lewêda zarok detwanêt ziman bekar bihênêt belam be yarmetîy bo nimûne mamosta.

Ewca tojeranî dîkey bo nimûne Awistralya (Australia), be piştîwanîy berhemî dîkey wek “*zimanewanîy sîstemdarî karkird*”<sup>82</sup> -î M. A. K. Halliday û cexitkirdinî Jerome S. Bruner Leser “*rahêzey ziman*”,<sup>83</sup> twanîyan pere bew boçûnane biden. Lêreda “*rahêzey ziman*” rêk lew zone here nêzîkey firajûtinda ZPD, bûwe mayey girîngê pêdan. Polêk tojerî wek Pauline Gibbons (2006), Mary J Schleppegrell (2004), Lily Wong - Fillmore & Catherine Snow (2000), Beverly Derewianka (2004), Dolly Van Der

<sup>77</sup> Zimanî katekî: interlanguage, ew zimanî mirov bekarî dehênêt le nêwan destpêkî fêrbûnî zimanêkî niwê heta ew demey baş fêrî ew zimane debêt.

<sup>78</sup> Zimanî fêrbû: learner language, mebest zimanî amance, ew zimane niwêyey mirov fêrî debêt.

<sup>79</sup> Stûnbar: stûnî, be barî stûnîda. Paşgirî “bar” lêreda bo sazkindinî awelnawe, biriwane *asobar*.

<sup>80</sup> Asobar: asoyî, be barî asoyîda. Paşgirî “bar” lêreda bo sazkindinî awelnawe, biriwane *stûnbar*.

<sup>81</sup> Nêziktirîn zonî firajûtin: *Zone of Proximal Development (ZPD)*, çemikêkî Vygotsky ye bo ravekirdinî ew zoney rêk le ban ew nihomeweye ke zarok têyda zale beser zimanekey xoyda. Emyan debête kayey dineder bo helkişan.

<sup>82</sup> Sîstemî karkirdî zimanewanî: *Systemic Functional Linguistics (SFL)* norînêke le zimanewanîda delêt ziman sîstemêkî “*civakî - nîşanekî*” *social semiotics* ye, le berhemî Michael Halliday (1925-).

<sup>83</sup> Rahêzey ziman: Scaffolding Language, rayeleyeke le xal û peykerî têkbeste bo piştîwanî û yarmetîdanî firajûtinî ziman le layen Jerome S. Bruner (1915-) darêjrawe.

Eerden & Maaike Hajer (2008)... le serşarî bîrdozekey Halliday derbarey “zimanewanîy sîstemdarî karkird” (SFL), kewtine ser tojînewe le firajûtinî ziman û firajûtinî zanyar be çendîn ziman lay zarok. Emane cexit deken Leser girîngîy yarmetîdan û piştîwanî le layen gewresalanewe bo firajûtinî ziman le lay zarok.

Stephen Krashen (1982), cexit dekat Leser ewey girînge fêrxwazî serbe zimanî dîke, destiresî hebêt bo daxun<sup>84</sup> -êkî zimanekî weha le astêkda bêt bo *helmiştin*<sup>85</sup> dest bidat. Ziman ger le nihomêkî zor diwar bêt, nabête mayey helmiştin. Emîş, wek Vygotsky, cexit dekat Leser ewey girînge daxun le astêkda bêt rêk le ban ew nihomey şagird têydaye. Em bîrdozeyey Krashen kewte ber rexney zor leber çend hoyek, yek lewan behend negirtinî derxun<sup>86</sup> -î şagirdekeye, berhemekeyetî le buwarî zimanda.

Merrill Swain (1985) ew girîngîye dedat be berhemî zimanekîy şagird û delêt şagird xoyîşî ziman berhem dênêt. Emyan cexitî taybet dexate ser “*derxunî têpeste*”<sup>87</sup> ke têyda şagird dine dedirêt derbirînekey xoy bixate zimanêkewe kemêk helkişawtir bêt lewey êsta deyzanêt. Kewate pêwîstîy berokgîrîy zimanekî, hem berengarbûnewe û hem berhemhênanî zimanekî beriztir lew zimaney mirov xoy deyzanêt, le çend layekewe û herweha le çend serşarêkewe cexitî Leser dekirêt.

Le Swêd, “*riwangey civakî - ferhengî*” le buwarî fêrkarîda, ke Roger Säljö (2000, 2005) niwênerayetî dekird, birewêkî berînî le sedey bîstuyekemda peyda kird. Lem riwangeyeda cexit dexirête ser peywendîy nêwan firajûtinî ziman le layek û fêrbûn le layek, cexit dexirête ser ewey mirov le bestênî siruştîda, be karlêk letek kesanî dîke fêrî ziman debêt. Ziman be diyardeyekî “*doxbend*”<sup>88</sup> dadenrêt, wate cexit dekirêt Leser ew dox û bestêney fêrbûn û firajûtinî zimanî têda deçerxêt.

Tojînewe derbarey “*dûhem ziman*” pêşanî dedat ke cudawazîy heye le nêwan firajûtinî zimanî zarok û hî gewresal û deşilêt betaybetî “*heraşbûn*”<sup>89</sup> karîgerîy zorî heye. Rêk ew twanayey mirov heyetî bo fêrbûnî ziman le rêy karlêkî siruştîy civakîyewe letek kesanî dîke, adgarêkî berçawe lay zarok. Aşkiraye ke zarok baştir le kesanî riskaw fêrî wişe û destewajey serleber debêt. Kesanî riskawîş be xwêndinî ferimî û rahênanî agayane baştir fêr debin. Kewate girînge zarok le jîngeyekda gewre bin le rûy zimanewe berokgîrî dinederî têda hebêt. Tojîneweş pêşanî dawey ke rahênanî saxtarbend bo zarok be mebestî peredan be zimanzanîyan, ger le derewey bestênî siruştîy xoyan bêt, sûdyan keme.

Xalî hawbeş le nêwan bîrdozekanî firajûtinî ziman le lay zarok birîtîye le cexitkirdin Leser ew layeney zimanzanîy ke Bachman & Palmer nêwî denên “*twanay rêzimanzanî*” (1996). Herçî “*twanay têkstzanî*” ye, twanay bekarhênan û berhemhênanî têkstî dirêjtir, herweha “*twanay kirdekî*”, ke birîtîye le “*twanay karkirdane*” û “*twanay civakî - zimanewanî*”, be degmen bûnete mayey tojînewe. Belam le buwarî “*zimanewanîy sîstemdarî karkird*” (SFL) û “*riwangey civakî - ferhengî*” da em beşaney firajûtinî zimanî zarok behend degîrên.

### **Mercî zimanekî le zaroxane, polî amadekar û salanî berayî fêrgeda**

Deysa le buwarî firajûtinî zimanî zarokda, norey ew bingeyane çîye ke zarok têyanda gewre debêt û karmendanî zaroxane û fêrge çon detwanin be şêweyekî baş piştîwanîy le zarok biken? Le “*riwangey*

<sup>84</sup> Daxun: input.

<sup>85</sup> Helmiştin: intake.

<sup>86</sup> Derxun: output.

<sup>87</sup> Derxunî têpeste: pushed output.

<sup>88</sup> Doxbend: situated, doxbendetî: situatedness. Ke delêt diyardeyek doxbende, bo nimûne *zanyar doxbende situated knowledges* mebest eweye diyardeke bertawî dox û bestênî xoyetî.

<sup>89</sup> Heraşbûn: puberty, temenî nêwan mindalî û riskan. Balixbûn.

civakî - ferhengî” da cexit dexirête ser ewey firajûtinî zimanî zarok debêt bixirête “bestên” -ewe û debêt firajûtinî ziman û firajûtinî zanyar “hawsema” bin. Rûkarî em kitêbe be piley yekem rûwew firajûtinî yekem de - dûwazde salî zimanî zaroke, belam ewaney kar letek zarok deken, riwangeyan lewe firewantire. Aşkiraye ke zaroxane û salanî berayî fêrge amadekarin bo astî dîkey balatir û bo xwêndinî amadeyî. Kewate weha lebare dûwasalî xwêndinî amadeyî bikeyne amanc û le hoşî xomanda cêgîrî bikeyn ke zarok her le temenî zaroxanewe pêwîstyan be derfete bo peredan bew zanyar û twanageley lêyan çawenor dekirêt heyانبêt le xwêndinî beriztir û le guzeranî gewresalîda.

Lêreda cêy xoyetî wirdbînewe lew merce hemecoraney zimanekî ke le salanî xwêndinda dêne pêş û rûberûy fêrxwaz debînewe. Çemikî “*tomar*”<sup>90</sup> raveye bo core cudawazekanî ziman ke le bestênî corawcor û kayey corawcorda dêne bekarhênan. Bo nimûne, kayey xêzan tomarêkî zimanekî bekar dehênêt cudaye le kayey fêrge ke tomarî zimanekî xoy heye. Girînge mirov firajûtinî ziman be proseyekî hêlekî danenêt, belkû pitir wek firajûtinêk rûwew corfirewandin<sup>91</sup> -î ziman. Wêneyekî baw bo ravekirdinî firajûtinî ziman lay zarok, bas le “*jêrxan*” û “*jûrxan*” dekat (Viberg 1993). Delên zarok jêrxanî zimanekîy xoy le nêw xêzanda daderêjêt. Paşan le fêrge jûrxanî zimanî zarok perey pê dedirêt bo ew zimaney pêwîste bo xwêndin. Bo nimûne fêrbûnî stratêjî helkişîwî sewad. Jim Cummins (1979) tojerî “*dûhem ziman*” le Kanada, be dû çemikî “*zimanzanîy danûstên*” (BICS) û “*zimanzanîy zanyarbêj*” (CALP) nêzîkey heman cudawazîy rave dekat. Çemikî dîkey lem buwareda basyan dêt birîtîn le: “*zimanî nêzîk*” beranber “*zimanî dûr*” (*Mâl i mun* 2002, Teleman 1979), “*zimanî rojane*” beranber “*zimanî zanyar*” (Axelsson 2005). Cudawazîy zimanekîy nêwan ew dû core le pajî pêncemda rave dekirên.

“*Pêdagogîy janrebîn*”<sup>92</sup> -î Awistralyazade, ke binemay le *Systemic Functional Linguistics (SFL)* î Michael Halliday wergirtûwe, pêşan dedat çî firerengîyek heye le “*tomarî zimanekî*” î fêrge. Raportêkî ezimûngey kîmya ew zimane bekar nahênêt ke raportêkî nûsirawî mêjû penay bo debat. Fêrge bo ravey zanistî fîzya û civaknasî, zimanî tewaw cudawaz bekar deben. Le “*pêdagogîy janrebîn*”-da cexit dekirêt leser ewey zarokî biçûkîş debêt derfetî hebêt bo peredan bew tomaraney paşan le xwêndinî fêrge debine pêwîstî le babetî corawcorda. Kewate yarmetîdanî firajûtinî ziman lay zarok debête erik û dekwête estoy karmendanî zaroxane û astî berayî fêrge. Emyan betaybetî girînge bo ew zarokaney em core zimanane le derwey fêrge nabîstin, dîsan betaybetî zorbey fêrxwazî serbe zimanî dîke degirêtewe.

Ziman, le zaroxane, polî amadekar û salanî berayî fêrge, le babetî cudawazda hênde cudawaz nîye. Cige leweş mamosta yarmetîy zorî berhest bo fêrbûn pêşkeş dekat. Wêray eweş girînge karmendan agayane kar biken bo peredan be zimanî fêrxwaz le buwarî hemecorî zanyarda. Katêk bas le babetî corawcor dekeyn, bo nimûne tezîn û twandinewey aw le piley sardî û gerimîy cudawazda, girînge mamosta ew çemikane rave bikat ke le bestênî zanistîda dêne pêş. Bo rûnkirdinewey gorîni “*peytî*” (*xestî*) y aw bepêy piley sardî û gerimî, wek “*xalî tezîn*”, “*xalî twandinewe*”, “*tund*”, “*şil*”, “*gaz*”... htd. Ger babetî xwêndineke kirim bêt, ewa deşêt çemikî wek *kirimpile*, *kozaxe*, *pile* û *baziney jiyay* pêşkeş bikirên. Katêk le matematîkda degeyne waney kêşane û pêwane, derfetêkî siruştî dête pêş bo bas le awelnawî wek girantir, sûktir, here giran û here sûk. Girînge fêrxwaz derfetyan hebêt zanistî xoyan bew zimane niwêye derbibirin.

Bo fêrxwazî serbe zimanî dîke, eme basêk nîye pêwîst bikat çawerêy bêt heta fêrxwaz degate temenêkî astî zimaneke [zimanî dûhem ke lêreda dekatewe swêdî] lebar bêt. Yarmetîdanî fêrxwaz bo

---

<sup>90</sup> Tomar: register.

<sup>91</sup> Corfirewandin: diversification, prosej firewandinî cor û buwarî kar û berhem. Bo nimûne kompaniyayekî geroksaî xerîkî corfirewandinî berhemî xoyetî û le pena gerokda dekwête sazkindinî core maşînî dîkeş, bo nimûne firok, tank û celû.

<sup>92</sup> Pêdagogîy janrebîn: genre pedagogy.

derbirînî zanistî weha be zimanî swêdî debête hokar bo ewey firajûtinî ziman û firajûtinî zanist debine piştîwanî yekdî, çunke nêwerokî baseke astêkî hizirî heye deguncêt letek temenî fêrxwazekeda.

Mary Macken-Horarick (1996) cudawazîy kayey fêrbûn dekate serşar bo cudakirdinewey tomarî zimanekî: *“kayey rojane”, “kaye taybetkar”* û *“kayey tekder<sup>93</sup>/sextang”*. *“Kayey rojane”* xêzan û ew jîngeye degirêtewe civakandinî berayî debexşête zarok. Mary cexit dexate ser ewey kayekan, ke dête ziman û çawenorîy le jîyan, bizoz<sup>94</sup> û firelayenen çunke bertawî çendîn hokarin, wek: zayend, reçekle (rîşey millî), çîn û dîn. Le *“kayey rojane”* da, ziman beşêke le dakewt (waqî) û takîş be piley yekem endamî desteye. Şêwaze girîngekanî fêrbûn lem kayeda birîtîn le beşdarî, serincdan û *“ezimûn û hele”* (trial and error). Fêrbûn le nêwan newekanda destawdest dekat. Zarok taradeyek core kontrolêkî heye beser ewey fêrî debêt û beser ew katey pêwîste bo fêrbûneke.

*“Kayey taybetkar”* bas le xwêndinî taybet dekat ke darêjgey<sup>95</sup> diyarîkirawî heye. Le civakî alozî em rojgareda, fêrkarî le buwarî riştey corawcorda pêwîste bo ewey mirovî cewan rabigen be darêjge baladestekanî zanyar, deselat û bîrûrada. Lem kayeda, be pêçewaney *“kayey rojane”*, zanyar be şêweyekî sistembend rêkxirawe. Nimûneyek lem base xwêndinî babetekanî fêrgeye ke berhemhênanewey zanyar têyda karêkî asayîye û zimanîş têyda çîdî girêdirawî barudoxî rojane nîye. Lêreda tak wek babet (objêkt) seyr dekirêt û peywendîyekan weha sinûrrêj dekirên mewday civakî pêşan biden (em base le pajî pêncemda beser dekirêtewe). Ême lêreda çawenorîn mamostay pişewer rêsay pêdagogîyaney wirdbînane piyade bikat. Mary Macken-Horarick (1996) delêt em riwangeye gerçî debête serçaweyek bo zanyarî pêwîst bo kayey sêhem, *“kayey tekder”*, ke têyda fêrbûnî rojane û fêrbûnî taybekar ko debinewe, belam deşbête handerî dîdêkî dawestaw<sup>96</sup> le fêrbûn û dîdêkî konewarane<sup>97</sup> le rêkxistinî civak.

Le *“kayey tekder”* da ke dekatewe fêrbûnî tekder, kes û zanîn têhelkîş dekirên, peywendîy naterazî deselat berengarî firerengî debêtewe. Leber ewey zanyaz be helbestêkî civakî dadenrêt, debête babetêk bo wirdbînî, berokgîrî û gorankarî. Eriki tak debête giwastinewey riwangey corawco le zanyar. Şagird han dedirên riwangey rikaber berawird biken, rexne bigirin û boçûnî dijwestaw beyek bigirin. Macken-Horarick pêşanî dedat çon pêdagogîy bizoz derfet derexsênêt hem bo peydabûnî dengî dîke û hem bo wirdbûnewey rexnegirane le nerêtî fêrkarîy cêkewtû. Le pajî pêncemda, nêwerokî em xale le rûy zimanekîyewe, dête berbas.

Ke dête ser fêrxwazanî serbe zimanî dîke, wate ew fêrxwazaney zimanî swêdîyan dûhem zimane û hêşta lem zimaneda negeyştûnete astêkî weha berawird bikirên be hawpolekanî dîkey swêdî yekem zimanyane, tojînewey zor heye derbarey baştirîn şêwe bo peredanyan be ziman û be zanyar. Axir emane le doxêkî taybetdan, hem debêt zimanî swêdî fêr bin û hem debêt ew zimaneş wek destawêj bekar bihênin bo fêrbûn. Wate emane debêt hawkat, hem jêrxanî zimanî xoyan darêjin û hem jûrxanî zimanekeşyan helbestin û zanyarî fêrge werbigirin.

Tojîneweyekî zor heye derbarey em xale bo nasînî ew barudoxey baştirîn derfetî derexsinît bo pêşkewtin le fêrgeda (bo nimûne: Axelsson et al. 2005, Thomas & Collier 1997, 2002, Cummins 2000). Tojer Monica Axelsson çiwar hokar be zor karîger nêw debat bo xwêndinî fêrxwazanî serbe zimanî dîke. Em çiwar hokare lem nîgarey berewe rûn dekeynewe.

<sup>93</sup> Tekder: reflexive.

<sup>94</sup> Bizoz: dynamic, pêçewaney *“dawestaw”*.

<sup>95</sup> Darêjge: form, nîgarî bineretî, qalib, biriwane *“Fehengî Xal”*.

<sup>96</sup> Dawestaw: static, statical, mend, pêçewaney *“bizoz”*.

<sup>97</sup> Konewaretî: conservatism, konewar: conservative.

Zimanî dayikza		Waney hemwarkiraw letek astî zimanda
	Zarokî fireziman	
Jîngeyekî yarîderî “civakî - ferhengî”		Xwêndinî zimanî swêdî wek “dûhem ziman”
<b>Çiwar hokarî girîng bo xwêndinî fêrxwazî serbe zimanî dîke: Axelsson</b>		

Tojînewe pêşanî dedat ke xwêndinî “zimanî dayikza”, ke dekatewe piştîwanîyekî tewaw le xwêndinî zimanî dayikza le gişt salanî xwêndinî fêrgeda, letek “xwêndinî zimanî swêdî wek dûhem ziman”, ew hokareye ke be tenê gewretirîn tawî heye leser rewî xwêndinî fêrxwazî serbe zimanî dîke (Thomas & Collier 1997, 2002). Emeş merc dexate estoy mamostayanî em dû zimane. Le Swêd, ne xwêndinî riştey zimanî dayikza behend gîrawe, ne fêrkirdinî zimanî dayikza (Hyltenstam & Tuomela 1996).

Ger bêyne ser basî “xwêndinî zimanî swêdî wek dûhem ziman” ewa riştey xwêndinî heye bo mamostayan belam beşêkî zorî ew mamostayaney karî letek deken ew xwêndineyan nîye ke pêwîste bo şirove, helsengandin û planrêjîy geşekirdinî zimanî swêdî lay fêrxwazî serbe zimanî dîke. Kewate em hokaraney basyan hat, be pileyekî yekcar lawaz le fêrgey swêdîda dabîn kirawin. Ger bête ser zaroxane û polî amadekar ewa lew pileyeş dadekişêt.

Ewca dêyne ser dû hokarekey dîke û ewanîş karîgerin. Helbet girînge waney babetekan be zimanêk bigutirêtewe ke fêrxwaz têy bigat, belam girîngîşe zimanêk bêt derfet bidate fêrxwaz geşe bew twana zimanekîyey xoyan biden ke pêwîste bo salanî dahatûy xwêndinyan. Karêkî baş eweye firajûtinî zanyar be herdû ziman bêt, hem be zimanî dayikza û hem be swêdî. Bo ewey fêrxwazî serbe zimanî dîke bitwanêt be zûtirîn kat pere be swêdîyekey xoy bidat ta ew astey pêwîste bo xwêndinî fêrge, pêwîstî debêt bewey berdeyam le mawey xwêndinda geşe be zimaneke bidat nek tenha le waney terxan bo zimanî swêdî wek dûhem ziman. Helbet em base hemû fêrxwazan degirêtewe û paşan le pajî dîkeda basî dêt.

Hokarî çiwarem ke bas le bûnî “jîngeyekî yarîderî civakî - ferhengî” dekat, girîngîy heye bo gişt fêrxwazan. Bo ew fêrxwazaney le xêzanêkewe dên ziman û ferhengiy cudaye le ferhengî baladestî fêrge, betaybetî girînge mamosta wiryay helwîstî xoyan bin derbarey bo nimûne beha û bekarhênanî ziman le xêzanî ew fêrxwazaneda. Gişt fêrxwazêk belayewe girînge hest bikat ke ew zanist û ezimûney le henbaney xoyda hen û deyanhênête fêrge, mayey rêzgirtinin, bo ewey hest neken naçarî helbijardinin le nêwan behay xêzan û behay fêrgeda. Em doxeş merc dexate ser hem twanay helsengandin û hem twanay hawsozîy mamosta.

## Pajî çiwarem: Tomarî zimanekî û şêwezarî hemereng

*Wêray ezimûnî deyan saley hem millî û hem firemillî, êstayiş debînî ew bîroke çewtey ziman beranber zanyar radegirêt, bûnî her mawe. Ziman û zanyar tewerî diwestawî yekdî nîn, wek ewey bo nimûne dîn û aydyoloji hen. Eman le rastîda rahêzer û tewawkerî yekdîn [...] Diruste le nêw êmeda firelayanî bûnî heye, belam sinûrdarîy gewcaneşiman têdaye.*

Lainio 1999, p 189-90

Swêd civakêkî firezimana û heta awir le raburdûş bideytewe her weha bûwe. Belam siyasetî fêrkarîy Swêd nerêtêkî behêzî twandinewey heye, wate zimanî Swêd le maweyekî dirêjxayenda be take zimanî fêrge danirawe (beder lewaney goya zimanî hawçerxn: îngilîzî, fransî, alimanî û... htd) û mercî bekarhênanî swêdî ew norme bûwe ke deba mirov rêzî bigirêt. Ewca bedem ziyadbûnî ew tojînewaney encamî geş pêşan deden le doxêkî piştîwanî bikat le firajûtinî fireziman, doxêkî têyda zimane tazekeyiş bikirête amrazêkî dîkey nêw kogey ziman, ewca rênemekanî zaroxane û fêrge berebere hatine ser piştîwanîkirdin le firajûtinî firezimanekî.

Jim Cummins amaje be sê hokar dekat emro karîgerîyan behêze leser sîstemî fêrkarîy le cîhanda:

1. Firewanbûnî hemerengîy ziman û ferheng betaybet le jîngey şarda wek derencamêk le diyardey koçî weha berîn ke le mêjûda nimûney nîye.
2. Helkişanî daway xwêndinî îngilîzî ke binemakey birîtîye lewey dayikûbab û herweha biryarderan pêyan wehaye zimanî îngilîzî kilîle bo pêşkewtinî civakî û abûrî.
3. Gorankarîy demedirengkanî sedey bîstem le abûrîyekî dameziraw leser binemay "civakî pîşesaz" ewe<sup>98</sup> bo "civakî agadarî"<sup>99</sup> ke berhemî firajûtinêkî tîjrewî teknolojiye.

(2006, p. 52)

Hokarî yekem, le Swêd tenha şar nagirêtewe, bigire be radeyekî beriz deştuderîş degirêtewe çunke koçhênî têda niştêcê dekirên. Koçî be komel hem le nêw welatda deçerxêt û hem le nêw dewletanda. Heta dêt, hem koçkarî zêdetir debêt û hem mirov le mawey temenî xoyda zêdetir koç dekat, çî bo xwêndin bêt, çî bo kar û çî leber hokarî dîke.

Hokarî dûhem pêşrewtîy zimanî îngilîziye û karîgerî heye leser pêgey zimanî swêdî. Emeş basêke le peycorîy ferimîda basî dêt (*Mâl i mun* 2002). Le layekewe pêgey zimanî swêdî dekewête ber hereşey ew baladestîyey zimanî îngilîziyewe ke heta dêt firewantir debêt. Her bo nimûne seyri ew hemû fêrgeyey Swêd bike ke zimanî xwêndinyan îngilîziye û herweha ew ziyadbûne tîjrewey wişe û

<sup>98</sup> Civakî pîşesaz: industrial society.

<sup>99</sup> Civakî agadarî: information society.

destewajey Îngilîzî le zimanî swêdîda. Le layekî dîkewe baladestîy zimanî swêdî le buwarî fêrkarîda be tundî le beşî zimanekanî dîkey nêw civak dexwat, bo nimûne zimanî kemayetîyekanî nêw welat: zimanî fînî, samî, meänkieli (fînîy Tornedal), yîdiş, romanî û zimanî amajey swêdî, herweha zimane tazekanî kemayetîy wek erebî, somalî û turkî (*Bästa språket 2005, Värna språken 2008*).

Hokarêkî sêhemîş heye karîgerîy zorî le ser Swêd heye. Ew firajûtine tîjrewey “teknolojîy agadarî”<sup>100</sup> û ziyadbûnî rêjewî<sup>101</sup> agadarîy be radeyekî beriz karîgerî heye leser civak û xwêndin. Letek peydabûnî destawêjî dîjîtal bas le zimanî “firedox multimodality” dekirêt. Leweşda amaje bewey karêkî asayîye ke hawkat çendîn dox û şewazî zimanekîy cudawaz bekar bibirêt: mirov beranber komputer danîştûwe û giwê le muzîk degirêt, hawkat xerîkî le îternêtda xerîkî peydozîye, be maws<sup>102</sup> û kîbord<sup>103</sup> laperey corawcor beser dekatewe, îkonî corawcor kilîk dekat û têbînî taybet tomar dekat. Emane betaybetî zarok û cewanan degirêtewe ke letek hevalêkda beranber komputer kar deken. Deng û reng, bizozî û mendî têkel be şewazî hemecorî nûsîn dekirên.

Deysa çon detwanîn zaroxane û fêrgey weha saz bikeyn ew firerengîyey ziman û sewade behend bigirin ke lem zemaney cîhangîrî û koçbarîyeda hen û piştîwanîşî lê biken? Çon detwanîn em rewtey derkinarkirdine<sup>104</sup> civakî û abûrîyey emro le nêw grûpî berînda rû dedat, helgêrînewe? Em grûpe berînane kesanekin le welatanî dîkewe hatûn, ewanen le Swêd zawin belam le nêw xêzanî koçhênda yan beşêkin le kemayetîyekanî nêwxo. Mamosta çî bikat başe bo ewey zaroxane û fêrge be corêk bin zarok û cewanan têyanda hem pere be zimanî xoyan biden û hem le fêrgeda serkewtû bin?

“Zimanewanîy sîstemdarî karkird” (SFL) -î Halliday destawêjêkî şirovekarî bîrdozekîye bo wirdbûnewe le zimanî nêw pol be mebestî peydakirdinî zanist bo bersivdanewey pirsîyarî lew babetane. SFL bûwe pirdêk le nêwan zimannasîy nerêtî û reçekeknasî.<sup>105</sup> Le rêy SFL -ewe ziman debête proseyekî civakî û binemayek debexşêt bo rûnkirdinewey çon û boçî ziman dête gorîn be pêy ew kesey bekarî dehênêt û bepêy ew amancey boy bekar dehênrêt. Leber eweye em rêbaze betaybetî guncawe bo tojînewe le rûdawî nêw pol û bo girêdanî rûdawî fêrge be rûdawî nêw xêzan û nêw civak.

Wek le pajî sêhemda basî hat, çemikî “*tomar*” le nêw SLF-da şaçemike û bas lew derbirîne zimanekîyane dekat ke le bestênî corawcorî serbe kayey corawcoda bekar debirêt. Halliday çemikî “*tomarî akadêmî*” bekar dehênêt bo ravey ew zimaney le bestênî fêrgeda, le layen mamosta, fêrxwaz û kitêbî fêrgewe bo derbirîn lew zanyarey lewêda heldebestirêt, dête bekarhênan. Kewate çemikî “*tomar*” bo derbirîn nîye lewey ême rahatûyn be zimanî cuday bizanîn, belkû corî cudawazî zimane ke le bestênî corawcorda bekar dehênrêt. Le pajî pêncemda “*tomarî akadêmî*” zêdetir dête berbas.

## **Firajûtinî firezimanekî**

Sinûrdarkirdinî derfetî mirov bo bekarhênanî zimanî dayikzay xoy - û herweha twanay sinûrdar le zanînan zimanî ferimî û baladest le welatekeda - hokarêke bo derkinarkirdinî mirov le buwarekanî xwêndin, siyaset û maf. Le başûrî Sahara (Biyabanî Mezin) y Afirîka pitir le dûhezar û pêncsed ziman heye, belam derfetî bekarhênanî zimanî xo le xwêndin û guzeranî civakîda bo zor kes tewaw sinûrdare. Pitir le 30 welatî ew devere zimanî ferimî têyanda cudaye le zimanî zorîne gel. Tenha 13% y

<sup>100</sup> Teknolojîy agadarî: information technology.

<sup>101</sup> Rêjew: flow, biriwane Celîzade, “*Zarawesazîy pêwane*”.

<sup>102</sup> Maws: mouse, mişkey amêrî dîjîtal.

<sup>103</sup> Kîbord: keyboard, textekilîl-î amêrî dîjîtal.

<sup>104</sup> Derkinarkirdin: marginalization, perawêzxistin.

<sup>105</sup> Reçekeknasî: ethnography, êtnografî, rêbazêkî zanistîye bo rave û berawirdkirdinî mirovgel û ferhengî corawcorî çîhan.

zarokî deçine fêrgeyekî bineretîy weha be zimanî dayikzay xoyan têyda bixwênin. (UNDP 2004 p.13, Cummins 2006)

Firewanbûnî diyardey koç bo Swêd weha kirdûwe netwanîn be hasanî zarok le dû grûpî “zarok ke swêdî yekem zimanyetî” û “zarok ke swêdî dûhem zimanyetî” -da cuda bikeynewe. Le zor barda sexte bizanîn swêdî yekem ziman yan dûhem zimanî ew zarokeye. Kewate girînge mamosta zanistî hebêt derbarey firajûtinî ziman, firajûtinî hem takziman û hem fireziman, bo ewey bizanêt çon planêkî guncawî wane darêjêt.

Zor car çemikî “zimanî dayikza” û çemikî “yekem ziman” be hawwatay yekdî bekar dehênrên. Zor mindalî le Swêd xawen “yekem ziman” êkî cudaye le zimanî swêdî, twanayekî berizî lew zimaneda nîye, belkû zimanî swêdîy le la debête behêztirîn ziman, gerçî swêdî lêreda dûhem zimane. Lewaneye karî ewe bêt ke ew zarokey yekem zimanî le nêw xêzanda heye, le temenêkî berayîyewe deçête zaroxane û hawrêy swêdîziman peyda dekat û bew şêweye zimanî swêdîyeke debête zimanî serdest. Zarokîş heye le Swêd zawe, belam leber ewey le jîngeyekda gewre debêt zimanî swêdî têyda zor baw nîye, swêdîyekey lê nabête yekem ziman. Lewaneye dayikûbab zimanî cuday xoyan hebêt û be zimanî xoyan ew zaroke bidûwênin û çî derfetêkî wehayîş nebêt bo têkelawbûn letek jîngeyekî swêdîzimanî weha bibête dineder bo geşekirdinî em zimaneyan.

Tenanet sinûrî nêwan “firajûtinî hawkat” û “firajûtinî pilepile” î ziman bizoze. Bo zorbey mindalî Swêd çûne zaroxane le berayî temenewe bes nîye bo ewey swêdîyekey hênde geşe bikat be “firajûtinî hawkatî ziman” nawzed bikirêt. Ger zarok le Swêd le xêzanêkda gewre bêt tenha dayik yan bawk swêdîziman bin, ewa be kirdewe zimanî swêdî debête yekem ziman. Ger mebest bêt zarok geşe be zimanî kemayetîyekeş bidat ewa rêk lew xaleda pêwîstî be piştîwanîyekî zore. Ewca jimareyekî gewre zarok hen le Swêd zawin û dayikûbabyan swêdî zimanin belam beşêkî berînî salanî gewrebûn û fêrgeyan le welatêkî dîke birdote ser. Swêdîzanîni emanîş be hasanî nagate, ne astî hawpolanî takziman ke tenha le Swêd gewre bûn, ne fêrxwazî dîkeş ke swêdî dûhem zimaneyane.

Firajûtinî ziman lay zarokî kerr taradeyek dekirêt berawird bikirêt be firajûtinî ziman lay zarokî fireziman. Zarokî kerr ger zû le berayî temenda fêrî “zimanî amaje” bibêt ewa emyan debête “zimanî dayikza” le lay. Kêşeyek lewedaye dayikûbab zûtir em zimane nazanin û debêt xoyan fêr biken. Leber ewey zorbey zarok ke zimanî amaje yekem zimaneyane, gerçî seyr radeniwênêt, mindalî kesanî kerrin. Kêşeyekî dîke ewey degutirêt zimanî amaje kosp dirust dekat bo fêrbûnî axaftin. Emîş her nimûneyeke le normî baladestî takziman. Leber eweşe firajûtinî ziman lay zor kesî kerr tûşî alozîy dêt (bo nimûne biriwane Bergman & Nilsson 1999). Tojînewey direngtir heye pêşanî dedat ke firezimanî sûdî bo zarokî kerr heye. Ew mindaley be zimanî amajey swêdîyewe gewre debêt, detwanêt paşan zimanî axaftinî Swêd wek dûhem ziman fêr bibêt. Le zor barda zimanî nûşînyan degate astêkî zor beriztir le zimanî axaftinyan.

Bo nimûne Tvingstedt (1993) pêşanî dawê çon zarokî giwêkiz (hêzî bîstinî kize) katêk têhelkêşî polî bîseran dekirêt, legel helkişanî temenî xwêndinda, kemtir dewrûberî xoy têdegat û pitir hest be perawêz kewtin dekat. Lem salaney dûwayîda çandinî “bîsewaney lûlpêç”<sup>106</sup> lay zarokî giwêkiz birewî sendûwe (Tvingstedt et al.1999). Em amêrane core hestkirdinêk be deng dedene zarok û armanc ewey zarok le jîngey bîseranda beşdar bêt. Belam amêrekan nîgeranîşyan le nêw kesanî kerrda peyda kirdûwe derbarey ayendey ferheng û zimanî amajey xoyan. Tvingstedt û kesanî dîkeş delên ger zarokî kerr bo helkirdin û bo firajûtinî zanyar û twana naçar bin pena tenha bo bîstin berin ewa firajûtinî danûstanyan, hestekîyan û hizirîyan, dekewête metirsîy gewrewe.

---

<sup>106</sup> Bîsewaney lûlpêç: *multiple-channel cochlear implant*, bo “bîsewane”, biriwane Celîzade, “Zarawesazîy pêwane”.



Her bo pêşandanî nimûneyek le hestî zarokêkî kerr be firajûtinî zimanekîy xoy, bas le Hêlêna dekem ke le xwêndinî riştey mamostayetî tûşî hatim. Hêlêna gêrayewe katêk em mindal bûwe, dayikûbabî handirawin ke be zimanêkî rûn bîdûwênin û zimanî amaje bekar nehênin, leber ewe xoyan fêrî zimanî amaje nekird. Le birî ewe dayikî be destpêşxerîy xoy Hêlênay fêrî nûsîn û xwêndinewe kird. Bem core Hêlêna be yarmetîy dayikî fêrî zimanî nûsînî swêdî bû wek yekem ziman. Hêlêna bas le serdemî zaroxaney xot dekat û delêt leber ewey em zarokêkî behêz bûwe, fermanî girtote dest û biryarî le helsûkewtî ewaney dîke dawe. Lewaneye beşêkî zorî danûstanyan leşekî bûbêt belam diyare zorîşî nakokî û lêk tênegeyiştinî letek bûwe. Ke degate temenî fêrge debînêt axaftin zimanî danûstane û bingey emîşyan helbet denge. Leber ewe têgeyiştinî em zor sinûrdar bûwe. Hêlêna paş çend salêk le xwêndinî fêrge ewca derfetî bo rexxa fêrî zimanî amaje bêt. Emyan le maweyekî kurtda bûwe zimane behêzekey Hêlêna.

Hêlêna delêt le temenî de salîda, paş ewey fêrî zimanî nûsînî swêdî, axaftinî swêdî, nûsînî îngilîzî û herweha zimanî amajey swêdî bû, ewca kewte ser ewey têbigat şitêk heye pêy degutirêt ziman û emane corî cudawazin le ziman.

Ger bîr le Hêlêna bikeyewe têdegeyt baskirdin le çemikî wek “yekem ziman” û “dûhem ziman” lay takekes, çend sexte. Lewaneye bişêt bilêyn danûstanî leşekî be têhelkêşî zimanî nûsînî swêdî bûwe yekem zimanî Hêlêna. Belam diyarîşe ke yekem zimanî Hêlêna bekarî hênawe bo ew fêrbûney le bestênî fêrge da dête çerxandin, zimanî amajey swêdî bûwe û her emîş bûwe behêztirîn ziman le lay. Ewca Hêlêna debêt dayik û serinc dedate mindale bîsterekey xoy çon hawkat fêrî herdû zimanî amaje û axaftinî swêdî debêt. Hîwadarim em kurey Hêlêna hêndey piştîwanî hebêt bo peredan be zimanî amaje ke bibête yek lew zimananey be gewreyî têyanda twanaye.

### **Tomar û şêwezarî corawcor**

Çemikî “*tomar*” û “*şêwezar*” bekar dehênrên bo nîşanekirdinî corî cudawazî ziman. Tomar bo base le corî cudawazî ziman ke yek axêwer bekaryan dehênêt le doxî cudawazda û bo mebestî cudawaz. Belam şêwezar bo derbirîne le corî cudawazî ziman le nêwçe ciyografîy cudawaz yan le nêw mirovgelî cudawazda. Zimanî rojane û zimanî zanyar nimûnen le “*tomar*”, belam zarawey deverêkî diyarîkiraw, lazarî cewanî hemereçelek (cewanî şarekanî bo nimûne Swêd ke serbe reçelekî hemecorin), lazarî gelêr û jargonî hemecor nimûnen le “*şêwezar*”.

Cudawazîy ziman û zarawe le pajî pêşûda rave kira. Ber le firewanbûnî masmedyay hemecor, zarawekanî ême leçaw emroda zor zêdetir le arada bûn. Axaftin pitir serdest bû, axêwerîş pitir letek kesani nêwçey nêzik xoy dedûwa. Bedem firwanbûnî karîgerîy masmedyawe, mirov pitir kewte bertawî ewey pêy degutirêt swêdîy standard, hem axaftinî û hem nûsînî. Heta dêt sewad ziyad debêt û medyay corawcor axaftin pexiş deken. Karîgerîy em diyardeye leser zimanî ême bote hoy nêzîkbûney zarawekaniman.

Hokarêkî dîkey lawazbûnî zarawekan ziyadbûnî diyardey koçbarîye. Ême, leçaw mirovgelî serdemanî kiştukal û berayîyekanî pîşesazîda, rûberûy corî zêdetirî axaftin debîn. Hawkat letek em diyardeye, şêwezarî dîke peyda debin, bo nimûne ew lazaraney zûtir basyan hat ke cewanî hemereçelk le gewreşarekanda bekarî dehênin.

Ewca firewanbûnî diyardey nûsînîş bote hoy goran le nûsînda. Dekirêt be şêweyekî sakar bilêyn ziyadbûnî jimarey kesani nûser û xwêner bote hoy serheldani şêwezarî nûsînî niwê. Le rojgarî xwêndinî xomda, salanî şêst û heftakan, swêdîy standard norm bû bo gişt core nûsînêkî fêrge. Rêşagelî dariştinî têkst û diyarîkirdinî rast û hele, taradeyek yekreng bû. Lem rojgare da dozînewey

nûsyar be şêwazî corawcor geranî zorî nawêt. Zorbeman bo nûsînî yadaşt, “lîstî - lebîrim - bê” û kurtepeyam begîştî bîr le nûsîn û xwêndinewe nakeynewe. Le nûsînî wehada normî dîke peyrew dekeyn cuda le normî nûsînî ferimî. Car heye rêşagelî standardî pîtinûsîn, riste kertkirdin, kurtkirawekan, nîşane û hêmakana... htd debezênîn. Ger awir le nûsîn û xwêndinewey elektronî bideytewe diyardeke rûntire. Kurtepeyam û çatî înternêt şêwazî nûsînî taybetyan peyda kirdûwe. Deşêt bilêyn zarawe zarekîyekan nêzîk xiranewe leyek û zarawey nûsînî niwê peyda kiran. Be berawird letek serdemanî dîkeda, zimanî nûsînî êsta zêdetir bergorane.

Em firajûte lem rojgareda yekcar tîjrewe û betaybetî le nêw zarok û cewananda lazar û jargonî hemecorî nûsîn nek zarekî le buwarî elektronîda geşe deken. Kewate mamostayîş debêt agayî hebêt derbarey “*tomarî zimanekî*” -y corawcor û deşbêt stratêjî hebêt bo hemwarkirdinî xwêndin letek ew tomarane, wate mamosta debêt “*agayî zimanekî*” -y hebêt.

### **Firajûtinî zimanekî - peredan be tomarî corawcor**

Weha baw bûwe firajûtinî ziman be proseyekî hêlekî seyr bikirêt. Destpêk zarokî biçûk derbirînî sakar fêr debêt, derbirînekan le riste û destwajey kurtda têkdebestêt û paşan pereyan pê dedat berew derbirînî taybet û ristey xawen saxtarî aloztir û ewca emanîş heldekişên rûwew têkstî serleber. Belam peybirdin be girîngîy peredan be tomarî corawcor, rûnî dekatewe ke firajûtinî ziman nakatewe تنها geşedan be twanay ziman bo nihomî beriztir, belkû zêdetir wek “*firewandinî gencîney danûstanî fêrxwaz, firerengandinî karkirdekî*” seyr bikirêt (Baynham 1993, p5). Wate fêrxwaz debêt dine bidirên nek تنها bo peredan be corî cudawazî ziman, hem nûsîn û hem axaftin, belkû debêt le pena eweşda agayî derbarey behay tomarî corawcorîş peyda biken. Debêt “*agayî zimanekî*” peyda biken, agayîyek derbarey çonetî çerxanî ziman û derbarey çonetî çerxanî şêwezarî corawcor le civakda (Garcia, Skutnabb-Kangas & Torres-Guzman 2006).

Ogulnick (2006) cexit dexate ser peredan be agayîyekî zimanekî ke pey berêt bewey ziman çon be şêweyekî nadêmokratane bekar dêt be mebestî helawêrdin û derkinarkirdin, herweha çon bekar dêt be mebestî hawamêzandin<sup>107</sup> û parastinî mafî mirovkar. Şikandinî nimirey matematîk le fêrxwazêk zimanî swêdîy lay dûhem zimane û lêkdanewey nadirust le pirsiyarî nûsiraw dekat, yan biryardan leser ewey zarokî weha nezane yan gewce bes leber ewey zimanzanîy ew rêk nayet letek çawenorîy mamosta û fêrge le zimanzanî, nimûnen le bekarhênanî nadêmokrataney ziman. Nimûneş le zimanêkî amêzgîr eweye zimanî dîkey cuda le zimanî ferimîy xwêndin lay fêrxwazî fireziman, le bestênî xwêndinda behend bigîrêt, wek ewey le tojînewekey Helot & Young (2006) pêşan dedirêt ke sûd le dayikûbab werdegirin bo xuyakirdinî ew core zanyaney fêrxwaz heyane.

SFL delêt ziman hemîşe le bestênda, le “*bestênî civakî*” da bûnî heye. Em bestêne civakîye birîtîye lew boçûn û çawenorîyaney ême le yekdîman heye. Bo nimûne çon silaw le yekdî dekeyn, mirov katêk le derewe tûşî yekdî debin bas le çî deken yan naken, çon zarok le zaroxane dadenêyn yan werdegirînewe, yan dariştinî destpêk û kotay nameyekî kesekî çon debêt. Zarokî biçûk le berayî temenewe beşdarî bestênî corawcor debin û lewanda pêwîstî be zimane bo rakêşanî serinc, cilewkêşî geme, hawamêzandin yan deramêzandnî<sup>108</sup> kesanî dîke, derbirînî pêwîstî, hest û xwast û herweha bo têgeyîştinî agadarî. Le guzeranî xoyanda zarok berdewam xerîkî bênewbere û dariştinewey ew çawenorîye ferhengî û zimanekîyen.

<sup>107</sup> Hawamêzandin: inclusion, helsûkewtêk bo le amêzgirtinî beranber. Cêkirdnewe û leserkirdin.

<sup>108</sup> Deramêzandin: exclusion, helsûkewtêk bo le derhawêştinî beranber. Derkinarxistin.

Le nêw SLF-da mirov bestênî dox le derawî sê hokarewe temaşa dekat: “*babet*”,<sup>109</sup> “*layan*”<sup>110</sup> û “*bar*”:<sup>111</sup>

- Buwar: bas le buwar û nêwerkî babetî danûstaneke dekat, babetî nûsyareke, karûbareke.
- Layen: bas le beşdarbûwanî karlêk dekat, bo nimûne nûser/xwêner, axêwer/bîser.
- Bar: bas le şêwazî danûstaneke dekat, gutare yan nûsyar, nexşî ew karlêke û şêwezarî danûstaneke.

Wêkira, em sê hokare, debine pêkhênerî ew “*tomar*” ey dête bekarhênan. Zarak seretay fêrbûnî yekem zimanî xoyan, fêrî ew tomare rojaneye debin ke lew bestênedada birewî heye û fêr debin bas lewe biken “*êsta û lêre*” da bûnî heye. Zarak fêr debin amaje be babetêk biken le dewrûberî xoyanda hebêt û rûy dabêt. Lem “*tomarî rojane*” -yeda axêweran yekdî debînin û axaftin be zimanî ceste û derbirînî rûxsar pir dekirêtewe. Lêreda bas le babetêk dekirêt hem axêwer û hem bîser deybînin: “*ewe kewt*”.

Ger zarak bas le babetêk bikat zûtir yan le cêyekî dîke rûy dabêt, “*ewsa û lewê*” rûy dabêt û bîser agadarî nebûbêt, ewsa gutey axêwer debêt wîrdtir û pitir patewpat bêt: “*topeke le kursîyeke berbowe*”. Wate zarak dekwête ser polênkirdin û ravekirdinî ewey tûşî xoy bûwe. Car heye zarak twanay ewey nîye agadarîyê hênde tewaw bidat ke bîserî naaşina be babeteke, têbigat. Maweyek dexayênêt ewca zarak ew twanaye peyda dekat ravekey weha bêt mindalî naaşinay babet têbigeyênêt.

Peredan bem twanay xoderbirîney pitir wird û derheste,<sup>112</sup> katî dewêt. Zarak le hengawî yekemda pêwîstî heye bewey riwangey bîser bizanêt bo ewey bizanêt kame agadarîyê girînge pêşkeş bikirêt, le hengawî dûhemîşda debêt pere be zimanzanîyê xoy bidat bo derbirînî ew agadarîye. Pauline Gibbons (2006) le bestênî fêrkarîyewe nimûne dehênêtewe derbarey em firajûtinî zimane rûwew derbirînî wird û pitir patewpatî babet:

- Temaşa, ewe weha dekat bicûlên! Ewane gîr nabin.
- Boman derkewt magnêteke derzîyekanî girt.
- Ezimûnekeman pêşanî da ke magnêt beşêk le mêtalekan kêş dekat.
- Kêşî magnêtkar tenha le nêwan babetî feromagnêtda<sup>113</sup> peyda debêt.

(Gibbons 2006, p20)

<sup>109</sup> Buwar: field, yekêke le sê hokar ke le riwangey zimanewanîyê SLF da, karîgerî heye leser ziman. Mebest le “*babet*” lêreda ew babet û nêwerokeye ke axaftin û nûsîn lêy dedûwên. Bo dû hokarekey dîke biriwane “*layan*” û “*bar*”.

<sup>110</sup> Layen: tenor, yekêke le sê hokar ke le riwangey zimanewanîyê SLF da, karîgerî heye leser ziman. Mebest le “*layan*” lêreda kesanî beşdarin le danûstanda, peywendî nêwanyan û mebestyane lew danûstane. Bo dû hokarekey dîke biriwane “*buwar*” û “*bar*”.

<sup>111</sup> Bar: mode, yekêke le sê hokar ke le riwangey zimanewanîyê SLF da, karîgerî heye leser ziman. Mebest le “*bar*” lêreda destawêjî danûstanekeye: nûsîne, giftûgoye, şêwazî danûstane... htd. Bo dû hokarekey dîke biriwane “*buwar*” û “*layan*”.

<sup>112</sup> Derhest: abstract, (abstrakt), mcaz. Derhestandin: abstraction. Bo pêçewanekey biriwane *berhest*.

<sup>113</sup> Feromagnêtîzim: ferromagnetism.

Nimûney kota le zanyaristanêkewe<sup>114</sup> wergîrawe bo berawird, ewaney dîke ragiwasten le tojînewey bekarhênanî ziman le xwêndinî babetî magnêt, le waney siruştasî<sup>115</sup>-da. Le nimûney yekemda, zimaneke doxbende, (ewe, ewane). Lewey dûhemda fêrxwaz bo mamosta deaxfêt (magnêt, derzî) û zimaneke wirtire. Le nimûney sêhemda, ke raportêkî nûsirawe, fêrxwaz encamgîrî daderêjin. Le gişt ew nimûnaneda her yek “kaye” ye, belam peywendîyeke ferimîtir debêt û zimaneke pitir rû le zimanî nûsîn dekat.

Gibbons pêşanî dedat ke mamosta çon le rêy dariştinî wanewe, ezimûnewe, giftûgo û raportî nûsiraw, yarretîy fêrxwazekanî xoy dekat helkişên le “*tomarî rojane*” we (yekem xal) bo “*tomarî zanyarbêj*” (xalî dûhem û sêhem).

Baseke pêşanî dedat çend girînge fêrxwaz bedewam bêt Leser peredan be zimanî xoy le serû ew binaxeyey heyetî û eme gişt fêrxwazan degirêtewe. Leweş bitirazêt pêşanî dedat ke mamostayanî zaroxane û fêrge debêt be taybetî serinc bidene pêwîstîyekanî ew fêrxwazaney serbe zimanî dîken, wate pêwîstîy ew fêrxwazaney be binaxeyekî dîkey zimanewe dêne zaroxane û fêrge, emane hêştta ew swêdîye nazanin ke fêrxwazî dîkey takzimanî hawtemenyan le polda deyzanin.

Em fêrxwazane bo fêrbûnî ziman û zanyar tûşî berokgîrîy taybet deben. Bo derikkirdinî em diyardeye bîr le fêrxwazêk bikewe taze hatote Swêd û bo yekem car seretay salî xwêndin le polda tûşî zimanî swêdî debêt. Ême pêman waye fêrxwaz, le temenî heft salanda, katêk dête polî yekem heştêzar ta dehezta wişe be yekem zimanî xoy dezanêt. Begîştî emeye mindal lew temenda deyzanêt. Ewca em fêrxwaze debêt le fêrge fêrî zimanî swêdî bêt. Kewate em fêrxwaze debêt xoy fêrî hem binaxey zimaneke, wate “*tomarî rojane*”, bikat û hem “*tomarî zanyarbêj*” ke dekatewe zimanî fêrge û zanyar. Fêrxwazanî dîkey takzimanî swêdî dawestaw nîn, ewanîş be berdeyamî pere be zimanî xoyan deden. Begîştî weha bawe ke fêrxwaz salane le fêrge fêrî yekhezta ta dûhezta wişey niwê debêt. Lêreda xuya debêt berokgîrîyekey fêrxwazî serbe zimanî dîke çend gewreye. Ew pêwîstîye rûntirîş aşkira debêt ger bîr leweş bikeynewe ke em fêrxwaze debêt em zimaney swêdîyey fêr debêt, wek amrazêk bekar bihênêt bo fêrbûnî babetekanî xwêndin.

### **Firajûtinî firezimanekî le zaroxane û fêrgeda**

Tojeran çawdêrîy zarokî nêw barudoxî wêkiçû kirdûwe û delên nêzîkey yek ta dû salî dewêt bo ewey zarok le temenî fêrgeda fêrî zimanî binaxe bibin, belam fêrbûnî tomarî zanyarbêjî fêrge be astêkî nêzîk lewey fêrxwazanî dîkey takziman deyzanin, çîwar ta de salî gereke. Tojînewey Wayne Thomas & Virginia Collier (1997, 2002) pêşanî dawê ke tenanet ew fêrxwazaney lanîkem çîwar salyan be yekem ziman xwêndûwe, ca le welatî xoyan bêt yan le rêy xwêndinî cûtzimanewe le welate tazeke, twanîwyane paş çîwar sal bigene astêk berberawird bêt letek hawpolî takzimanda. Tojeran boyan derkewt ke ew hokarey gewretirîn karîgerîy heye Leser dirêjîy ew mewdayey pêwîste bo geyîştin be astêkî zanîni dûhem ziman ke guncawî temen bêt, birî ew xwêndineye ke yekem ziman werî degirêt. Em tojerane aşkiraşî deken ke grûpî here gewrey dekewine ber metirsî ewanen ke le temenî pênc heta heşt salanda dêne welatî taze û çî xwêndinêkiyan be yekem ziman bo terxan nîye.

Em barudoxe le zor şiwênî em cîhaneda peydaye û şewazî rêkxistinî xwêndinî fêrge bo fêrxwazî fireziman zorin. Baker (2001) bas le bernamey hemecor dekat bo fêrxwazî fireziman û dabeşyan

<sup>114</sup> Zanyaristan: encyclopedia, biriwane Celîzade, “*Zarawesazîy pêwane*”.

<sup>115</sup> Siruştasî: zanist.

dekat beser şêwazî sûdbexş û kemtir sûdbexş bo firezimanetî. Şêwaze sûdbexşekan “firesewadî”,<sup>116</sup> sewadîy fireziman-îş degirêtewe. Le nêw şêwaze sûdbexşekanî Baker delêt bo helûmercî Swêd dest deden birîtîn le “*bernamey yekirêçke*” û “*bernamey dûrêçke*”. Lew dû bernameyeda, fêrxwazî serbe zimanî dîke be dirêjayî salanî fêrge, hem be zimanî dayikza û hem be zimanî dûhem, xwêndinî heye. Bernamey dûrêçke bo ew fêrxwazaneye ke dû zimanî dayikzay cudawazyan heye. Emane be dirêjayî salanî fêrge be herdû zimaneye xwêndinyan heye. Amancî xwêndin bem dû core bernameye firezimanîy çalake û xwêndine be herdû ziman. Le bernamey dûrêçkeda, em amance ew fêrxwazaneş degirête ke xelkî welateken û takzimanin.

Ew bernamaney Baker (2001) pêy waye sûdyan kemtîre bo firezimanî, ewanen firezimanîyekî bertesk encam dehênin. Şêwazekanî Baker pêy waye guncawî Swêdin birîtîn le: “*zimanxinkên*”,<sup>117</sup> “*kişanewe*”<sup>118</sup> û “*derbaz*”.<sup>119</sup> Çemikî “*zimanxinkên*” bo bernameyeye fêrxwazî zimanêkî derekî dexate polêkewe fêrxwazanî serbe zimanî ferimî xwêndineke bêt, bo nimûne fêrxwazêkî taze koçhên rastewxo bixeyte polêkî swêdîyewe. Çemikî “*zimanxinkên*” amajeye bew doxe zor nalebarey ew fêrxwaze têy dekewêt û herweha ew derhawêşte here bedey heye bo fêrxwazeke.

*[“Zimanxinkên” submersion- cudaye le “zimanimorên” – (ziman morkirdin) immersion - ew bernameyey bo nimûne le welatî Kanada piyade dekirêt û fêrxwaz serbe zimanî zorîne dexirêne nêw polî fêrxwazanî serbe zimanî kemîne: le Kanada debête çandinî fêrxwazî îngilîzîziman le polî fêrxwazanî fransîziman. Rêk em peywendîy zorîne karîgerîy mezinî heye Leser firajûtinî ziman].*

Çemikî “*kişanewe*” bo bernameyeye, wek “*zimanxinkên*” fêrxwaz rastewxo dexate polî takzimanewe belam fêrxwazeke çend kajêrêk lew pole dadebirêt bo ewey “*dûhem ziman*” bixwênêt, ke lêreda dekatewe zimanî swêdî. Ewca bo ewey em bernameye be “*kişanewe*” bête jimardin ewa debêt mamostay dûhem ziman xwêndinî lebarî hebêt, wate twanay tewawî hebêt derbarey mercekanî xwêndin bo fêrxwazî serbe zimanî dîke.

Bernamey “*derbaz*” le destpêkewe fêrxwaz be yekem zimanî xoy dexwênêt û hawkat fêrî dûhem ziman dekirêt. Paşan wirde wirde xwêndinî dûhem zimaneye ziyad dekat û beşewanekanî yekem ziman kem dekirênewe û le kotada namênin. Le Swêd bo nimûne, fêrxwazêkî erebîziman xwêndinî xoy be erebî debêt û fêrbûnî zimanî swêdîşî terîb debêt. Wirde wirde bedem helkişanî ew fêrxwaze le zimanî swêdîda, wanekanî debine swêdî. Kewate amanc lêreda geşey zimanî swêdîye belam zimanî dayikza wek yarîder bo em firajûtine bekar dehnêrêt. Zor le pole “*fînî - swêdî*” yekanî zemanî zûtir lem babete bûn.

Baker ew bernamaney cuda dekatewe ke têyanda xwêndinî babet [wek: matematîk, civaknasî...] û xwêndinî ziman têhelkêş dekirên. Bername heye xwêndinî babet hemwar dekat be zimanî dayikza bo ewey fêrxwazî serbe zimanî dîke baştir bitwanin firay waney babet bikewin. Lem core bernamaneda waney dûhem zimanîş wek yarîder bekar dehênêrêt bo waney babet, bewey basî ew “*babete*” têhelkêşî waney zimaneye dekirêt.

<sup>116</sup> Firesewadî: biliteracy, sewad be çend zimanêk.

<sup>117</sup> Zimanxinkên: submersion.

<sup>118</sup> Kişanewe: pullout.

<sup>119</sup> Derbaz: transitional.

Tojînewe corawcorî zorin bo peydozîy ew modêlaney baştirîn sûd debexşin be fêrxwazî serbe zimanî dîke. Tojînewey salanî zû çend kêşeyekiyan heye, bo nimûne ew deme baw nebû hokarî civakî - abûrî behend bigîrên, hokarî wek astî xwêndinî dayikûbab, astî civakîy xêzan, nawçey nîşîmen û doxî fêrge. Leweş bitirazêt tojînewekan tenha le maweyekî kurtda encam dediran û leber eweş nedekira wêney proseyekî dirêjmewda bibînîn ke firajûtinî ziman daway dekat.

Ew tojîneweyey Thomas & Collier le nêwan 1985-2001 xerîkî bûn karîgerîyekî gewrey peyda kird leser dunyay tojînewe derbarey sazimanî xwêndin bo fêrxwazî fireziman (1997, 2002). Pitir le çiludû hezar fêrxwazî Amerîka be dirêjayî temenî xwêndinyan, polî yekem heta dûwazdehem, lem tojîneweda bûn. Zimanî dayikzay zorî ew fêrxwazane spanî bû. Fêrxwazanî tojîneweke dabeş kirabûn beser bernamey cudawazda û bernamekan le fêrgey cudawaz be astêkî beriz piyade dekiran û mamostakanîşyan xwêndinî pêwîstyan hebû.

Fêrxwazan be dirêjayî mawey xwêndinyan têtî corawcor dekiran û encamekanîş berawird dekiran be encamî fêrxwazî dîkey takzimanî îngilîzî. Encamekanî ew tojîneweye be rûnî pêşanî dedat ke dû xal zor girîngin: piştîwanîy behêz le xwêndinî zimanî dayikza û awêzanî xwêndinî babet letek xwêndinî dûhem ziman.

Tojîneweke pêşanî dedat ke serkewtinî fêrxwaz le xwêndinda tewaw bertawî corî bernamey piyadekirawe. Gişt bernamekan le sê salî yekemda encamî başyan heye, wate bo ew fêrxwaziney destpêkiyan le astêkî zor nizimdaye, lew demeda ke hêşta îngilîzî baş nazanin, pêşkewtinyan xêraye. Eweş diyardeyekî siruştîye çunke emane xerîkî fêrbûnî îngilîzîyekin le astî bineretîda, emeş astêkî zimane ewan le mêje têyda zalin le zimanî dayikzay xoyanda, ke zimanî spanîye.

Paşan aşkira debêt ke fêrxwazî gişt bername lawazekan, le nêzîkey çiwahem salewe, firajûtinyan xawtir debêtewe. Mamostay azmûde dezanin ke le salî çiwaremde mercekan sextitir debin, nek tenha leser twanay xwêndin û nûsîn belkû begîştî leser zimanzanî.

Xwêndin le salanî berayî fêrgeda begîştî berhest û kirdekîye, boye fêrxwazî ke hêşta zimanî xwêndinî le astî binaxedaye detwanêt taradeyekî baş pêbepêy ewaney dîke helkişêt. Em grafey deybînin be rûnî ew derkinarkirdine pêşan dedat ke zor car le çiwarem salewe dest pêdekat. Katêk fêrxwaz le sîstemî fêrkarîda pitir heldekişên, ewca cudawazîy geşey fêrxwaz be cudawazîy bernamekan rûn debêtewe. Wek zor tojînewewey dîke, lêreşda debînîn kêşekan le perînewe bo çiwarem sal tîj debinewe.


Tenha dû bername sûdbexşeken, wate ew dûwaney ke be dirêjayî salanî xwêndin yarmetîy zimanî dayikza deden, wehan ke berhemî fêrxwaz hawşanî hawpole takzimane îngilîzîyeke bêt le salî dûwazdehemda.

Cêy serinc eweye ke fêrxwazanî beşdar le bernamey “dûrêçke” da, wate ew bernameyey têyda be dirêjayî salanî fêrge, xwêndinî gişt fêrxwazan be herdû zimanî îngilîzî û spanî bû, berhemyan tewaw beriztir bû le têkiray astî ew fêrxwazaney takziman bûn le polî dûwazdeda.

Kewate em tojîneweye piştîwanêkî behêze bo sengî zimanî dayikza. Cige leweş Thomas & Collier cexit deken leser twanay fêrge bo dabînkirdinî jîngeyekî yarîder le rûy ferhengî - civakîyewe bo fêrxwazî serbe zimanî dîke. Ewca cexitîş dexene ser astî corayetîy xwêndineke, ke fêrxwazî serbe zimanî dîke nabêt perawêz bixirên belkû têhelkêş bikirên û pêwîstîy hizirî, akadêmî û zimanekîy fêrxwaz rêber bêt.

Tojeran eweş pêşan deden ke ew fêrxwazaney le layen dayikûbabewe le xwêndinî firezimanekî derdehênrên û dexirêne ber xwêndinî zimanî zorînewe, be endazeyekî berçaw berhemyan

dadebezêt. Emyan pêdagirî deken Leser ewey bernamey “dû-zimanekî” bo ewey berhemhên bê, debêt lanîkem zêdetir le pênc - şeş sal dewmedar bê. Bernameyek tenha dû-sê sal dewamey hebêt, karîgerîy sinûrdare.



English Learners’ Long-Term K-12 Achievement in Normal Curve Equivalent (NCE) on Standardized Tests in English Reading Compared across Seven Program Models.

(Results aggregated from a series of longitudinal studies of well-implemented, mature programs in five school districts and in California from 1998-2000)

- Program 1: Two-way developmental bilingual education (BE), including Content ESL
- Program 2: One-way developmental BE, including ESL taught through academic content
- Program 3: Transitional BE, including ESL taught through academic content
- Program 4: Transitional BE, including ESL, both taught traditionally
- Program 5: ESL taught through academic content using current approaches with no L1 use
- Program 6: ESL pullout - taught traditionally
- Program 7: Proposition 227 in California (sequential 2-year cohorts, spring 1998-spring 2000)

Copyright © 2001, Wayne P. Thomas & Virginia P. Collier

## Pajî pêncem: Tomarî akadêmîy zanyarbêj

Zarok her le zaroxanewe pêwîstî heye be derfet bo firajûtînî ziman bo ravekirdinî basî sext, bo çareserî kêşe û bo derbirînî aloz. Ewca bo peredan be agayî derbarey ew core zimaney le fêrgeda dête bekarhênan û bo peredan bew zanyarey dewrûber çawenore mirov bîzanêt, girînge zarok ew zimane fêrbêt ke amraze bo derbirînî ew zanyare. Em firajûtine debêt her le seretay zaroxanewe bikewête kar. Kewate mamostayanî zaroxaneş le dariştinî planî karûbarî xoyanda, debêt agayîyan hebêt derbarey firajûtînî zimanî zarok.

Fêrxwaz le waney siruştasîda, cige le têgeyîştin û bekarhênanî ew çemik û destewajaney taybetin be buwarî em zaniste, debêt têşbigat zanyar lem *bestêne zimanekîyeda*, lem “*dîskors*”<sup>120</sup>-eda, çon dête dariştin. Firajûtînî ew zanyaraney debine beşêk le pêkhatay kayey civknasî, bo nimûne dîn û mêjû, dawa le fêrxwaz dekar ew peyv, çemik û dariştine bizanin ke pêwîste bo helbestinî zanyar lem buwareda. Deşêt bas le zimanzanîy weha bêt ke le waney civaknasîda bekardehênrên, bo nimûne gutûbêj, giftûgo, belgekarî, ragiwastin û berawird... htd.

Ziman û zanyar tewaw awêtey yekdîn, boye mamosta bedem planrêjîy babetêkî taybetewe, debêt rûkarî zimanîş lew planrêjîyeda bixwênêtewe. Wate xwêndinî ziman debestirêtewe be nêwerokêkî resenewe.<sup>121</sup> Lêreda çon geşey zanyar sûdmend debêt be têhelkêşkirdinî rûkarî zimanekî, “geşey ziman” îş sûdmend debêt bewey girê dedirêt be nêwerokêkî watadarewe. Leber eweye naşêt peredan be zimanî swêdî be tenha bixeyne estoy mamostay zimanî swêdî, belkû debêt gişt mamostayanî zaroxane û fêrge agayîyan hebêt derbarey rûkare zimanekîyekanî firajûtînî zanyar. Ke dête ser fêrxwazî serbe zimanî dîke, ke hêşta le zimanî swêdîda negeyîştûnete astêkî guncaw bo ew temeney xoyan, girînge serleberî rojî fêrgeyan firajûtînî zimanî têdabêt û derfet birexsênêt bo rahêzanî zimanekeyan. Ger bo firajûtînî swêdî tenha rewaney lay mamostay zimanî swêdî bikirên, ewa helkişanyan maweyekî yekcar dirêjî dewêt. Serincgîrî le ziman, le gişt waneyekda, girînge bo ewey fêrxwazî serbe zimanî dîke baştirîn derfetî hebêt bo fêrbûnî hem ziman û hem babet. Kewate gişt mamostayanî zaroxane û fêrge debêt zanistî bineretîyan hebêt derbarey norey ziman le prosey fêrbûnda, derbarey fêrbûnî zimanî dîke û herweha derbarey fêrbûnî babetêk be zimanekî dîke ke hêşta tewaw lay fêrxwaz firajî nîye. Ger mamosta zana nebêt bew helûmerce taybetaney fêrxwazî serbe zimanî dîke heyetî, ewa metirsîy peyda debêt lewey fêrxwaz bo fêrbûnî sewad ke zanistî binemaye, tûşî kêşey weha bêt, paşan çareseryan dijwar bêt.

Pauline Gibbons (2006) cexit dexate ser norey mamosta bo helbestinî “pird” le nêwan zimanî rojaney malewe û “tomarî zanyarbêj” î helkişawtirî fêrge. Mary J Schleppegrell (2004) firajûtînî zimanî fêrxwaz le salanî fêrgeda be firajûtînêk rave dekar le bestênî sakarewe bo bestênî zanko. Inger Lindberg (2004) delêt em firajûtine rewteke le giftûgo derbarey gorînewe kalawe, *êsta û lêre*, bo gorînewey agadarî (information), *ewsa û lewê*, le dîskorsî stûnbarî rojanewe bo dîskorsî asobarîy fêrkarîyewe.

<sup>120</sup> Dîskors: discourse, bestênî zimanekî, axaftin yan danûstanêk, zanyarêkî taybet bigirête xo, le her corêk bêt.

<sup>121</sup> Resen: authentic, dirust, pêçewaney xeyalkird, helbestiraw... htd.



## Diyardey zimanekî le zimanî fêrgeda

Ew cudakarîyey Åke Viberg (1993) hênaye berbas le nêwan jêrxan û jûrxanî zimanda, deşê bibête sinûrî nêwan ew zimaney mirov çawenore fêrxwaz fêrî bûbin ber le destpêkî fêrge û ew zimaney mirov çawenore fêrxwaz le salanî fêrgeda fêrî bibin. Jêrxan be raveyekî sakar dekatewe ew zimaney zarok be zimanî dayikzay xoy le temenî pênc salanda deyzanêt. Jûrxanîş dekatewe ew zimaney fêrxwaz le salanî fêrgeda fêrî debêt. Lay zor kes em firajûtine paş fêrgeş be dirêjayî temen le rêy wîst û karî kesekîyewe dewamey heye.

Çemikekanî Jim Cummins (1979): “*zimanzanîy danûstên*” (BICS) û “*zimanzanîy zanyarbêj*” (CALP) ke le pajî çiwaremnda basî hat, be corî wêkiçû dêne bekarhênanî bo cudakirdinewey zimanzanîy corawcor. “*Zimanzanîy danûstên*” rêk amajeye bew zimaney mirov bekarî dehênêt le danûstanî zarekîy rojaneda. Belam “*zimanzanîy zanyarbêj*” basî le zanînekî pêwîste bo bekarhênanî ziman le bestênî pitir ferimîy wek bestênî fêrkarîy nêw fêrge. Rêk em “*zimanzanîy zanyarbêj*” -ye ke fêrbûnî katî zor dewêt (Cummins 2000, Thomas & Collier 2002) û lem pajeda cexitî leser dekirêt.

Girînge lebîrman bêt ke em cudakarîyane<sup>122</sup> helbesten, le rastîda zimanî firecor têhelkêşî yekdî debin. Boye rexne arastey Cummins heye delêt cudakarîy nêwan BICS û CALP zor sakare. Legel eweşda em cudakarîye sûdbexşe çunke pêşanî dedat fêrxwaz tûşî çî berokgîrîyekî zimanekî debin û çî twanayekî zimanekîyan pêwîste perey pê biden. Ewca bo ewey lebîrîşiman bêt ke em cudakarîye helbesteye, ewa dekirêt em dû core cudawaze bikeyne dû serperî yek zincîrebende:

Niwênerî serperêkiyan debête ew zimanî zarekîye ke be tundî girêdirawî doxêkî diyarîkirawe (bestênbend) û zor car zimanî cestey têhelkêş dekirêt, bo nimûne:

- yekem: temaşa!
- dûhem: zor başe!


Niwênerî serperey dûhem debête zimanî nûsyarî ferimî, bo nimûne zanistnameyekî akadêmî (tojname - namey tojînewe).

Bo ravekirdinî cudawazîy nêwan ew dû core zimane Cummins (1996, 2000) modêlêkî dariştûwe dû tewerî heye: tewerî piley “bestênbendetî” û tewerî piley “dijwarîy zanyarbêjetî”.

Zimanfêrbûn le goşey desteçepî xwarewe, buwarî A, dest pêdekat. Emyan dekatewe “*tomarî zimanekey rojane*”. Armanç geyîştine be goşey desterastî serewe, be buwarî D, ke dekatewe “*tomarî zimanekey zanyarbêj*”, ke pêşî degutirêt “*tomarî akadêmî*”. Em zimaneyan hem zanyarbêje û hem bestênreha, wate mirov bas le babetêk dekat ke le zeman û zemînekî dîkeda rûy dawwe, ewey deşê be destewajey “*ewsa û lewê*” bête derbirîn.

---

<sup>122</sup> Cudakarî: distiction.



Deysa çîn adgarekanî em “tomare zanyarbêjey fêrge” û em zimane akadêmîye? “Xiştêy cudakarîy nêwan jêrxanî zimanekî û jûrxanî zimanekî” pêşanî dedat em tomare cige le nûsîn, zimanî derbirînîşe le gutarî ferimî. Em tomare normî nûsîn dekate binema û zor car têkstî nûsiraw lexo degirêt. Emyan leber ewey zimanî monolog (tak axêwer)-e û bersivî destubird le lay armanc nîye, mercî girantirî lesere ke derbirînî zor wîrd û dirust bêt û herweha rageyenî agadarîy pêwîst bêt. Rûnî û dirustî dû behay zor sengînin le zimanî fêrge. Mary J. Schleppegrell (2001, 2004) cudawazîy *ferhengî*<sup>123</sup> û *rêzimanekî*<sup>124</sup> (cyawazîy serbe ferheng ((wişedan)) û rêziman) le nêw karlêkî zarekî û zimanî rojane le layek, û zimanî fêrge, tomarî zimanekîy zanyarbêj, tomarî akadêmî, le layekî dîke pêşan dedat. “Xiştêy cudawazîy nêwan karlêkî zarekî û zimanî fêrge” beşêk lew cudawazîyaney ziman pêşan dedat ke Schleppegrell amajeyan pê dedat.

Pêşkeşkirdinî zanistî fêrge debêt be şêweyekî çust nêwerokî basêk bidate xwêner û bîserêkî rastewxo ke bertekî nîye. Emeş debête hokar bo ewey çend adgarêkî zimanekî repêş bixirên. Leber ewey nûsîn natwanêt pena berête ber zimanî ceste, rûxsar û diyardey dîkey zimanbeder, zimanî zanyarbêj pena bo amraz dîke debat bo derbirîn le hevbendîy lojîkane. Yek lew amrazane pilebendîy risteye, ke têyda şariste, pariste û nawaxin rêk dexirên. Em hunereş pêwîstî be hevgirî<sup>125</sup> pitir taybet heye, wek: “behoy”, “çunke”, “le rêy”, “wêray” û ewca awelkarî xawen watay pitir wîrd, bo nimûne: “bem şêwaze”, “gerçî”, “keçî”, “belam”. Le zimanî berayî temenî zarokda ke nêzîke le zimanî rojaney diyalogbarewe, hevgirî wek: “û”, “paşan”, “ewsa” bawin û ristekanî bedûwa yekdîda zincîre debestin bê ewey şariste û paristey rûnî têda bêt.

<sup>123</sup> Ferheng: lexicon, wişedan, ferhengî: lexical.

<sup>124</sup> Rêziman: grammar, rêzimanekî: gramatical.

<sup>125</sup> Hevgir: conjunction, amrazî pêwendî, hevgir, biriwane *Saladin's English-Kurdish Dictionary*.

Xiştey cudakarîy nêwan jêrxanî zimanekî û jûrxanî zimanekî		
	Jêrxanî zimanekî (zimanzanîy danûstên)	Jûrxanî zimanekî (zimanzanîy zanyarbêj)
<i>Field</i> (buwar, karûbar, ewe mebestey dête rageyandin)	Barudoxî rojane, bestênî naferimî, nêw mal û xêzan, le dewrûber, bernamey radyo û televîzyonî serbe xêzan, buwarî blog û çatî internêt, îmeyl... htd	Barudoxî saxtarbend û bestênî ferimîy wek fêrge, kilêse, civînî ferimîy saziman, bestênî bîrokratî, saxlemî. Carîş heye rêwresimî taybet, marebestin, morandinî zarok, bênewberî dadge.
<i>Tenor</i> (layan, beşdarbûwan)	Xêzan, xizm, yar û yawer	Kesanêkî le bestênêkî pitir ferimîda yek degirinewe, wek mamosta û fêrxwaz, pizîşk û nexoş, keşîş û endam baziney dînî. Carîş heye bebê peywendîy rastewxo, wek: nûser û xwêner, mêdyakar û bîser/bîner.
<i>Mode</i> (bar, şewazî danûstan: nûsîn yan gutar)	Begiştî axaftine, belam nûsînîş heta dêt ziyad debêt, wek kurtepeyam, çat... wirde axaftinî diyalogbar	Begiştî nûsîne belam carîş heye gutarî ferimîy wek wanebêjî, semînar û gutarî radyo û televîzyon. Monologbar.
Şewezar	Normî nastandard, zarawe, lazarî civakî û şewezarî dîke bawe. Le nûsînda zor car kurtkirawe, wêne û hêma têkel dekirên	Zimanî standard bawe, le Swêd zimanî swêdî yan îngilîziye
	Zor car ristey natewawî heye	Ristey pir û ristesazîy helkişîw, şariste û paristey firenkom
	Wişey xawen watay firewan	Çemikî xawen watay diyarîkiraw
	Kar le risteda rageyenî beşêkî zorî wataye	Destewajey helkişîwî navekî
	Diyardey zimanbeder, wek: zimanî ceste û rûxsar, sakarandin	Şewazî weşanî agadarî, dariştinî patewpat, ravey wirdekar
Nexşî karlêkkirdin	Diyalog - Karlêk bertawî hokare "civakî-ferhengî" -yekane	Monolog
	Hest û layenî kesekî dêne derbirîn	Ravey babetekî, bêlayan û dirust bawe
	Zor car fîdbakî demudest, agadarîy ziyadey nîye, betaybetî le swêdîda dirêjdadirîn bawî nîye	Agadarîy firepat, wate agadarîy zêde, bawe çunke buwarî fîdbak nîye
Cudakarîy nêwan jêrxanî zimanekî û jûrxanî zimanekî - kotay xişte		

Xiştey cudawazîy nêwan karlêkî zarekî û zimanî fêrge		
	Karlêkî zarekî	Zimanî fêrge
Nîşane	Diyalog	Monolog
	Agadarîy şaş, wate mewday nêwan wişey agadarîbexş şaş	Agadarîy sift, mewday nêwan wişey agadarîbexş sifte
	Peywendîy lojîkane be diyardey zimanbeder, dêne derbirîn, bo nimûne awazî ziman	Peywendîy lojîkane be rûnî û le rêy wişe û rêzimanewe, dêne derbirîn
Ferheng (wişedan)	Çemikî giştî, wişey xawen watay berfirewan, wek "mirov" û "xelk" lebirî diyarîkirdinî kesî mebest.	Çemikî taybetî diyarîkiraw
	Jimarey "kar" zore le risteda	Jimarey "naw" zore le risteda
	"kar" lêreda bas le kirdewe dekat: baz bide, ra bike, yarî bike	"kar" lêreda pitir serbe rêzimanewe, wek: heye, heyetî, debêt, deçerxêt, rû dedat
	Cênaw karaye, wek: Ew yarî dekat	Wişey ferhengî karaye: Kureke yarî dekat
Rêziman	Saxtarî riste birîtiye le "zincîresazî" (chining), wate riste be yarmetîy "hevgir" î wek: "û" têk debestirên û ewca le rêy tonî dengewe saxtarî guteke rêk dexirêt	<i>Paristesazî</i> (bekarhênanî pariste, ristey "peywestî naçarekî" (restrictive relative clause) zor car le şêwey destewajey navekîda)  Saxtarêkî heremî, sereta bîrokeyek pêşkeş dekirêt û paşan ew bîrokeye wek mijarêk le risteyekî dîkeda û be destewajeyekî navekî be agadarîy dîkewe dêtewe berbas
	Zor car <i>hevgir</i> dête sereta, wek: û, paşan, ewca	<i>Hevgir</i> kemtirin belam firecortirin Peywendîyekan be rûnî dêne rageyandin
	Nîhad be rûnî dête derbirîn	<i>Navekiyandin</i> bo derbazbûn le derbirînî layenî kar, bo nimûne "dahênanî telefon lelayen Bell ewe", lebirî "telefon lelayen Bell ewe dahênira".
	Peywendîy lojîkane le rêy "ahengî ton" (intonation) ewe dête derbirîn	Peywendîy lojîkane be saxtarî navekî (nominal) û karekî (verbal) dête derbirîn. Navekiyandin û firewandinî destewajey navekîy xawen agadarîyekî zor
Cyawazîy nêwan karlêkî zarekî û zimanî fêrge - kotay xişte.		

[bo em sê çemike “zincîresazî”<sup>126</sup> chining,, “peywestî naçarekî”<sup>127</sup> restrictive relative clause, navekiyandin<sup>128</sup> biriwane perawêzekanyan].

Schleppegrell (2001) ew adgare taybetey “zimanî fêrge” -yş bas dekat ke destpêk bîrokeyek pêşkeş dekirêt û paşan le destewajey dahatûda ew bîrokeye wek mijarêk,<sup>129</sup> wek “nîhad” le “destewajey navekî”<sup>130</sup> -î helkişîwda dêtewe pêş, ewca riste dûway riste agadarîy dîkey dexate pal. Em ragiwesteye le kitêbî civaknasîy polî şeşemewe dekeme nimûne:

*“To xot û herçî le dewrûberî toye le atom pêkhatûn. Atomîş pêkhatûwe le nawikêkî dewrediraw be bergêk le elektron. Hem nawik û hem elektron be kareba barkirawin”.*

Ristey yekem xwêner dekate mijarî serşar, “to”. Paşan bîrokeye wek peyamêk pêşkeş dekirêt, ewey debête kirokî têksteke, ke hemû şitêk birîtîye le atom. Le ristey dûhemda “atom”, bewey wek “nîhad”<sup>131</sup> berayî riste degirêt, debête mijar û emîş peyamêk, agadarîy niwê, bedûy xoyda dehênêt: “nawikêkî dewrediraw be bergêk le elektron”. Lêreda “peyam” ekeye be “destewajey navekî” -y helkişîw dête derbirîn. Paşan le ristey sêhemda, “nawik” û “elektron” mijarin, le şewey zanirawda wek nîhad û peyamêkî niwê le destewajeyekî guzarekîda<sup>132</sup> bedûy xoyda dehênêt: “be kareba barkirawin”. “Kar” ekanî em kopileye lew coren ke bas le kirdeweyekî çalak naken: “pêkhatûn”, “kirawin”.

Girînge le yadiman bêt ke em yan ew core zimane ne aloztire û ne karîgertire lewey dîke, belkû her yekeyan le bestênî xoyda karaye. Belam eger zarok le derewey fêrge peywendî be zimanî fêrgekarewe nebêt, lewaneye kêşe bête rêy. Baştirîn peredan be zimanzanî lem core, bekarhênanî zimanekeye le bestênêkda karkirdî rûn bêt.

Dîsan girînge le yadiman bêt ke bas le dû tomarî dabirawî zimanekeyî nîye, belkû bas le zincîrebendîye. Zarokî zaroxane û salanî berayî fêrge xoyan bem core zimane radehênin, le mamostay debîstin û le nûsînda deyxwêninewe, xoyişyan le astêkî bineretîyda bekarî dehênin. Ewca leber ewey fêrbûnî sewad girîngtirîn beşin le karî salanî yekemî fêrge, ewa girînge mamosta em beşey firajûtinî ziman be wirdî reçaş bigirin.

Fêrbûnî sewad tenha fêrbûnî teknîkî kodbest û kodkirdinewey têkst nîye, belkû be heman rade peredane be twanay nûsînî tomarî zanyarbêj. Berkewt letek têkstî edebî, hem le rêy xwêdinewey xo û hem le rêy giwêradêran bo xwêdinewey kesî dîke, ezimûn dedate zarokî biçûk derbarey zimanî monologbar. Ewca girîngîşe fêrxwaz kar letek têkstî zanistî corawcorîş biken, bo ewey fêrbin xoyişyan ziman lew babeteda berhem bihênin. Herweha kitêbî “fakt” îş bo mindalan girînge, hem zanistyan pê debexşet û hem derfetî nasînî ziman û têkstî ew buware.

<sup>126</sup> Zincîresazî: chining, wate têkbestinî riste be yarmetîy “hevgir”-î wek “û”.

<sup>127</sup> Ristey peywestî naçarekî: *restrictive, or defining, relative clause*, risteyeke naçare peywesteke pêşan bidat bo ewey gişt watakey rûn bêt, bo nimûne “ew amozayey em baştirîn peywendîy letek hebû, nîşteçey rojava bû”. Riste “peywestî xwastekî” *non-restrictive, non-defining relative clause* ewey ke peywesteke têyda ziyadeye û ger neşbêt wata lêl nakat, bo nimûne “gundekey xizmanî, ke em xoş xoş serdanî dekird, le rojava bû”.

<sup>128</sup> Navekiyandin: nominalization, gorînî kar, awelnaw, awelkar be naw, bo nimûne: *mergî jineke*, le birî: *jineke mird, tirsî mirov le tarîkî*, lebirî: *miro detirsêt le tarîkî*...

<sup>129</sup> Mijar: theme, têma, babet.

<sup>130</sup> Destewajey navekî: noun phrase or nominal phrase (np), destewajeyek, wate beşêkî riste, ke le rûy ristesazîyewe be “naw” dadenrêt. Deşet nawêkî karay tak bêt, bo nimûne: “kiçeke”, yan cênawêk bêt, bo nimûne “ew”, yan zincîreyek wişey ke nawêk têyda şawîşeye. Bo “navekî”, biriwane Celîzade, “Zarawesazîy pêwane”.

<sup>131</sup> Nîhad: subject, beşêkî risteye birîtîye le naw, awelnaw, cênaw, çawig... û guzarey pêwîste.

<sup>132</sup> Guzare: predicate, *destewajey guzarekî*: predicative expression. Beşî dûhemî risteye û guzare le nîhad dekat.

## Twanay tşkstkarî

Rêk em adgarî monologbare le zimanî zanyarbêjda mercî “*twanay tşkstkarî*” desepênêt, mebestîş lêy: twanay tşgeyiştin û derbirînî bîrî dirêjmewdaye hem be gutar û hem be nûsîn (biriwane pajî sêhem). Wate zanist derbarey rêkxistinî ziman le yekey dirêjmewdada bo ewey peyameke rageyen bêt lay wergir, zanist derbarey bekarhênanî peywendîy katbend<sup>133</sup> (wabestey kat: îsta/paşan, pêş êsta/paşan, paş êsta/paşan), peywendîy nêwan kesanî nêw baseke (şakes, lakes... htd), dariştinî tşkstî tşkbeste letek parastinî xalî serincgîr bo ragirtinî sûredawî mebest bo ewey mebestî girîng le tşkstekeda bizir nebêt.

Twanay tşkstkarî ew stratêjaneyîş degirêtewe ke mewda dexate nêwan axêwer û xudî baseke, stratêjî kesî sêhem lebirî kesî yekem bekar dehênêt û herweha stratêjî serbe amajedan û mijar. Şewazêkî baw bo amajedan be kesanî cudawazî nêw baseke, nasandinyane le berayî basekeda û paşan amajedane be naw yan şewey zanirawyan. Ewca bo amajey firepat dekirêt cênaw bekar bêt, carîş heye ger amajeke le tşkstekeda aşkira bêt, mirov xoy le amajedanî patewpat debûwêrêt. Emeş nimûne:

*Hebû nebû kiçêk hebû. Kiçeke nawî meryem bû. Meryem le baxekeda yarî dekird, le nakaw dengêkî bîst û tirs.*

Be boçûnî Lindberg (1995) zarok le temenî pênc - no salanda em twanaye peyda deken. Begîştî zarokî biçûk be “*ez - şewe*” û “*êsta*” deaxfin. Em diyardeye le nûsînî zarokanî zaroxane û salanî berayî fêrgeda aşkiraye. Paşan lewe derbaz debin bo astêkî têda kesî sêhem û katî raburdû bekar dehênin. Zarok, zor car heta radên, be kesî sêhem û demî raburdû bas dekenewe belam wirdewirde û begîştî naagayane, deçinewe lay kesî yekem û demî êsta.

Kewate zarok pêwîstî be rahênane leser “*saxtarî bêjandin*”, ravekirdin û girtinî “*riwangey derekî*”. Eweyiş her bawe ke giçke zarokî rahatû leser karlêkî diyalogbar, le tşkste berayîyekanî xoyanda zêderewî deken le bekarhênanî cênawda.

Em nimûneye le tojînewey Lindberg (1995) radegiwêzim bo rûnkirdinewey mebest:

*Erê pêm waye dayikî bû  
Ke lewê danîstibû  
Ewîş çawdêrîy mindalekey ewî dekird  
Paşan kurêk hat  
Û qsey legel kird  
Lindberg (1995, p49)*

Lêreda debîn tşksteke çon lêl û lêkdanewey dijwar debêt çunke cênaw amaje be kesêk dekat tewaw aşkira nîye.

---

<sup>133</sup> Katbend: temporal, wabestey kat: îsta/paşan, pêş êsta/paşan, paş êsta/paşan.

Wek basî hat, zarok le seretada demî êsta bekar dehênêt û paşan deperêtewe bo demî raburdû. Eme rêbazêke bo dabirînî axêwer le xudî baseke. Ewca zarok bo nûsîn le demî raburdûda, pêwîstyan be twanaye bo derbirîn le peywendîy katbend, ewey “paş ew deme” rûy da, “ayendey raburdû”,<sup>134</sup> bo nimûne: “paşan ew deba biçête rawemasî”, ewca ewey “pêş ew deme” rûy da, “raburdûy tewaw”,<sup>135</sup> bo nimûne: “çû bû bo rawemasî”. Biriwane em nimûne ciwane le nûsînî fêrxwazêkî polî sêhem, bas le rûdawêk dekat serbe demî raburdû, belam bo ravekirdinî basêkî “beserçû” kêşey heye (Wedin 2011):

*Min çûm bo fêrge. Paş şeş kajêr  
Min hatimewe mal. Ew lewê nemabû! Ew lêre nîye.  
Baram çû bo daristan.*

Nûser deba lêreda “raburdûy tewaw” bekar bihênêt û binûsêt: “baram çû bû bo daristan”. Em kêşeke bewe çare dekat ke le ristey pêşûda biçête demî êstewe: “ew lêre nîye” û paşan demî raburdû bekar bihênêt bo baskirdinî ewey zûtir rûy dabû: “baram çû bo daristan”.

Derbirîn le “ayende le demî beserçûda”, “ayendey raburdû” lay zarok sexte, pêwîstî heye be rahênan bo ewey zal bêt beser em baseda. Zarok pêwîstî be derfetî zorî rahênane bo baskirdinî rûdawî demî raburdû, pêwîstîşe be harîkarîye bo derbirînî peywendîy katbend.

Katêk mindal gewretir debin dekirêt têkst bikirête serşar bo dinedanî twanayan le dariştinî destewajey helkişîwî navekî, bo nimûne: “ew pişîle biçûkey leser mêzeke danîstibû” le birî tenha “pişîleke”, herweha destewajey serbe awelnaw. Bekarhênanî zimanêkî wirttir û pitir ravekar debête derfetêkî xorisk bo fêrxwazanî serbe zimanî dîke pere bem zimane biden. Nûsîne berayîyekanî zarok pêşanî dedat ke pêwîstîşe gutey rastewxo le têkstda be nîşaney ragiwaste<sup>136</sup> yan be daş<sup>137</sup> diyarî bikirêt. Lêreda mamosta detwanê sûd le têkstî fêrxwaz werbigirêt bo ewey yarmetîy bidat û pêşanî bidat gutey ragiwaste çon diyarî dekat. Mamosta bem karey le “nêzîktirîn zonî firajûtin” -î fêrxwazekda yarmetîy pêşkeş dekat.

## **Axaftin û sîstemî nûsîn**

Nerêtî fêrgey Swêd weha bûwe xwêndinî sîstemî nûsîn serinc le fêrbûnî xwêndinewe gîr bikat. Rîşey em diyardeyêş degerêtewe bo xwêndinî “katêkes”<sup>138</sup> -î sedey şazde û bedûwawe. Ew dem, deselatî kenîse wehay be berjewend dezanî gişt kesêkî riskaw fêrî xwêndinewey “katêks” û fermanekanî dîke bêt, belam handanî gel bo berhemhênanî nûsîn mebest nebû. Begîştî mirovî xwêndewar pitir xoşcilewe, belam mirovêkî binûsêt û bîrûray xoy rageyenêt pitir lacilewe.

<sup>134</sup> Ayendey raburdû: future in the past, wate ayende le riwangey raburdewe, “kitêbekem peyda kird çunke deba bîxwênimewe” - Le raburdûda “peydam kird” çunke deba le ayendeda “bîxwênimewe”.

<sup>135</sup> Raburdûy tewaw: pluperfect, bo nimûne “katêk min geyîştîm nesirîn royîştîbû”.

<sup>136</sup> Nîşaney ragiwaste: quotation marks, nîşaneyeke bo diyarîkirdinî gutey rastewxo ke radegiwêzirêt bo nêw têkst: “...” yan «...».

<sup>137</sup> Daş: dash, kurtehêlî pêş gutey rastewxo: “-”.

<sup>138</sup> Katêkes: catechism, xwêndinî kilêse, xwêndinî mesîhayetî, kitêbe, zincîreyek pirsiyar û bersive be mebestî aşinabûn be bawerî mesîhayetî, dête xwêndin.

Belam tojînewey deyan salî raburdû pêşanî dawe ke fêrbûnî sewad hasantire ger mirov bo fêrbûnî nûsîn berhemî nûsînî xoy bikate serşar çunke leweda mirov bîrûray xoy derdebirêt nek wek le xwêndineweda, bîrûray kesêkî dîke rave bikat (Liberg 2006).

Ew cudawazîye dabireş goya heye le nêwan axaftin û nûsînda, aşkira bû ke wêjenge.<sup>139</sup> Wek zûtir basî hat, hem zimanî standardî nûsîn bo axaftinîş bekar dehênrêt û hem şêwezarî naferimî û rojaneyîş, be hoy em helkişane xêrayey teknîkî IT, zor xêra derfetî nûsînî firewantir peyda dekat.

Lewaneye “*çonî delêyt wehayîşî binûse*” le destpêkda bo fêrbûnî xwêndin û nûsîn stratêjêkî baş bêt bo zarok, belam debêt proseyekî terîbîş biçerxêt bo peredan bew zimane ferimîyey nûsîn ke hem le wêjenûsî û hem le faktinûsîda bekar dehênrêt. Leber ewe girînge jûrî pol, le zaroxane û le fêrge, derfertî zengîn bo fêrxwaz birexsênêt bo algorî ezimûnî xoyan derbarey zimanî hem axaftin û hem nûsîn le buwar û babetî corawcorda. Bew kare bestênî resen peyda debêt bo firajûtinî tomarî corawcorî zimanekî. Firajûtinî sîstemî nûsîn le pajî şeşem û heftemda wirtir dêtewe berbas.

### Karlêkî nêw pol

Karlêkî zarekîy nêw pol be piley yekem sê karkirdî heye (Halliday 1993, Cummins 2000). Yekem: le layen mamosta û fêrxwaze bekar dehênrêt bo ewey wêkira zanyar helçinin. Dûhem: bekar dehênrêt bo ewey fêrxwaz aşinay norm û boçûnî biryarde bin. Sêhem: debête girîngtirîn destawêjî fêrxwaz bo firajûtinî ziman. Le her yek lem sê karkirdeda, karlêkî mamosta - fêrxwaz şanorey heye. Mamosta û fêrxwaz, wêkira çalakane zanyar heldebestin û hawkat prosey civakandinî fêrxwazîş be sîstemî ew normaney serdestin, dête çerxandin.

Le seretay heftakanî sedey bîstemewe tojînewe heye derbarey karlêkî nêw pol. Tojeran Sinclair & Coulthard (1975) ew kurtebersive sêbale kilasîkeyan pêşanda ke le polda bawe: “*destpêşxerî - bersiv - fîdbak*”<sup>140</sup> (IRF), ke birîtîye lewey mamosta be guteyekî kurt, zor car be pirsiyarêk, destpêşxerî dekat, fêrxwaz bersivî heye û ewca mamosta serincî xoy dekatewe fîdbakî ew bersive. Zor car em karlêke birîtîye le pirsiyarî kontrolkar, mamosta arastey fêrxwazî dekat. Heath (1983) pêşanî dawe ke welamdanewey pirsiyarî lew core basêkî berbeyar niye lay hemû fêrxwazêk. Eme nimûneyekî helbestiraw:

*Mamosta: pêtextî Franse nawî çîye?*

*Fêrxwaz: Parîs.*

*Mamosta: diruste!*

Tojînewekey Heath pêşanî dawe ke grûpî fêrxwaz hen çawenorî pirsiyarî “resen” deken, wate pirsiyarêk mirov arastey dekat bo ewey şitêk bizanêt, bo nimûne “destewaneket le kiwê danawe?”, emane layan seyr bû mamosta pirsiyarêk araste bikat bo xoy pêştir welamekey bizanêt.

Karlêkî nêw pol, le buwarî tojînewey corawcorda bote babetî lêwirdbûnewe, bo nimûne buwarî serbe reçeleksasî, civaknasî, “şirovey gutar”,<sup>141</sup> û betaybetî le riştey “mirovnasîy zimanewanî”<sup>142</sup> (Heath

<sup>139</sup> Wêjeng: illusion, wehm, zirexeyal, firîw.

<sup>140</sup> Destpêşxerî-Bersiv-Fîdbak: *Initiation-Response-Feedback (IRF)*.

<sup>141</sup> Şirovey gutar: *Discourse Analysis (Da)*, *discourse studies*, gutarnasî, çemikêkî giştîye bo şirovey ziman, çî zarekî bêt, çî nûsyar û dariştey hêma û nîşaney taybet.

<sup>142</sup> Mirovnasîy zimanewanî: *linguistic anthropology*.



1983), maykro-reçeleknasî<sup>143</sup> ((Mehan 1979, Cazden 1988 û herweha “*şirovey rexnegiraney gutar*”<sup>144</sup> (Gee 1996). Tojer Lindberg (2004) delêt “*tojkarîy pol*”<sup>145</sup> le riwangey fêrxwazî serbe zimanî dîke, pêşanî dawê ke “*wanebêjîy rastewxo*” -y nerêtî<sup>146</sup> le nimûney “IRF” nabête yarîder bo firajûtinî ziman bigire xefekarîşe boy, çunke derfetî tewaw nadate rêjiney ziman le polda. Fêrxwazî serbe zimanî dîke pêwîstî heye be derbirînî dirêjxayentir û be derfet bo bînewberey zimanekî. Em pêwîstîye bew karlêke baştir dabîn debêt ke, bo nimûne, le karî geldestî nêw grûpî biçûk deybexşêt.

Letek eweşda Lindberg (2004) amaje dekat bewey tojînewe heye pêşanî dawê ke gorankarîy taradeyek biçûk le nexşî IRF da karîgerîy başî debêt bo firajûtinî ziman lay fêrxwaz. Mamosta lebirî ewey berteskane bersivî fêrxwaz helsengênêt, fêrxwaz han bidat bo bîrkirdinewe, dineyan bidat bo belgekarîy derbarey boçûnekanyan û girêdanyan be ezimûnekanî xoyanewe, karîgerî zor başî debête leser firajûtinî zimanî ew fêrxwazane. Herweha Schleppegrell (2004)-îş delêt karlêkî IRF deşêt le çend bestênêkda û bo çend mebestêk, sûdî hebêt.

Lindblad & Sahlström (2001) tojîneweyan heye le astî balay fêrge bineretîyekanî Swêd û delên fêrgey em serdemey Swêd kemtir karlêkî IRF -î heye û zêdetir rûy le karî serbexo û karî geldestî nêw grûpî biçûke letek beşêk rêniwênî le mamostawe. Em diyardeye, wek çendîn tojînewey dîkeş pêşanî dedat, be radeyekî zêdetir zaroxane û salaney berayî fêrge degirêtewe.

Gibbons (2006, 2008) cexit dekate ser ewey mamosta debêt derfet bidate fêrxwazan bo bînewberey zimanekî û nabêt zimanekê ziyad le pêwîst sakar bikat. Gerçî car heye sakarandin rêgey têgeyîştin le mewdayekî kurtitda xoş dekat belam derfetî girîng bo peredan be tomarî akadêmîy zanyarbêj le fêrxwaz zewt dekat. Lebirî sakarandin, gişt fêrxwazan pêwîstyan be berokgîrîy hem hizirkarîy heye û hem zimanekî.

Corêk heye le karlêkî nêw pol bote cêy serincî tatîbet le nêw dîdaktîkî matematîkda, pêy degutirêt: “*arastekirdin*”. Mebest lem arastekirdine eweye mamosta bo yarmetîdanî fêrxwaz, pirsiyarî rêniwênî lê dekat û kêşeke bo parepare dekat bo ewey fêrxwaz xoy bigate bersivî dirust, belam zor car bê ewey têgeyîştinî letek bêt.

Le tojkarîy polî weha ke zorbey fêrxwazanî serbe jîngey firezimanin, yan serbe xêzanî lawazin le rûy civakî - abûrîyewe, xuya debêt ke bawtire mamosta le polî wehada pitir fermanarane reftar biken û kemtir derfet bidene fêrxwaz destpêşxerî xoyan hebêt (Johnston & Hayes 2008, Wedin 2009, Deen, Hajer & Kolle 2008). Tojînewekan pêşanîşî deden ke em helkişaney fermanarîy mamosta û dakişaney merc leser fêrxwaz, dilgerimîy fêrxwazanî xamoş kirdotewe. Tojeran Johnston & Hayes nexşêkiyan lê aşkira bû ke têyda mamosta pirsiyarî weha araste dekat ke tenha be yek yan dû peyv bersiv bidirêtewe û be degmen nebêt dawa le fêrxwaz nakat pere be bersivekey xoy bidat. Tojer Naucîr (2000) îş pêşanî dedat ke tenanet mamostayanî zaroxaneş pirsiyarî weha arastey mindalî xawen paşxanî swêdî deken daway bersivî aloztir bikat belam mindalî xawen paşxanî turkî pirsiyarî wehayan araste dekira bersivyan kurt û sakar bêt. Deen, Hajer & Kolle pêşanî deden mamosta ke dête ser handanî fêrxwaz bo ewey xoyan zanistî xoyan le matematîkda helbestin, têgeyîştinî fêrxwaz le babeteke heldekişêt.

---

<sup>143</sup> Maykro-reçeleknasî: microethnography, ethnographic microanalysis of interaction, şirovekarîy wird le karlêkî tomakiraw.

<sup>144</sup> Şirovey rexnegiraney gutar: Critical Discourse Analysis (CDA), rişteyeke le “*bîrdozey rexne*” xerîkî tojînewe û şirovekarîye le gutar (dîskors) û diyardey dîkey civakî, betaybetî saxtarî deselat.

<sup>145</sup> Tojkarîy pol: çemikêke bo derbirîn le tojînewey gişt karubar û xwêndinî nêw pol.

<sup>146</sup> Wanebêjîy rastewxo: direct instruction, şewazî nerêtîy dersgutînewe ke mamosta têyda axêwerî şandere û fêrxwaz begîştî xamoşane wergirin.

## Nêwtojekani<sup>147</sup> xwêndin

Kewate girînge fêrxwaz derfetî zengînyan hebêt bo berkewt letek zimanî zanyarbêjda û herweha xoyîşyan wirde wirde bikewine berhemhênanî zimanî weha. Bo zorêk le fêrxwazanî serbe zimanî dîke û zorêk lewaney berkewtêkî wehayan le derewey fêrge letek em zimane swêdiyeda nîye, em base bo serkewtînyan le fêrge, şanorey heye.

Gibbons (2006) cexit dekat Leser ewey “aşkirayî” le karlêkî nêw polda sûdî heye bo fêrbûnî fêrxwazî serbe zimanî dîke. Em aşkirayîye hem rutînî hawnewaz degirêtewe, hem aşkirayî le nêwerokî babet û sinûrî nêwan babetekanda. Herweha aşkirayîş degirêtewe le nexşî “noregirtin” û le normî nêw pol û çêwandinî<sup>148</sup> şêwazî corawcorî karlêkî wek “karî serbexo”, “grûpkarî” yan waney mamostaferman. Em delêt “noregirtin” betaybet sûdî heye bo fêrxwazî kemdû, ke lêreda derfetyan debêt bo derbirîn.

Bo ewaney hêşta swêdî beradey hawpolî swêdîziman nazanin, pêwîstyan be agadarîy zêdetir, zore. Wate emane pêwîstyan heye bewey agadarî werbigirin hem be şêwey corawcor û hem be destawêjî corawcor. Ger heman agadarî be şêwazî firecor, bo nimûne be gutin, be wêne û be amaje... Pêşkeş bikirêt, derfetî têgeyîştin, bo ew fêrxwazaney carê zimanzanîyan tewaw nîye, firewantir debêt.

Ewca aşkirayî hemecorîş girîngîy peyda deken, leber ewey fêrxwaz ger naçar nebin hewil biden agadarîy dîkey pêwîst mezende biken, xalî girîng hasantir dedozinewe. Kewate aşkirayî lem babetaneda girînge:

- rutîn
- nexşî noregirtin
- normî nêw pol
- perînewe lem “karlêk” ewe bo ew “karlêk”
- sinûrî nêwan babet

Mebest le “aşkirayî rutîn” ewe nîye gişt karûbarêk le jêr cilewgîrîy wirdî mamostada bêt, mebest eweye rutînî biryarde bo hemwan rûn û yeknewa bêt. Em base “nexşî noregirtin” û normîş degirêtewe, norey kêye bête go, key, çon û derbarey çî. Em sîstemî polî swêdîye, bo kesaneîk le fêrgey dîkey salaperistewe hatûn, serşêwên dête berçaw. Rêsay ranegeyendiraw zorin û bo fêrxwaz sexte bizanêt çî rewaye. Em peşêwîye fêrxwazî swêdîş degirête ke maweyek nîşteçey welatî dîke bûn û le fêrgey xawen rêsa û normî cuda xwêndûyane. Kîje paşeberekey xom ke salanî berayî fêrgey le welatî Tanzania birde ser, paş yek hefte le fêrgeyekî swêdîda wehay gut:

*Mirov nazanêt çî bikat. Mamosta delêt nabêt fêrxwaz le xoyewe welam bidatewe, debêt dest helbirêt û çawerêy amaje mamosta bikat ewca bête go. Paşan pirsiyarêk arastey pol dekat. Min dest heldeberim belam ewaney dîke rêk welameke be dengî beriz delên. Mamostayîş delêt: diruste! Min têngem key be qsey mamosta bikem û key be qsey nekem, belam ewaney dîkey nêw pol dezanin.*

<sup>147</sup> Nêwtoj: implication, peywendîy nadyar belam berderik.

<sup>148</sup> Çêwandin: gîrkirdin le nêw çêwe (çîwarçêwe)-da.

Girîngîşe sinûrî nêwan şêwaze corawcorekanî karlêk ke le polda piyade dekirên, aşkira bin. Bo nimûne sinûrî nêwan karî kesekîy xo beranber waney gişt poleke. Lewaneyîşe sinûr bêt le nêwan katî kobûnewey pol bo giftûgoy basêkî taybet û katî kobûnewey pol bo giwêradêran le waneyekî mamosta. Emane doxî corawcorin û şêwazî cudawazî karlêkiyan heye û herweha serincgîrî xalî cudawazîşin.

Sinûrî nêwan babet merc nîye tenha babetî xwêndin bigirêtewe, deşêt buwarî wanekan yan buwarî mijarî cudawaz bêt. Girîng eweye mirov bizanêt xerîkî çîye, çî lêreda serincgîre û çîye ewey çawenor dekirêt le fêrxwaz lem derfete diyarîkiraweda fêrî bibêt.

## Pajî şeşem: Le axaftinewe bo nûsîn

Zor xal hen, her zû ber le destpêkî fêrbûnî nûsîn, lay zarok rû deden û paşan karîgerîyan debêt Leser fêrbûnî sewad. Le karûbarî zaroxane û polî amadekarda zor babet hen mamosta detwanin bîken be mebestî yarmetîdanî firajûtinî ziman lay zarok ber le destpêkî fêrbûnî sewad.

Nêzîkey bîst salêk debêt zaroxane û fêrgey Swêd kewtûnete firewandinî ew maweyey diyarîkirawe bo cexit kird Leser peredan be twanakanî sewad lay zarok. Em rewte hawkat hat letek peydabûnî çerxandinêkî niwê le çemikî “sewad” literacy ke rîşey degerêtewe bo tojînewey nêwerastî heştakan.

Zûtir weha baw bû fêrbûnî sewad bispêrêt be polî yekem û dûhem, neselmandinêkî zorîş hebû, betaybetî lelayen korî mamostayanewe, beranber ewey zarok zûtir le mal û zaroxane sewad peyda bikat. Eme tewaw cudawaz bû le nerêtî engloseksonî ke fêrkirdinî ferimîy sewad çend salêk zûtir destî pê dekird û be karêkî rewa dezanira ke dayikûbab zarokî xoyan fêrî xwêndinewe nûsîn biken. Leber ewe awirdaneweyek le paşxanî mêjûy Swêd lem buwareda leweye xirap nebêt.

## Fêrbûnî xwêndinewe le Swêd - riwangeyekî mêjûnor

Swêd yekêke le welate berayîyekanî cîhan ke xwêndinewezanîy giştî têda piyade kira. Wek derencamêk le “rêformî protêstanetî”,<sup>149</sup> ke kilêsey dewletîy Swêd katolîketîy<sup>150</sup> gorî be protêstanetî,<sup>151</sup> dewlet le sedey şazdeyemewe destî daye helmetêk bo bilawkirdinewey xwêndewarîy le nêw gelda.

Serincgîrî Leser xwêndinewe nek nûsîn diyardeyekî rêkewt nebû. Serdaranî dewlet û kilêse mebestyan bû aporey gel bitwanin ferman û rêşagelî bo nimûne Tewcîl û nûsyanî dîkey dînî bixwêndinewe. Hekarêkî hasankar lêreda ewe bû le “rêformî protêstanetî” da zimanî nûsîn û karûbarî kilêsey le latînewe gorî be swêdî. Em hengawe bo bilawkirdinewey rêsa û fermannamey firecorî dewletîş hasankar bû. Yekem tercemey Tewcîl bo zimanî swêdî salî 1526 bilaw kirayewe. Paşan le salanî 1540 da “katêks” -î swêdî bilaw kirayewe bo ewey aporey gel rêk ewe bixwênetewe ke deguncêt letek ewey fermanrewayan be guncawyan dezanî.

Sereta, erikî bilawkirdinewe xwêndinewe le nêw gelda be keşîş û xwêndewaranî dîkey nêw kilêse spêrdira paşan wirde wirde erikeke xiraye estoy serdaranî xêzan. Ewca erikî keşîş, û heta radeyekîş zengewani<sup>152</sup> kilêse, bûwe kontrolkirdinî prosey fêrbûneke le nêw gelda. Emane mawemawe bo “twanadozîy<sup>153</sup> xêzan” deçûne seredanî malan. Bem şêweye dekira swêdîgel le dûhem beşî sedey hevdeyemewe be mîlletêkî xwêndewar dabinrêt û beşêkî berînî ewaney, ber le çerxandinî “fêrgey

<sup>149</sup> Rêformî protêstanetî: protestant reformation.

<sup>150</sup> Katolîketî: catholicism.

<sup>151</sup> Protêstanetî: protestantism.

<sup>152</sup> Zengewan: karguzarî kilêseye, le serdemanî navînda, le pena karekanî dîkeda serperîştî zengilîdanî kilêseyî le esto bû.

<sup>153</sup> Twanadozî: têt, îmtîhan, taqîkirdinewe.

gel” salî 1842, erikî prosey fêrkirdinî xwêndineweyan le nêw gelda kewte esto, kesî asayî bûn (Isling 1991).

Corî xwêndinewey ew serdemane tewaw cuda bû lewey fêrgey em rojgare pêşemîy dedatê. Şarêbazî fêrbûn ew deme “*le-paş-gutinewe*” bû, kewate beşêkî zor lewey “*twanadozîy xêzan*” î ew deme be xwêndinewey dadena, emro be ezberkirdin dadenrêt. Mêjûnûs hen delên seretay çerxandinî “*fêrgey gel*” le 1842-da, çi firewandinêkî le fêrbûnî xwêndineweda bedemewe nebû, bigire be pêçewane (Wagner 1990, Isling 1990). Leber ewey gundinişîn naçar dekiran xanûy fêrge saz biken û mamosta ragirin, xêzanîş naçar dekiran mindalyan binêrine fêrge, dûr nîye corêk le berxodanî xamoş zeney kirdibêt. Xo merc nîye gişt carêk kesî here gunçaw le fêrge tazesazekanda damezirabêt, ew dem çawenor dekira zarok ber le destpêkî fêrge xwêndinewe bizanin, leber ewe fêrxwaz, ne le mal û ne le fêrge, be başî fêrî xwêndinewe nedekiran.

Bo çareserî em kêşeye, le kotay 1850 akanda biryar dira, “*fêrgey seretayî*” -y dû salane piyade bikirêt. Emane mamostay xanimanyan hebû ke paşan le “*fêrgey mamostayanî seretayî*” xwêndinyan bo saz kira. Kewate le Swêd prosey fêrkirdinî xwêndinewe pêş damezirandinî fêrge kewt, leber ewe debêt sistemî fêrbûnî xwêndinewe le fêrgey emroy Swêdda leber tîşkî ew nerête seyr bikirêt ke “*twanadozîy xêzan*” î têda piyade dekira.

Letek em “*fêrgey mamostayanî seretayî*” yeda rênamey nerêtîy bo xwêndinewe û rêbazî fêrkarîy xwêndindewe darêjran û her ewaneş bûnete binema bo fêrkarîy xwêndindewe û nûsînî em rojgare. Salî 1868 kitêbî “*xwêndinewe bo fêrgey gel*” darêjra û paşan salî 1912 yekem kitêbî dirustî xwêndindewe “*Sörgården*” bilawbowe. Be raspardey fermangey dewlet bo dariştinî kitêbêkî xwêndinewe derbarey ciyografay Swêd, Selma Lagerlöf -î nûser salî 1907, çîrokî “*Geştnamey Nils*” (“*Nils Holgerssons underbara resa genom Sverige*”) amade kird û salî 1935 kitêbî “*Werin bixwênînewe*” (“*nu ska vi läsa*”) y Elsa Beskow bilawbowe.

Em firajûtine wehay kird berpirsayetîy sewadî bnieretî bigiwêzirêtewe, le xêzanewe bo fêrge. Ewca le dûhem nîwey sedey bîstemewe sewadkarî bûwe pawanî fêrge. Le seretay temenî pîşeyîmda wek mamostay astî berayî, salanî heftakan û heştakan, zor mamosta bedguman bûn beranber hem dayikûbab ger yarmetîy mindalî xoyan biden bo fêrbûnî sewad ber le destpêkî fêrge, hem mamostayanî zaroxaneş ger yarmetîy fêrxwazyan bidaye bo fêrbûnî sewad. Fêrbûnî sewad bûwe babetîk ke deba le fêrgeda biçerxêt û dozînewey “*baştirîn*” rêbazî fêrkarî, basêk bû deba le nêw korî mamostayanî karada bête gutûbêj.

“*Modêlî Bornholm*”<sup>154</sup> ke zadey projeyeke salanî heştakan be rêberayetîy Ingvar Lundberg piyade kira û lay zor mamosta bûwe mayey gorînî dîdyan beranber katî destpêk bo geşey fêrbûnî nûsîn. Wek derencamêk lem projeye mirov hate ser dinedanî ewey be “*agayî zimanekî*” nawzed kira, her zû le zaroxanewe. Mebestîş le “*agayî zimanekî*”, agayî bû le buwarî rêziman û dengnasîda. Tojînewe pêşanî da ke em kare betaybet sûdî bo fêrxwazanêk heye ger weha neba tûşî kêşey gewre debûn letek sewadda, leber ewey katyan zêdetir debêt bo firajûtinî ziman (Lundberg & Frost 1988). Leber emeye “*gemey zimanekî*” wek seretayek bo firajûtinî ziman, le zaroxaneda cêy girt.

Pirsî ziman le nerêtî fêrbûnî sewad le fêrgey swêdîda pêşemî nizimî hebûwe. Le nerêtî behêzî takzimanî swêdîda, serinc gîr dekira le fêrbûnî xwêndindewe be arastey rahêzanî çend twanayekî ferimîy wek zanîni “*kodkirdinewe*” û “*deng derbirîn*”. Belam xudî zimanekey bekar dehênira bo

---

<sup>154</sup> Modêlî Bornholm : Bornholmsmodellen.

sewad, kêşerêj<sup>155</sup> nedekira, meger degmen. Hawaheng letek nerêti "xwêndinî katêks" -da, lêreş xwêndinewe cêy serinc bû, nûsîn dekewte sêberewe.

Beşêkî zor lewey le "xwêndinî katêks" da hate berhem, wek xoy û bebê kêşerêjî le nerêti fêrkarîda mayewe, belam bedem geşey riwangey tazewe ke berhemî tojînewey niwên, ew mîrate kewte jêr pirsiyarewe. Le seretakanî sedey bîstuyekemda, jimareyek tojînewey le Swêd bilawkiranewe têtanda boçûnî nerêti derbarey sewad kêşerêj kiran (Edling 2006, Folkeryd 2006, af Geijerstam 2006, Ewald 2007, Fasth 2007, Jönsson 2007, Björklund 2008). Girînge mamosta agadar bin lew nerêtaney hen bo sazkindinî derfet bo guncandinî ewey le zaroxane û fêrgey emroda deçerxêt letek civakî emro û ayendeda.

## Riwange le nûsîn

Tojeranî mirovnaşî,<sup>156</sup> be taybet ewaney serbe dunyay anglosekson,<sup>157</sup> le heştakanî sedey bîstemda kewtine ser gumankirdin lewey pêyan degut "modêlî sewadî autonom".<sup>158</sup> Em dîdey "sewad" be diyardeyekî serferaz dezanêt, delêt sewad dekatewe fêrbûnî hunerî wek pîtinûsîy dirust, wişenûsîy dirust, xwêndinewey dirustî take pît û herweha wişe, zor car beder le bestênêkî siruştî. Le çêwey em boçûneda, sewad debine hunerêkî mirov yekcar fêryan debêt û tewaw, paşan ew twanayey mirov peyday kirdûwe, heta heye car dûway car le bestênî corawcorda piyadeyan dekat. Twanay nûsîn deba be rahênan bêt Leser beşe cudawazekanî em hunere û deba fêrxwaz xoy em wirdehunerane gird bikatewe û paşan wêkira le bestênî niwêda bekaryan bihênêt. Em modêlê delêt "sewad" diyardeyekî bêlayene mirov be arezûy xoy bo mebestî corawcor bekarî dehênêt.

Tojeranî serbe *New Literacy Studies* (NLS), bo nimûne Street (1984, 1993, 1995), Gee (1996), Barton & Hamilton (1998), Barton, Hamilton & Ivanic (2000), Barton (2001) kewtine berokgîrîy riwangey "sewadî autonom". Street pêşnyazî "modêlî sewadî aydyolojiyane"<sup>159</sup> dekat ke corî cudawazî "sewad" î têtaye bo bestênî corawcorî civakî û ferhengî. Em bas le "sewad" dekat wek tojînewey le "çalakî". Lem buwareda dû çemikî "firesewad"<sup>160</sup> û "sewadî rexnekar"<sup>161</sup> hatine kayewe.

Metirsîyekî lew dû riwangeyewe ser heldedat ledestdanî sengî zimanekeye. Riwangey autonom serincgîrî şêwazî nûsîne û kemtir awir lew bestêne civakîye dedatewe ziman têtaya deçerxêt. Riwangey aydyolojî pitir sêregîrî bestênî civakîye û kemtir rûkarî zimanekeyî sewad behend degirêt. Nûsîn rûkarêkî zimane û debêt wehayîş sewday letek bikirêt. Fêrbûnî sewad dekatewe peredan be zimanzanî. Wate kar bewe tewaw nabêt mirov xoy fêrî lêkdanewe û bekarhênanî şêwazî nûsîn bikat, wate pît û normekanî nûsîn, belkû deşbêt mirov xoy fêrî ew core zimane bikat ke le nûsînda bekar dêt û pere be zanistî xoy bidat derbarey ew bestêne corawcoraney nûsîn têtanda bekar dêt. Le rêy zimanekeye mirov detwanêt wata û ezimûnî corawcor birastênêt, bo nimûne le çêwey nûsyarda.

"Zimanewanîy sîstemdarî karkird" (SFL) delêt ziman destawêjêke bo helbestinî watay xawen karkird. Frances Christie (2005) cexit dexate ser cudawazîy nêwan nûsîn û piyadekarîy dîkey civakî, bo nimûne normî poşak û razandinewe xwan. Herweha cexitîş dexate ser metirsîy çawpoşîn le girîngîy ziman bo

<sup>155</sup> Kêşerêjî: problematization dariştinî bîrokeyek yan diyardeyek le şêwey kêşeda - em çemike be zorî le buwarî zanistî û tojîneweda bekar dêt.

<sup>156</sup> Mirovnaşî: anthropology.

<sup>157</sup> Anglosekson: Anglo-Saxon.

<sup>158</sup> Modêlî sewadî autonom: Autonomous Model of Literacy.

<sup>159</sup> Modêlî sewadî aydyolojiyane: Ideological Model of Literacy.

<sup>160</sup> Firesewad: Multiliteracies.

<sup>161</sup> Sewadî rexnekar: Critical literacy.

nasname, zanîn û fêrbûn. Metirsî heye lewey mirov rûkarî saxtarekîy ziman wêl bikat ke debêt fêryan bêt. Beweş mamosta binemay girîngî fêrkarîy ledest deden.

Christie cexitîş dexate ser metirsîy çawpoşîn le cudawazîy nêwan zimanî axaftin û zimanî nûsîn, ke dekatewe yarmetîy nedanî mamosta le fêrkirdinî nûsînda. Kêşe lewedaye herdû modêlî hem autonom û hem aydyolojî serincgîr nîn le saxtar û le sazimanî ziman. Leber ewe lêreda wirdtir serinc dedeyne cudawazîyekanî nêwan zimanî axaftin û zimanî nûsîn.

### Cudawazîy nêwan zimanî axaftin û nûsîn

Cudawazîy nêwan zimanî axaftin û zimanî nûsîn hokaryan zore, wek zûtirîş amajey pê dira, lem salaney dûwayîda ew cudawazîyane kem bûnetewe û mewday nêwan ew dû cor zimane tesk botewe. Hokarêkî cudawazîyekan birîtîye lew destawêje, lew mêdyayey bekar dehênrêt. Axaftin, be giştî deng bekar dehênêt ke le zarewe deçêt bo giwê, lem rojgareşda be zorî le rêy mêdyay firecorî elektronîyewe. Bilawbûnewey nûsînîş heta dêt zêdetir pena bo mêdyay elektronî debat, belam şêwaze nerêtîyekey le destewe bo çawe û nîşane û pît dekate binema. Cudawazîye nerêtîyekan peywendîşyan heye bewey nûsîn pîtir bo bestênî ferimî bo giwastinewey agadarî bûwe le nêwan kat û şiwênî cudawazda. Wek zûtir basî hat, sinûrî nêwan zimanî axaftin û nûsîn heta dêt kaltir debêtewe hokarîş hem teknîkî hawçerxe û hem zêdetir bekarhênanî nûsîne le bestênî rojane û naferimîda.

Ême, wek hasankarî, lêreda bo peycorî le cudawazîy nêwan axaftin û nûsîn, wek destpêk *“axaftinî nimûne”*, wate danûstanî rojane, û *“nûsînî nimûne”*, wate ew zimaney le kitêbî fêrgeda bekar dêt, dekeyne serşar. Wate begîştî debête cudawazîy nêwan *“zimanî rojane”* û *“zimanî zanyarbêj”* (biriwane pajî pêncem).

Em xiştaye layenî *“nimûne”* le axaftin û le nûsîn dekate serşar. *“Axaftinî nimûne”* wate ewey le zarok çawenor dekirêt ber le destpêkî fêrge bîzanêt, beşdar bêt le danûstanî rojaneda. *“Nûsînî nimûne”* wate ewey le zarok çawenor dekirêt le mawey xwêndinî fêrgeda fêrî bibêt, beşdar bêt le danûstanî nûsirawî serbe bestênî zanyarbêjda.

Danûstanî zarekî	Danûstanî nûsiraw
Diyalogbare, karlêk sengî zore	Monologbare, saxtarî têkst girînge
Bersivî rastewxo	Bersivî nîye
“kar” î çalak	Destewajey taybet û helkişîwî navekî
Diyardey zimanbeder girîngin	Wişey taybet, ristesazîy helkişîw
Basî le êsta û êreye, bestênbende	Basî le ewsa û lewêye, bestênrehaye
Nêwerok serincgîre	Hem nêwerok û hem şêwe serincgîrin
Xiştay cudawazîy twana le nêwan zimanî zarekî û zimanî nûsirawda	

Hawsema sengî le axaftinda zore. Mindalêkî biçûk detwanêt rûdawêk bigêrêtewe ger bîserêkî gwretir hebêt be pirsiyarkirdin yarmetî bidat bo ewey agadarî û bestênî nêw axaftineke yek

bigirinewe herçend mindaleke hêşta mawyetî be tenya ew kare encam bidat. Belam le nûsînda, nûser debêt bo maweyekî dirêjtir wişe bigirête dest û be şewazkî weha baseke darêjêt tenanet ew kesey ew deme lewêda nîye, têy bigat. Eme daway twana dekat hem bo rêkxistinî têkst û hem bo pêşandanî agadarîy girîng. Le doxî axaftinda, bîser detwanêt be bersivî rastewxo daway rûnkirdinewey zêdetir bikat belam xwêner çawerêye gişt agadarîy pêwîst le nûsînekeda hebêt. Hawkat xwênerî azmûde heye le nêw têkstekeda baz dedat bo dozînewey agadarîy pêwîst û bo xo ladan le beşêkî dîkey.

Em taybetmendîye derfet dedate nûsîn zêde agadarî pêşkeş bikat ke axaftin helî nagirêt. Xoragîrîy bîser le ast zêdeagadarî nêw axaftin, diyardeyekî civakîye û bepêy ferhengî zimanekî dête gorîn. Begîştî mirov le ferhengî swêdîda xoragîrîy le ast zêdeagadarîy nêw axaftin berteske û çawerêye axêwer zû bigate xalî mebest û lewêda bimênêtewe. Eme basêke bepêy ferheng dête gorîn. Ferheng zon rê deden be labas û nimûnekarîy zêdetir leway le Swêd bawe.

Tenanet xoragîrîy le ast ewey axêwer le axaftinda wiçan bigirêt yan bîser nobebirî bikat, le nêwan ferhengî cudawazda cudawazîy heye. Lew bestêngeley serbe zimanî axaftinin le Tanzania ke min lêyan şarezam, axêwer, ger berarudî bikem be Swêd, boy heye hem zêdetir bilêt û hem wiçanî dirêjtirîş bigirêt bê ewey nobebirî lê bikirêt. Ferhengî axaftinî dîkeş heye nobebirîn têyda bo pêşan danî dilgerimî û behendgirtine.

Le axaftinda “*karî çalak*” zorin ke bas le rûdaw deken belam nûsîn “*naw*” -î diyarîkirawî zêdetir têdaye ke zor car be şewazî nasandin geşeyan pê dedirêt (biriwane pajî pêncem). Diyardey zimanbederîş, bo nimûne amaje, nîşaney rûxsar, tonî deng, xêrayî gutin... Le axaftinda dêne bekarhênan. Belam le têkstî dirêjtirda mercî dariştinî diyarîkirawî watarûn heye. Emeş daway ristesazî û saxtarî helkişîw dekat, herweha daway gencîneyekî zengîni wişezanî dekat.

Emanêş basgelêkin fêrxwaz debêt fêryan bêt rûwew twanay helkişîwî nûsînzani. Le axaftinî nimûneda, mirov begîştî bas le êsta û êre dekat, bemeş dariştinî axaftineke dekewête bertawî em bestên û dewrûbere. Boye lêreda derbirînî giştî, cênaw, ristey dapiçiraw, parçeriste û peyvî derkinar diyardey bawin. Herçî nûsîne mercî tewaw cudawazî heye leser helbijardinî wişe û ristey serleber çunke hem watarûnî û hem watawirdîy pêwîstitirin.

### **Amadekarîy bo sîstemî nûsîn**

Lay zarokî biçûk axaftin û dakewtêkî axaftineke niwênerayetîy dekat dû babetî tewaw cuda nîn. Bo ewey zarok bitwanêt sewad peyda bikat naçare serinc le rûxsarî zimanekêş gîr bikat, watay taketakey dengekan û peywendîy nêwanyan têbigat. Pey birdin bewey em wişane: “*pişîle, Pişîle, PIŞÎLE*” yek watayan heye belam “*pişîle, plîşe, şepîle*” heman babet nîn, karêkî xorisk nîye bo kesêkî hêşta fêr nebûbêt nûsîn çon deçerxêt. Zarok debêt fêr bêt le nûsînda çî girînge û çî girîng nîye.

Ew babetaney bo têgeyiştinî nûsîn ke zarok pêwîste fêryan bêt, le layen tojer Bente Eriksen Hagtvet (2002) dabeş kirawe beser çîwar şabuwarî pêdagogîda, wate ew huner û zaniste cudawazaney debêt bo firajûtinî twanay nûsîn, dine bidirên. Çîwar şabuwar birîtîn le:

- Zimanzanîy giştî.
- Têgeyiştin û peredan be zimanêkî helkişîw.
- Mêtazanî derbarey bîrkirdinewe, ziman û danûstan.
- Ezimûnî sewad.



Ke dête ser yekem şabuwar, tojer cexit dekat leser ewey zarok pêwîstîy heye be rahênanî zor leser ew zimaney wabestey dox nîye, derbirînî mewdadirêj, bekarhênanî ziman bo arastekirdinî kirdewe û çareserî kêşe, herweha derbirîn û têgeyîştinî peyamî bestênbeder.

Şabuwarî dûhem delêt girînge zarok derfetî hebêt hem bo berkewt letek zimanî helkişîwda, hem bo bekarhênanî zimanî weha, mebestîş le zimanî helkişîw eweye ke zûtir be *“zimanî zanyarbêj”* yan *“zimanî akadêmî”* nawzed kira. Girînge zarok rahênanî hebêt leser monolog, saxtarî bêjandin, ravekirdin û fermanan û herweha bekarhênanî riwangey derekî.

Şabuwarî sêhem delêt zarok pêwîstîy heye be derfet bo ravekirdin û gutûbêjî bîr û bîrkirdinewe, ziman û danûstan. Weha başe giftûgoman hebêt letek zarokda derbarey bîrkirdinewey xoman, ew zimane çone ke bekarî dehênîn, le bestên û doxî cudawazda çon deaxfîn. Eme beşêke le firajûtinî *“agayî zimanekî”*. Deşêt bas le ristesazî bêt, yan le helbijardinî wişe û pêkhatay wişekan.

Şabuwarî çiwarem basî le ezimûnî sewade. Lêreda girînge zarok derfetî zengînî hebêt bo nûsîn le bestênêkî siruştîda. Bo nimûne katêk zarok xerîkî nûsînî, karmend letekiyan danîşêt, yan peyamî mamosta bo dayikûbab be nûsîn bidirête dest fêrxwaz. Helbet xwêndinewey dengdarîş degirêtewe bo zarokan. Bekarhênanî zimanî cuda û sîstemî nûsînî cuda le karûbarda sûdî zore bo firajûtinî *“agayî zimanekî”* lay zarok, bo derikkirdinî zimanî xoyan û zimanî kesanî dîke. Kewate *“agayî zimanekî”* tenha agayî dengnasî û rêzimanî nagirêtewe, belkû agayîşe le bekarhênanî corî cudawazî ziman û le karîgerîyan.

Tojîneweyekî norwêjî pêşanî dawê ke fêrxwazî serbe zimanî dîke, pitir xemsard bûn beranber *“gemey zimanekî”* -y weha ke le salanî berayî fêrge birewyan peyda kirdibû (Vesteraas Danbolt & Iversen Kulbrandstad 2008). Boçûn weha bû ke hokar degerêtewe bo ewey em gemane wişey zoryan têdaye ke em zarokane têyan nagen. Bo derfetdan be riwangey firezimanekî le nêw gişt zarokanda, zimanêkî xeyalkird pêşkeş kira: *zimanî wirçebefirîne*. Em zimane geldeste le polda saz kira û girê dira be mijarêkî karî nêw pol. Amanc lem kare birîtî bû lewey *“agayîyekî zimanekî”* le nêw gişt zarokanda pêk bêt ewîş le rêy girêdanî ew zimananey ewan deyzanin, ke norwêjî yek bû lewan. Mebest ewe bû bem core derfetêk bidirête zarok bo peybirdin be makî ziman, hem be jêdere firecorekanî û hem be şêwazî helbestinî ziman.

### **Rahênan berew firajûtinî sîstemî nûsîn**

Bo hasankirdinî fêrbûnî nûsîn, detwanît bo nimûne serincî mindaleke rakêşît bo çonetîy pêkhatinî wişey lêkdiraw, bo şêwazî gerdankirdin (morfolojî), bo dengî corawcor... htd. Zor kitêbî serbe *“gemey ziman”* bo zarok, diyardey lem babetane wek rahênan pêşkeş deken.

Nimûneyek le ristesazî (sîntaks)-y bo zarokî pênc - şeş salan sexte têy bigen eweye rîzbendî ristekey degutirêt rêk neyet letek rîzbendî rûdawekey bas dekirêt. Zarok weha rahatûn gutar û rûdaw hawnewaz bin:

*“Sereta destitan deşon û ewca dên dadenîşin bo aşxwardin”.*

Ger bilêyt:

*“Dên dadenîşin bo aşxwardin paş ewey destitan deşon”.*

Lewaneye mindaleke danîştin û aşxwardineke pêş bixat çünke risteke wehay zincîre kirdûwe. Ew zarokey be zimanî axaftinî swêdî rahatûwe lewaneye weha têbigat ke ew nawey le seretay gutinekeda dêt her xoy “kara” ye, ew keseye kareke dekat, ew nawey paşan dêt “berkar” e, ew keseye karekey beranber dekirêt. Emeş zorbey ristekan degirêtewe, bo nimûne:

*Segeke pişîleke rawdenêt.*

Belam riste heye, corêkî dîkeye, bo nimûne ristey “karabizir”:<sup>162</sup>

*Pişîleke le layen segekewe rawdenrêt.*

Doxî dîkeş hen “kara”, ewey kareke dekat, nabête “nîhad”, bo nimûne:

*Pişîleke dekewête ber rawnanî segeke.*

*Rawnanî pişîleke dirêjxayen bû.*

*Rawepişîle çir bû.*

Lem dû risteyey kotada “kara” tewaw bizire, emeş core dariştinêkî bawe le nêw kitêbî fêrgeda û herweha bo derbirîn lew core zanyarey le fêrgeda basî dêt. Emeş çend nimûneyek le kitêbî civaknasîy polî şeşem:

- Paş jimardinî dengî gel, ew 349 kursîyey parleman dabeş dekirêt beser partîy corawcorda. (Kê dengekan dejimêrêt û kê kursî dabeş dekat?)
- Deşêt çaw berawird bikirêt be kamêra. (Kê berawird dekat?)
- “Çaw” î kamêra be “objektîv” nawzed kirawe. (Kê nawzedî kirdûwe?)
- Le başûrî Çîn darî tû deçênrêt, emeş bo bijêwî kirimî awirîşim. (Kê deçênêt?)
- Mirovêkî Îslam dînî bêt pêy degutirêt musulman. (Kê pêy delêt?)
- Le menarekanewe bangî niwêj dedirêt. (Kê bang dedat?)
- Ewca siyasetmedarêkî respêst, Nelson Mandela, kiraye serokî welat. (Kê kirdîye serokî welat?)
- Welatî Zaîr salî 1960 serbexoyî wergirt. (Le kêy wergirt?)

Kewate zarok debêt le salanî berayî fêrgewe pere bem core zimane biden bo ewey baş amade bin bo xwêndinî salanî dahatû. Herweha wişey lêkdirawîş diyardeyeye debêt zarok serincgîrî bêt. Bo nimûne cudawazîy nêwan “gel”, “mêgel” û “gelega” yan “çawpoşî” û “şîkpoşî” ... htd bo baskirdin le cudawazîy watayan, paş û pêş kewtinî beşekan û htd.

---

<sup>162</sup> Karabizir: passive voice.

“Serwa”<sup>163</sup> û helbestokî zarokan betaybetî le paş projey “Bornholm” ewe, birewî le zaroxaneda peyda kirdûwe. Helbestok begîştî xoşin û le zor cor gemanda cêyan debêtewe. Bo ew zarokaney zimanî swêdî layan zimanî dûheme, goranî û helbestok debine yarîderî baş bo firajûtinî ziman. Leweş bitirazêt ziringîyekî zimanekî têdaye mindal xoşîy lê debînin. Zarok heye çêjî taybet lem core zimane degirin û helbestokî xoyan saz deken. “Serwa” -yş yarmetî zarok dedat bo peybirdin be şêwazî ziman, çunke serwa wabestey şêwazî wişeye, dirustitir bilêyn wabestey dûwabirgey wişe yan risteye. Zarokî biçûk layan sexte take wişe û deng cuda bikenewe. Pey birdin bewey kamane wişe serwan, yarmetîyan dedat serincgîrî şêwaz û dengî zimanke bin, emeş sûdî heye bo fêrbûnî nûsîn.

Girînge le yadiman bêt ke rahênanî bernamebendî ferimî bo fêrbûnî ziman bo zarok sûdbexş nîye. Eme betaybetî girînge bîrî lê bikeynewe katêk zarok şêwazî rêzimanî weha bekar dehênin ke rêk natet letek zimanî standardida. Emeş tenha bo zarokî serbe zimanî dîke nîye. Lay zor le zarokan katî dewêt heta pey deben be layenî rîzper le zimanda. Bo firajûtinî zimanî zarok weha baştîre berkewtî hebêt letek zimanî axaftin û zimanî nûsiraw be şêwazî corawcor, bo nimûne bîstinî xwêndinewey kesêkî dîke yan gemey ziman, wek lewey amaje be helekey bikeyt yan agayane hewil bideyt raybihênît leser şêwazî dirust.

Car heye le kitêbî terxan be “agayî zimanekî” -da bo zarokî zaroxane û polî amadekar debînit rahênan heye derbarey ewey rîzper le zimanî dirustda. Belam min pêwî waye baştîre ger mamosta diney zarok bidat ziman le doxî zêdetir berokgîrda bekarbihênin û yarmetî zarok biden bewey pêşanî biden ke şêwazî cudawaz heye bo derbirînî zimanekî. Zarok ger yarmetî bidirêt serincgîrî diyardey cudawaz bêt le zimanekeda û ger kunçkawî û xulyay têda bête hurûjandin bo peydozîy zimaneke, ew zaroke hem pere be zimanekey xoy dedat, hem zanistîşî ziyad dekat derbarey ziman û bekarhênanî ziman, wate cige le zimanzanî, “agayî zimanekî” îşî ziyad dekat.

Fêrbûnî nûsînîş her wek fêrbûnî axaftin, bewe debêt zarok beşdar bêt le doxî siruştîy wehada nûsîn tîyanda bête bekarhênan. Caroline Liberg (2006) cexit dexate ser ewe zarok be sewad fêrî sewad debêt. Heath (1983) delêt zarok ber lewey fêrî xwêndinewe bin, dexwêninewe bo ewey fêr bin. Mebestîşî eweye fêrxwaz ger le dewrûberêkda bin nûsînî lê bêt, ew nûsîne bo fêrbûn bekardehênin. Her bo nimûne zarok nûsînî ser kêlerê û naw ew kitêbane “dexwênêtewe” ke hêndey bîstûn ezberî kirdûn, eme debête “gemexwêndinewe”. Nimûneyekî dîke ewe ke zarok le *datawazîda*<sup>164</sup> be yarmetîy nûsînî corawcor le gemekeda xoyan pêş dexen. Rahênanî baş bo dinedanî em firajûtine rêk eweye ke zarok derfetî hebêt ziman le şêwaz û doxî corawcorda bekar bihênêt, hem axaftin û hem nûsîn. Le pajî heftemda pitir lem base dedûwêyn.

### **Firajûtinî sîstemî nûsîn lay zarokî fireziman**

Kitêb zorin bîrdoze û amojgarîy pêşan deden derbarey karkirdinî fêrge letek fêrbûnî sewad. Leber ewe pêwîst nakat ew kare lêreda firepat bikirêtewe. Lebîrî ewe çend rûkarêkî dinedanî sîstemî nûsîn lay zarokî fireziman dexeyne berbas. Leber ewey nûsîn rûkarêke le ziman û her wek zimanîş debêt le bestênî xoriskî civakîda bête fêrbûn, girînge jîngeyek le dewrûberî zarok saz bikeyn tîyda dinedan hebêt bo bekarhênanî nûsîn le bestênî corawcorda û bo peredan be twanay corawcorî sewad.

<sup>163</sup> Serwa: rhyme. Beşawend, paşbend, qafye, biriwane “*Ferhengê Xal*”.

<sup>164</sup> Datawazî: computer game - gemey corawcor ke be amêrî elektronî dekirên.

Em kare lay zorbe mindal karêkî sext û dirêjxayene. Zarok pêwîstî heye bewey le jîngeyekî aramda kar bikat, herasan nekirêt, pêwîstî be hoşgîrîye. Mindal zorin ke pêwîstyan be kesanî gewresale le aste cudawazekanî firajûtinî zimanda yarîderyan bin.

Leber ewey xwêndindewe û nûsîn diyardey civakîn û bo danûstanî nêwan mirov bekar dehênrên, girînge fêrxwazîş derfetyan hebêt bo ezimûnî hawko ke nûsînî têyda bêt. Le fêrgey hawçerxî Swêdda, cexit pitir Leser take û layenî hawko wela denrêt. Zûtir weha baw bû ke sewad karûbarêkî hawko bêt, geldest le polda piyade bikirêt. Beşêkî ew rewtey ewsa, êsta bawî nemawe, bo nimûne “dîktamen”<sup>165</sup> û xwêndinewey yek be dûwa yekî nêw pol be dengî beriz.

Girîngîy bekarhênanî ew zimananey fêrxwaz deyanzanêt zûtir basî hat. Karî siruştî eweye zanistî niwê, bo nimûne sewad, bew zimane bêt ke mirov têyda zale. Bo beşêk le fêrxwazekan weha başe em zaniste niwêye be zimanêkî dîke fêrbîn nek be swêdî. Le barêkda ew kare derfetî sazûnî nebêt, be hoy bo nimûne nebûnî mamostay zimanî dayikza, ewsa fêrbûneke be zimanî swêdî debêt, gerçî fêrxwazeke hêsta negeyştote astêkî nêzîk astî hawpolanî xoy le swêdîda. Le barî wehada twanay mamosta bo rêxistin û berêwebirdinî fêrbûnî nûsîn ewendey dîke girîngtir debêt.

Ger naçarbîn destpêkî fêrbûnî nûsîn be zimanî swêdî piyade bikeyn ewa girînge kesêk bidozînewe çend wişe û destewajeyek be zimanî dayikzay fêrxwazeke binûsêt bo ewey em zaroke derfetî hebêt be zimanî xoyîşî ew nûsîne bibînêt. Helbet em kare aloztir debêt ger sîstemî nûsînî zimanekey dîke latînî nebêt. Ewsa her nebêt mindaleke fêr bêt nawî xoy be zimanî dayikza binûsêt.

Ger mamosta bo nûsînî zimanî dayikza peyda bêt û sîstemî nûsînîş cuda bêt, bo nimûne sîstemî erebî bêt, ewsa girînge mamostayanî ew fêrxwaze, mamostay pol, mamostay zimanî dayikza û mamostay zimanî swêdî wêkira ko bibinewe û pêk bèn Leser baştirîn stratêj bo peredan be zimanî nûsîn lay em fêrxwaze. Lewaneye weha baş bêt em fêrxwaze destpêk fêrî sewadî erebî bêt û paşan xerîkî zimanî swêdî bêt. Emeş pêwîstî be piştîwanîyekî behêz heye le layen kesanî gewresalî erebîzanewe. Barî dîke heye têyda baştir wehaye cexit Leser zimanî swêdî bikirêt û erebî bikewête xaney dûhemewe. Belam leber ewey emyan kosp dexate rêy cûtsewadî<sup>166</sup> -y fêrxwaz, wate geştiştin be twanay sewad be pitir le yek ziman, girînge derfetdozîy tewaw bikirêt bo peredan be zimanekey dîkey fêrxwaz.

Girînge fêrxwaz zimanî nûsîn fêr bêt û hawkat pere be zimanî dayikzay xoyîşî bidat. Sengî fêrbûnî nûsîn be zimanî dayikza zûtir basî hat. Zor bestên heye mirov be endamêkî dirust najimêrin le peywestî zimanekey xoyanda ger ew endame twanay sewad bew zimane nebêt. Her bo nimûne, beşdarî le tore corawcorekanî agadarîy nêw înternêt be zimanî cuda pêwîstî heye bewey mirov nûsînî ew zimane bizanêt. Kamilla György-Ullholm rûnî dekate ke kurêkî çîwarde salanî danîştûy Swêd û be reçek hengarî, çî bertekî debêt le nûsînî hawtemenêkî xoy katêk le înternêtda be zimanî hengarî denûsêt û hele le nûsînekeda dekat, em kureyan delêt: “îdî zanîm eme nûsînîş nazanêt!” (2010 p44).

Kewate firajûtinî sîstemî nûsîn be zimanî xo karîgerî heye Leser geşey nasnamey zarok û cewan. Le welatêkda ke zimanî zorîne hênde behêz bêt, wek pâgez zimanî swêdî le Swêd, mirov pêwîstî be yarmetîy behêz heye bo ewey twanay nûsîn be zimanekey dîkeş derfetî firajûtinî hebêt bo astêkî baş.

## Zimanêkî firajûy nûsîn

<sup>165</sup> Dîktamen: dictation, îmila, nûsînewey têkstêkî kesêkî dîke deyxwênêtewe.

<sup>166</sup> Cûtsewad: biliterate, sewad be dû ziman.

Cudawazîy nêwan zimanî axaftinî rojane û zimanî nûsîn bedem helkişanî fêrxwaz le polekanî fêrgeda, heldekişê. Fêrbûnî nûsîn le temenêkî berayîda sûdî eweye nûsîneke be zimanêk debêt zor nêzik le zimanî axaftinyanewe. Ew demey zarok xoy le nêw prosekedaye bo peredan be twana bineretîyekanî xwêndindewe û nûsîn, debêt ew zimanî nûsîney xerîkî debin, sakar bêt. Herçî berokgîrîy zimanekîy heye debêt bikewête beşî axaftinewe.

Lêreda mebest ewe nîye rêge le zarok bigirîn û rê nedeyn têkstî weha bixwênêtewe ke be sextyan dezanîn, wek ewey le şêst û heftakanî sedey bîstemda rûy deda, yan rêyan bideyn tenha têkstêkî rûnkirawe bixwêndinewe. Belkû mebest eweye heta zarok degate astêkî helkişawtirî sewad, weha başe berokgîrîy zimanekî bikewête beşî axaftinewe.

Prosey fêrbûnî zimanî nûsîn, karîgerî heye leser firajûtinî ziman lay zarok, lewaneye emyan kemêk xaw bêtewe û lewaneyîşe paşekîşe bikat. Xo aşkiraye ke fêrbûnî nûsîn wizeyekî zor debat. Katêk berokgîrîy zimanekî dexirêne beşî axaftinewe îdî dijwarîy zor zêdetir nakewête ser sewad. Her katêk twanay zarok le sewadda geyîşte astêkî helkişîw ewsa dekirêt nûsîn bikeyne cilewkêşî geşey zimanyan.

Em xale betaybetî girînge bîrî lê bikeynewe ger zarok kêşey hebêt letek firajûtinin zimanî nûsînda û maweyekî zorî biwêt heta degate astêk rêjewî baş bêt. Bo ewey kosp nexeyne rêy firajûtinî zimanyan, girîne berkewtî zimanî helkişîw bikewête beşî axaftinewe û zarok dine bidirên xoyan le gutarda bekarî bihênin. Ew zarok le temenêkî zûda rêjewî xwêndinewey baş bêt, xoy detwanêt bigat bew zimane le rêy xwêndinewey kitêbî xoyewe belam ewey pêwîstî be katî zêdetire bo geyîştin bew aste, pêwîstî be yarmetîy mamostaye, bo nimûne kitêbî bo bixwênêtewe yan pêwîstî be dinedane bo ewey be şêweyekî zarekî babetî sextitir û hevbendîy aloztir derbibirêt.

Christie (2005) rûnî dekatewe ke mewdagirtin le *“êsta û êre”*, ewey begîştî nûsîn deybeşê, karîgerîy taybet deafirênin. Yekem karîgerîyekî tojer repêşî dexat amajey be jêder, wirtir bilêm dû akarî ew karîgerîye: têkstî têkbeste çon saz dekirêt û çon le têkstda amaje be kes û kala dekirêt. Le axaftinda zor car bestên, tondanan (gorînî tonî deng) û zimanî ceste debine yarîder bo amajedan be kes û kala:

- dekirêt ewem bideytê? (amaje dekat bo kalake)
- emeyan baştîre. (kalake dehênête pêş)
- eweyanim pê baştîre. (amajeyek be ser dekat)

Le nûsînda debêt mirov be têkst amaje bidat. Le axaftinda jêder begîştî diyarîkirawe, wek ewaney serewe, wate mirov bas le kesêk yan şitêkî diyarîkiraw dekat. Belam le têkstî serbe siruştasîda, amaje giştî.

*“Gerçî hezaran cor dirext le nêw “çomelan”<sup>167</sup> -î germesêr<sup>168</sup> -da heye, keçî daristan yekşêwaz xoy deniwênêt”. (lêreda bas le corêkî taybetî dirext û çomelanî diyarîkiraw nîye, bas le daristanêkî taybetî nîye, bas be giştîye le corî dirext, çomelan û daristan.)*

<sup>167</sup> Çomelan: rainforest, biriwane Celîzade, *“Zarawesazîy pêwane”*.

<sup>168</sup> Germesêr: tropics, ew parçeyey zewîye ke *“kemerey zewî”* equator nêwendî degirêt û dekwête nêwan dû *“kemerey qrijal”* Tropic of Cancer û *“kemerey karjole”* Tropic of Capricorn.

*“Masî ger le qûlayî pitir le sed meter bijîn begîştî rengêkî zîwpoşyan heye”. (bas lem masîyaneye begîştî, nek corêkî taybet.)*

Cudawazîy nêwan jêderî giştî û taybet, nimûneyeke le diyardey zimanekî ke zarok debêt le fêrge fêryan bêt bo ewey bizanêt çon janre û têkstî cudawaz cuda bikatewe. Christie bas le “*pêşrewtî mijarekî*”<sup>169</sup> û “*têrpeyvî*”<sup>170</sup> û herweha zimangorkê le kesî yekemewe bo kesî sêhem, dekat. “*Pêşrewtî mijarekî*” bas le berewpêşçûnî têksteke dekat. Le zimanî swêdîda begîştî em pêşrewtîye bewe dekeyn ke le destpêkî rîsteda dadenrêt. Eme nimûneye le nûsînî dû kîjoley polî sêhyem:

*Çi hawînêkî seyre!*

*Hebû nebû kîjêk hebû, nawî Sozan bû.*

*Ew hawînî zor la xoş bû.*

*Rojêk ew le xew rabû*

*Şitêkî seyrî bînî.*

*Bînî befir debarêt.*

*Ew çûwe lay dayikî û pê gut.*

*Dayikîş zor xeminak bû*

*Çunke dezanêt*

*Sozan çendî hawîn pê xoşe*

*Û carê mangî gelawêje*

*Başe eme key katî befirbarîne*

*Belam dilnyaş nebû*

*Aya birwa bew guteye bikat*

Debînî ke kîjolekan dastanekey xoyan be seredêrêk û paşan be “*hebû nebû...*” dest pêdeken. Bem core dezanî ke eme çîroke û be destewajey “*hebû nebû...*” nûseran xoyan le têksteke dadebirin ke bem core dexirête janrey dastanewe. Ewca paş nasandinî şakes: “*Sozan*”, deykene mijar: “*ew*”. Destpêkî dîkey lêreda bekar dêt birîtîye le “*hevgir*” û “*pahevgir*”<sup>171</sup> (ewca, w, wek, bo, belam) û yek carîş awelkarî kat “*rojêk*”. Eme şêwazêkî bawe bo dariştinî “*pêşrewtî mijarekî*” le çîrok û bêjandinî sakarda. Be heman şêwaz têkstî axaftin û nûsîn dêne dariştin.

Katêk delêyn têkstî serbe kitêbekaî fêrkarî babetî corawcor pitir “*têrpeyvî*”, wate agadarîyan têda çirtire, betaybetîy le têkstî serbe siruştasîda. Emeş bo fêrxwazî serbe zimanî dîke ke hêştî zimanî swêdîyan le ast hawpoleanyan nîye, dekatewe seredawî kemtir le têkstêkeda ger wişe û destewajey têdaye bêt lêyan namo bin. Lêreda piştîwanî le mamostawe girînge ke be wêne, amaje û şêwazî dîke ew zaniste rûn bikatewe.

Le serewe nimûnekey “*hebû nebû*” man bînî. Nûseran, bew destpêke mewda le baseke degirin û pêşanî deden ke xoyan beşdarî çîrokeke nîn. Bekarhênanî kesî sêhem rêgeyekî dîkeye bo nûser

<sup>169</sup> Pêşrewtî mijarekî: thematic progression, pêşrewt le mijarêkî taybetda, bo nimûne nûsîn, xwêndinewe... htd.

<sup>170</sup> Têrpeyvî: lexical density, çîrîy ferhengî, çemikêkî taybete be şîrovey têkst: text analysis, mebest lêy rêjey şawîşeye beranber wişey rêzimanî. “Şawîşe” lêreda dekatewe naw, awelnaw, zorbey kar û zorbey awelkar. Wişey rêzimanî dekatewe: cênaw, amrazî hemecor, karî yarîder, beşêkî awelkar û awelnaw. Serçawe: <https://www.grammarly.com/handbook/organization-and-development/text-level-measurements-adequate-writing/2/lexical-density/>

<sup>171</sup> Pahevgir: subordinate conjunction, hevgirî lawekî.

mewda bigirêt le têkst û le xwêner, bo xo rehakirdin le ezimûnî rastewxoy kesekî. Girînge fêrxwaz derfetyan hebêt bo kar letek têkstî corawcor biken, bo nimûne le riwangey kesî yekem, dûhem û sêhemewe binûsin û ewca gutûbêj saz biken derbarey karîgerîy corawcorî ew têkstane.

### Peredan be stratêjî helkişîwî sewad

Girînge zarok, paş firajûtine berayîyekey sewad, ke têyda aşinay binemakanî nûsyîn debin, pêş bikewin û pere biden be stratêjî helkişawtirî sewad ke pêwîstyan debêt le xwêndinî balatirda. Ke dête ser stratêjî xwêndinewe zor car debête bas le xêrayî xwêndinewe. Eweş asayîye çunke girînge xwêndinewe xoşrewt bêt, hawkat debêt fêrxwaz fêrî “*hunerî xwêndinewe*” -y cudawaz bêt, şêwazî cudawazî xwêndinewey têkstî cudawaz. Raste xwêndinewey teknîkî girînge, belam xwêndinewe debêt perey pê bidirêt û fêrxwaz fêr bêt helwîstêkî rexnegirane le têkst bigirêt. Çend twanayekî xwêndinewe lay zarok ke debêt geşeyan pê bidirêt, emanen:

- xwêndinewey banîwêne
- xwêndinewey babetdozane - bo dozînewey babetêkî diyarîkiraw le nêw têkstda
- twanay helbijardinî layenî here girîng le têkstda
- xwêndinewe le amanc û mebestî cudawazewe
- wirdbûnewey rexnegirane lewey dexwêndirêtewe
- lêkdanewey têkst
- xwêndinewey afirênerane

Pêwîst nîye em firajûtine çawerê bêt heta salanî helkişawtirî fêrge. Xwêndinewey rexnegirane, gutûbêj derbarey lêkdanewey corawcor û xwêndinewe rûwe amancî corawcor karêke mirov letek fêrbûnî xwêndineweda detwanêt xerîkî bêt û sûdî lê bibînêt. Le civakî em rojgareda ke rêjewêkî gewrey agadarîy heye û zarokîş degirêtewe, girîngey zarokîş fêrbêt helwêstî rexnegirane le têkst bigirêt. Fêrxwaz, bedem salanî fêrgewe pêwîstyan debêt be helkişan le xwêndinewey têkstî serbe fakt le babetî corawcorda. Wate debêt fêrbin pêrist û serencam bekar bihênin û herweha fêrbin le xwêndinewey saxtarî têkstewe şamebest bidozinewe. Wate, her bo nimûne, fêrxwaz be xwêndinewey nawinîşanî babet û dêrekanî destpêk, bitwanêt serencamêk le têksteke derbikat.

Ke dête ser xwêndinewey kitêbî fêrge, lêkdaneweş bo wêne, nîgar û xişte û sûdmendbûn lêyan bo têgeyiştin le têkstî nûsiraw, basêkî girînge. Kewate girînge fêrxwaz derbaz bin lew sinûrey weha dexwazêt mirov bo têgeyiştin le têkst, pît be pît û le bergewe bo berg bixwênêtewe û pîtkarane têkst lêk bidatewe. Zarok pêwîstyan heye pere be twanay xoyan biden bo cilewkêşîy xwêndinewey xoyan, bo nimûne, dozînewey stratêjî baş bo yadaştgirtin. Bew core firajûtinî xwêndinewe û nûsîn yekdî pelkêş deken û xwêndinewey çalak derfet derexsênêt bo rahatî be stratêjî corawcorî nûsîn. Dysthe et al. (2002) şêwazî hemecorî yadaştinûsî rûn dekatewe, bo nimûne dûcar yadaştinûsî û “*nexşey bîr*”.

Paşan fêrxwaz pêwîstî debêt be peredan be twanay nûsînî têkstî hemecor. Corekanî nûsîn le fêrgeda zorin, bo nimûne: *bêjekî, rêniwên, ravekar, rûnkar û belgekar*. Fêrxwaz debêt fêrbin cudawazîy heye le nêwan têkstêk derbirîn bêt le dilgerimîy kesekî û têkstêk daway helwêstêkî babetbîn bikat. Dysthe et al. (2002) em core dûhemî nûsîn dekate dû beş: *bîrnûsî*<sup>172</sup> û *pêşkeşinûsî*.<sup>173</sup> Ewey yekemyan nûsînî

<sup>172</sup> Bîrnûsî: têhelkêşkirdinî bîrkirdinewe û nûsîne, bîrkirdineweye be nûsîn. Peydozî û peycorî û rêşedoziy bîre bedem nûsînewe bo rûnkirdinewey ew bîre bo xo, nek bo beranber.

<sup>173</sup> Pêşkeşinûsî: nûsînêkî ciwan darêjraw bo pêşkeşkirdin dest bidat. Berhemekey bo danûstanî peyam û nêweroke letek wergirda, leber ewe behendgirtinî beranber girînge.

tazebabete, wek defterî yadaşt, tomarî rojane û reşinûs, ewey dûhem dariştinewey zaniste, bo nimûne puxtêy bas, raportî zanistî û serencam. Fêrxwaz debêt, paş fêrbûnî astî berayî nûsîn, em core cudawazaney nûsînş fêr bêt. Leber ewe fêrkirdinî sewad nabêt erikî tenha mamostay zimanî swêdî bêt, belkû debêt mamostay babetekanî dîkeş bixene bernamewe bo ewey fêrxwaz yarîderî hebêt le sewadî corawcorî gişt ew babetane.

Girînge mercekanî fêrbûnî nûsîn û xwêndinewey zor tîjrewane helnekişên. Bo yarmetîdanî xobawerî zarok, girînge firajûtinî berayî nûsîn le şêwazî gemeda û beder le mercî giran biçerxêt. Wîst û arezû bo fêrbûnî sewad hokarî handerî girîngin. Leber ewe gişt core nûsînêkî xobexoy beder le mercî dirustayetî başe bo aste berayîyekanî nûsîn. Paşan ke fêrxwaz pêwîstî be fêrbûnî stratêjî aloztir debêt, mercekan heldekişên.

Lêreda, bernamerêjî kat û bestenewey corî rahênan be temenî cudawazewe, basêkî tewaw nacore. Ewe mamostaye, be karameyî xoy û be aşinabûnî be pêwîstîyekanî fêrxwaz, biryarî rewî kar û kat dedat. Xulyay fêrxwazîş hokarêkî handerî girînge. Leber ewe debêt derfetî tewaw bidirête fêrxwaz xoy babetî sewadeke helbijêrêt, mamostayîş diney dedat bo dozînewey buwarî niwê û şêwazî derbirînî niwê.



## Pajî heftem: Janre le berayî temenda

*Fêrxwazî serbe zimanî dîke pêwîstî heye be jîngeyekî zengînî ziman û ferheng, be stratêjî zor û be derfetêkî firewan bo peredan be gişt norekanî xwêner.*

*(Gibbons 2006, p119)*

Salanêke “pêdagogîy janrebîn” -î Awistralyazade birewî le nêw fêrgey swêdîda peyda kirdûwe. “Pêdagogîy janrebîn” delêt fêrxwaz debêt ew “şêwaz” -e cudawazaney nûsîn fêr bin ke le bestênî corawcorda dêne bekarhênan, betaybetîş le babete corawcorekanî fêrgeda. Janrey corawcor xawen mebest, saxtar û adgarî zimanekîy corawcorin.

Babetekanî fêrge, cige lewey şêwazî corawcorî ziman û çemikî corawcor bekar dehênin, saxtarî nûsarişyan cudaye. Le babetî wek matematîk, fîzya û kîmyada, zor car ristey kurtî pir le fakt be derbirîn û çemikî taybetewe dête bekarhênan. Beme degutirêt: *nûsyareke têrpeyve* (agadarîy têda çire). Le babetî wek civaknasî û mêjûda, weha bawe nûsyareke pitir *bêjekî*<sup>174</sup> bêt. Em şêwazî nûsîne dirêjtire û zimanêkî pitir ravekar bekar dehênêt. Mirov çawenore fêrxwaz berhemî nûsirawî xoy le babetî cudawazda be zimanî cuda pêşkeş bikat. Raportêkî ezimûngey fîzya zor cudawaze le nûsarekî serbe civaknasî yan mêjû.

Le civaknasîda weha bawe fêrxwaz be xwêndinewey xoyan agadarî le serçawey hemecorewe gird bikenewe û be nûsîn ew agadarîyane darêjinewe. Le babetî siruştasîda weha bawe fêrxwaz nûsînekey xoyan be nîgarkêşî, ezimûnkarî, wêne û dayegiram pir bikenewe û lêreda fêrxwaz debêt be endazyekî beriztir peyrewî rêşakanî nûsîn bikat.

Leber eweye “pêdagogîy janrebîn” delêt girînge le fêrgeda yarmetîy fêrxwaz bidirêt bo afirandinî nûsarişyan xawen mebestî cudawaz. Gibbons (2006) rêbazêkî taybetî karî heye le “pêdagogîy janrebîn” da, be modêlî baziney peredan be nûsînî fêrxwaz le janrey corawcorda, “modêlî bazine” nawzed kirawe. Em modêlî bazineye bas le çîwar ast dekat:

1. Helbestinî zanist le buwarî babetekeda
2. Tojînewe le têkstî ser bew buwarey babet bo peydakirdinî nimûne
3. Nûsînî têkstêkî hawko
4. Nûsînî têkstî kesekî

Deşêt em modêle bo karkirdin derbarey mijarêkî taybet, “mijarkarî”, bixirête ger û lewaneye çend hefteyek bixayenêt ta her çîwar asteke deçerxn. Gibbons cexit dekat leser ewey em modêle “reçete” nîye peyrewî bikirêt, bigire amrazêke bîdeyte fêrxwaz bo firajûtinî serferaz û afirande. Le kitêbekey xoyda (Gibbons 2006) zor pêşnyazî hemecor dedat derbarey rahênan bo têhelkêşkirdinî giwêradêran, axaftin, sewad letek nêwerokî babetî le buwarî corawcorda. Le pajey dehemda seredawêkî dîkeş pêşkeş dekem derbarey çerxandinî sewad le “mijarkarî” da.

---

<sup>174</sup> Bêjekî: narrative, têkstî bêjekî wate têkstêk serbe janrey bêjandin, gêranewe bêt. Biriwane: bêjandin: narration.

## Fêrkirdinî nûsîn “patewpat” bêt yan na

Rexneyekî baw heye delêt “pêdagogîy janrebîn” modêlêke be radeyekî beriz rêsabend û normbexşe. Emyan cudawaze lew “*pêdagogîy nûsînî prosebîn*” ey le heştakanî sedî bîstemda birewî hebû. Le fêrgey swêdîda boçûnêkî baw hebû deygut fêrxwaz xoyan le rêy bekarhênanî têkstewe fêrî şêwazî corawcorî nûsîn debîn. Wehayîş çawenor dekira fêrxwaz be şêweyekî automatîk fêrî stratêjî corawcorî nûsîn bibin.

SFL û “pêdagogîy janrebîn” delêt fêrxwazî serbe zimanî dîke, herweha fêrxwazî serbe zimanî yekemîş ger le derewey fêrge berkewtyan letek şêwazî corawcorî nûsîn nebêt, ziyaxor debîn, meger fêrge patewpat derfetî rahênanî ew babete birexsênêt ke çawerêyn fêrxwaz bîzanêt. Gibbons (2006a) û tojeranî dîkeş le bizavî janrebînda delên, ger ew şêwaze corawcoraney têkst patewpat le fêrge da repêş nexirên, peredan be karameyî pêwîst, bo fêrxwazêkî le derewey fêrge berkewtî nebêt letek ew şêwazaney têkstda, dijaware.

Lêreda mebest geranewe nîye bo fêrkirdinî nerêtîy rêziman û rahênan be diyardey dabiraw le bestênî xoy. Be boçûnî Gibbons mebest le “*fêrkirdinî patewpatî nûsîn*” debête:

*Fêrxwaz han dedirên bîr bikenewe lewey ziman çon bekar debirêt bo mebestî firecor û le ast bîser û xwênerî zor cudawazda. Mamostayîş cexit dexene ser rûkarî zimanekîy weha fêrxwaz fêrî ew hunere biken. Em modêle handere bo beşdarbûnî çalakane le fêrbûnda, bo nûsînî serbexo û bo twanay xwêndinewey rexnegirane le şêwazî bekarhênanî ziman le bestênî resenda, bo nimûne bekarhênan be mebestî firîwdan.*

(Gibbons 2006, p. 91)

## Pêdagogîy janrebîn

Fêrgey Swêd zor car bo fêrkirdinî sewad tewaw serincgîrî “bêjandin” e. Xwêndinewey çîrok û dastan, herweha nûsînî azadaney fêrxwaz xoy, begîştî pêgey selmênirawî xoy heye le karûbarî fêrge da. Emeş diyardeyekî siruştîye, çunke bestinewey xulyay zarok bo çîrok û dastan be firajûtinî sewad lay zarok, karêkî guncawe.

“Pêdagogîy janrebîn”, ke tund wabestey “*zimanewanîy sîstemdarî karkird*” (SLF) e, cexit dexate ser ewey şêwazî dîkey zimanîş sûdî heye bo zaroxane û salanî berayî fêrge. Frances Christie (2005, p. 149) em janrane diyarî dekat:

- Peyrewkarî (rutîn)
- Bêjandinewe
- Bêjandinewey peyrewkarî
- Bêjandin
- Raport
- Rûnkirdinewe

Gerçî deşêt janrey dîkeş le salanî berayî fêrge da peyda bin belam Christie pêy wehaye emane girîngin. Minîş le nêwyanda “*bêjandin*” be janrey here girîng dezanim û lêreda deykeme destpêk.

## Bêjandin

Bêjandin (narration), girînge bo firajûtinî zimanî zarok, betaybetîş bo firajûtinî fêrbûnî nûsîn layan. Le bêjandinda rêk hunerî “monolog”, berdeyamîy gutar bo maweyekî dirêjtir û derbirînî bîrokey dirêjmewda dêne rahênan. Bêjandin debête rahênan hem bo axêwer û hem bo bîser/xwêner pey berin be bîrî kesêkî dîke û beweş mewda bigirin lewey dête gutin. Bêjandin rahênanî twanay zimanekîşî bedemeweye, bo nimûne bekarhênanî zimanêkî pitir wird û patewpat, be destewajey helkişîwî navekîyewe û herweha rahênanî nûsyarbest,<sup>175</sup> wate dariştinî nûsyar û hajûtinî berew pêş. Christie (2005) em saxtare xiştekiyane bo bêjandin diyarî dekat: sererderî - alozkan - çareser û kotabûn.<sup>176</sup> Ferimûn emeş têkstêke le berhemî fêrxwazêkî polî dûhem:

### *Gerdûn*

*Min û segekem be siwarî galîske sûrêkiman da be dewrî hesarey Hurimz (Jupiter) da segekem ew<sup>177</sup> xerîk bû bimirêt. Min çaketekey xomim daye û bewe kemêk gerim bowe. Paşan geştî Zewî-man kird û lewê naniman xward û xoman gerim kirdewe. Deba le mal bimênîn. Geşt xoşe belam xane xastire.*

Debînî em fêrxwaze berêweye fêrî hunerî bêjandin bêt. Lêreda, gerçî le ristey yekemewe dezanî bêjaneke derbarey çîye, belam “sererderî” yekî rûn le şakes (kesayetî yekem) û babetî nûsîneke peyda nabêt. Paşan “alozkan” êk dête pêş û ser denêt be “çareser” û “kotabûn” ewe.

Deşêt le zaroxane û fêrgeda, bêjandinî zarekî, wek amadebaşî seyr bikirêt berew peredan be zimanî nûsîn. Bêjandin corêke le nûsyar û pê deçêt hebêt le gişt civak û ferhengî mirovda. Bêjandin pirdêke bo giwastinewe zanyar le mirovêkewe bo mirovêk û le neweyekewe bo neweyek. Le civakêkda nûsîn kara nebêt, bêjandin debête parêzerî “yadî koyekî”,<sup>178</sup> bo parastin û peredan bew zanyarey gird botewe. Mêjûy grûpêk bo nimûne le rêy bêjandinewe zîndeparêz dekirêt. Le civakî nûsînbederda çend kesêkî diyarîkiraw erikî bêjandinî babetî girîngiyan pê radespêrdirêt, bo nimûne *nejadnasî*,<sup>179</sup> mêjûy xêzan û rêsay biryarde. Bêjandinî lem babete zor car şewazî honrawe degirine xo çunke bo yadewerî hasantire.

Ferhengî cudawaz, şewey bêjandinî cudawazî helbestûwe û bêjandin lewêda be şewazî cudawaz û le derfetî cudawazda dêne kayewe. Lay zorbey xêzanî rojhelatî Afirîka, weha bawe aşpezîy bikewête êwarey tarîkewe, çunke tarîkî rêge le karî dîke degirêt. Aş le ser agirî kiraweye û kulandin karêkî katxayene, car heye çend kajêrêkî dewêt. Emeş derfetêkî xoriske bo jin û zarok le dewrî agir, yan le aşpezxane, bo bêjandin xir bibinewe. Piyawan lew kateda deçîne seredanî yekdî û le nêw ewanîşda bêjandin diyardeyekî girînge.

Lew ferhengey min salanî 1999-2003 têyda xerîkî tojînewe bûm, le nêw gelî Nyambo -da le deverî Karagwe -y xoraway bakûrî Tanzanya, şewazî hemecorî bêjandin geşey kirdibû (Wedin 2004).

<sup>175</sup> Nûsyarbest: cohesion (linguistics), bestênêkî rêzimanî *grammatical cohesion* yan wişedanî *lexical cohesion* ye le nûsînda riste û destewaje leyek girê dedat bo bexşîni wata.

<sup>176</sup> Sererderî - alozkan - çareser û kotabûn: *orientation-complication-resolution*.

<sup>177</sup> Heley tayp nîye, mindaleke wehay nûsîwe.

<sup>178</sup> Yadî koyekî: collective memory, zaraweyeke bo derbirîn le yadewerîyekî mirovgel, çend kesêk bin yan gel û gelanî serleber.

<sup>179</sup> Nejadnasî: genealogy, mêjûy nejad û peywestî xêzaneke.

Mirovgel le barî hemecorda dekewtine basî rûdawêkî agadarî bûbin. Le dîdarî êwaranî piyawanda, zor car siyaset xoy dekirde bas û lêreda derbirînî zimanekîy weha helkişaw dehate derbirîn lay cewanan tewaw berderik nebûn.

Le nêw jin û zarokî aşpezxaneda çîrokî nerêtî beser dekiranewe ke têyanda piyaw, jin û zarokekanyan dehatine berbas. Zor car goranî debûne beşêk le bêjandinî lem core û paşan be guteyekî pendamêz danîştineke gird dekirayewe. Be roj kuran xerîkî şîwanî û gawanî bûn û le nêw ewanda corêkî dîkey bêjandin geşey dekirde wirdekarî û metelî dekirde binema.

Shirley Brice Heath (1983) bas le civakî Piedmont Carolina dekat û pêşanî dedat çon nerêtî bêjandin le nêw çînî maminawendî reşpêstda çend bertawî nûsyare dînîyekane, betaybetî Tewcîl. Lêkdanewey zor wirdî Tewcîl be girîng dezanira û gutarî xokirdî xeyalzade be diro. Belam her lewê, le nêw çînî kirêkarî reşpêstda, bêjandinî xeyalkird beriz denirxêndira û basekanî nêw govarî heftane cêy taybetyan le bêjandinda degirt.

Le zaroxane û fêrgeda girînge mamosta piştîwanî le bêjandinî zarok biken, bo nimûne be rexsandinî derfert bo bêjandinyan. Le Amerîka diyardey *sharing-time* bawe ke derfet dedate fêrxwaz bo yektir bêjin. Le Swêd-îş, be taybetî le zaroxane, “baziney beyan” corêke lew base. Lem doxeda girînge yekbeyekî zarok derfetî hebêt bo gutey dirêjmewda. Car heye mamosta bo ewey derfetî bêjandin bidate gişt zarokan, mawey her yekeyan kurt dekatewe, belam girînge her fêrxwazêk derfetî hebêt bo derbirînî bîrî dirêjmewda û bêjandinî dirêjxayen. Deşêt dûwarojî hefte dawa le dû - sê fêrxwaz bikeyt le rojanî pişûda basêkî taybet amade biken bo bêjandinî seretay hefte. Yan dawa le çend zarokêk bikeyt rojêkî diyarîkiraw bûkeleyekî xoyan bihênin bo pol û le dîdarî beyanyanda, basî lê biken.

Norey mamosta le barî wehada birîtiye lewey mewday bêjandin bo zarokî axêwer terxan bikat, wate karêk bikat zarokî dîke bêdeng û serincgîr giwêradêrin bo gutey axêwer bo ewey emyan bitwanêt bê nobebirî gutey xoy pêşkeş bikat. Ger pêwîstîş bû, mamosta detwanêt le rêy arastekirdinî pirsiyarewe, yarmetîy zarok bidat, betaybetî biçûkekan, bo pêşkeşkirdinî agadarîy zêdetir û rûnkirdinewey mebest. Mamosta bemcore detwanêt yarmetî zarok bidat bo peredan be çîrokekey xoyan û bo helkişanî twanay bêjandinyan.

Deşkirêt zarok han bidirên bas le nîgarkêşîy xoyan biken. Paşan dekirêt em bêjandine helkişêt bo nûsîn derbarey ew nîgarkêşîyey xo, ewca bigate dariştinî çîrokî xosaz, be wêne û têkstewe û pêşkeşkirdinî bo hemû poleke.

Wêney xokirdî zarok corêkin le bêjandin. Mamosta ger beperêz bêt le derbirînî behabexî wek “ciwane!”, “başe!” û lebirî ewane fêrxwaz han biden bas le wênekanî xoyan biken, debête yarîder bo firajûtinî bêjandinî zarok. Geşekirdinî twanay nûsîn lay beşêkî zorî zarok rêk wênekêşane û têkstî bo peyda debêt, destpêk kesî riskaw gutey zarok denûsêtewe û debête têkstî wênekan, paşan wirde wirde zarok xoy bedem fêrbûnî nûsînewe wênekan be têkst derazênêtewe. Emeş debête perîneweyekî xorisk le bîrokewe bo têkst le rêy wênewe.

Zarokî dîke hen “*gemenûsîn*”<sup>180</sup> (Eriksen Hagtvat 2002) û “*berenûsîn*” (Liberg 2006) dekene derwazeyek rûwew firajûtinî twanay nûsîn. Zarok pey debat bewey kesani gewresal denûsîn û xoyişyan bo bêjandin dest dedene “*nûsîn*”. Car heye “bêjandin” î dirêjxayen dene tomarkirdin. Car heye be çawî gumanewe seyrî em core nûsîne kirawe ke hunerî nûsînî nerêtî bekar nahênêt. Dîdî bertawî *rewîştayetî* pêy wabû em core “*gemenûsîn*” e karîgerîy nayetî<sup>181</sup> debêt leser firajûtinî nûsîn lay zarok. Belam tojînewekanî em çend saley dûwayî pêşanî dawe ew nîgeraniye binemay niye.

<sup>180</sup> Gemenûsîn: mebest ew xetuxaleye zarok be nyazî nûsîn deyankêşêt.

<sup>181</sup> Nayetî: negative, nêgetîv, nerênî.

Tojînewekey Kjertmann (1999) le Danmark pêşanî dawê ke “gemenûsîn” î zarok dinederî ayetî<sup>182</sup> heye leser firajûtinî nûsîn lay zarok.

Tojer Ulrika Leimar rêbazî “*xwêndinewe leser binemay axaftin*”<sup>183</sup> pêşkeş dekat ke têyda nûsînewey çîrokî xo le layen zarokewe le fêrgeda dekirête rêbazêk bo geşedan be fêrbûnî nûsîn. Mamosta defterî wênekêşî bo fêrxwaz amade dekat, fêrxwaz wêney çîrokekey xoy dekêşet û mamosta le zimanî fêrxwazekewe çîrokî wêneke le perawêzîda denûsêtewe. Fêrxwaz nûsînekey mamosta pir dekatewe û paşan wirde wirde dest beser prosew ew çîrokinûsîyeda degirêt û degat bewey xoy çîrokî dirêj binûsêtewe. Ewca têkstekan le polda bo fêrxwazan dexwêndirênewe. Bem core bêjandin dekirête binemayekî girîng bo peredan be nûsîn û zarok dekewête nûsîn derbarey doxêkî resen, le bestênêkda ke zimanî zarok xoy debête derawî têkst, “*xwêndinewe leser binemay axaftin*”, le bestênêkda ke têkst wergirî siruştî debêt: hawpol, mamosta û dayikûbab.

### Giftûgo derbarey bêjandinî zarok

Girînge ewey fêrxwaz deynûsêt hem watay hebêt û hem wergir (xwêner) î siruştî. Tojînewekey Dyson (1997) pêşanî dedat girînge kesanî gewresal le dewrûberî zarok girîngî biden bewey fêrxwaz deynûsin. Zarokî pênc ta no salan çîrokî xoyan denûsî û lewey pêy degutirêt *Author's Theatre* (1997) pêşanî yekdyan deda. Derfetî rahênan dediraye zarok têkstî xoy bixwênêtewe û yarmetîş dedira çon ew têkste pêşkeş bikat. Em derfertaney niwandin kirane boney girîng bo kobûnewe.

Bew şêweye nûsînî zarok xoyan debine serşar bo axaftin derbarey têkst û firajûtinyan û her zû pirsî firecor dêne berbas, bo nimûne: çîye weha dekat têkst serincgîr bêt, mirov çî bikat başe bo ragirtinî têkst le seretawe heta bineta, kamyar bekarbihênîn başe kesî yekem yan sêhem, demî êsta yan raburdû.

Le berayî bêjandinî zarokda girînge mamosta amade bêt bo bîstinî şêwazî firecorî bêjandin. Zarok le destpêkda be nerêtî corawcorî bêjandinewe dêne fêrge. Ew şêwazey le çîrokî zarokanda bawe û delêt: “*hebû nebû...*” û paşan be “*çepkêk gul û çepkêk nêrgiz...*” tenha corêkin le çendîn corî çîrokbêjî le cîhanda. Lem serdemî mêdyayeda her fêrxwazî serbe zimanî dîke nîn ke nerêtî gêranewey cudawazyar heye. Zarok fîlimî kartonî serbe ferhengî dîke debînin. Lem salaney dûwayîda kartonî zarokanî japonî birewî peyda kirdûwe û zor mindal rahatûn bew saxtarî bêjandiney têyanda heye.

Gutûbêj derbarey nerêtî cudawazî bêjandin û berawirdkirdinî bo nimûne “*Manga*”<sup>184</sup> -y japonî, *Disney* amerîkayî letek çîrokî zarokanî xomalîda basêkî serincrakêşe legel zarokî gewretirda bête encam. Bêjandinî “*manga*” bo nimûne, dirêjxayenin, lewaneye çendîn berg kitêb pir bikenewe belam dîsan sereta û binetay aşkirayan heye. Çîrokekan zor car hestî firecor û kesanî serbe temenî cudawazî têdaye. Çîrokiyan heye lay gewre berxwaste, heyîşe lay zarok, heye lay kur birewî heye, heyîşe lay kîj. Berawirdkirdinî em şêwazî bêjandine be şêwazî *Disney* û şêwazî xomalî, karêkî lebare.

Girînge mamosta sînefirewan bêt û fêrxwaz han bidat zimanî xoyişyan le bêjandinda bekar bihênin. Bo fêrxwazî tazehatûy em welate, bêjandin be zimanî xoyan debête rêgeyek berew fêrbûnî zimanî swêdî. Zûtir basiman le terxankirdinî derfet kird bo nûsîn be zimanî xoyan, ger bîzanin. Be yarmetî, bo nimûne mamostay zimanî dayikza, yan her kesêkî dîke ew zimane bizanêt, dekirêt nûsînekan tercemey swêdî bikirên. Bew core sûd le zimanzanîy zûtirî fêrxwaz debînrêt bo geşekirdinî

<sup>182</sup> Ayetî: positive, pozetîv, erênî.

<sup>183</sup> Xwêndinewe leser binemay axaftin: *Läsning på talets grund – LTG*.

<sup>184</sup> Manga: çîrokî wênedarî japonî, kartonî japonî.

swêdîyekey. Bo fêrxwazî dîkey maweyekî dirêje le Swêdin, nûsîn be herdû zimaneke debête hander bo firajûtinî herdû ziman.

Jim Cummins (2006) basî dekat çon projeyek le Kanada çalakane fêrxwazî han deda bo nûsînî fireziman. Zarok geldest têkstî xoyan denûsî. Cummins bas le sê kiç dekat be reçekek pakstanî û zimanî îngilîzî û urdû-yan be piley cuda dezanî. Emane wêkira têkstêkiyan darişt be herdû ziman, em dîwî be zimanî urdû, ew dîwî be zimanî îngilîzî. Em nûsîne geldeste bûwe yarîder bo peredan be nûsînî herdû zimaneke lay hersêkiyan. Ewey le urdûda zal bû lem beşeda yarîder bû, ewey le îngilîzîda serdest bû, lebeşekey dîkeda. Em kare letek zarokî biçûkîşda dekirêt. Ew têkst yan wişeyey denûsirêt le pena wênekey zarok kêşawyetî, dekirêt be yarmetîy kesanî dîkey dewrûber, be zimanî mindalekes binûsirêt.

Teknîkî dijîtal derfetî hemecor bo bêjandin terxan dekat, hem be bernamey karlêk û hem be amrazî corawcor bo nûsîn û nîgarkêşî. Înternêt û destawêjî hemecorî tercemekar derfetî peywendî û danûstan be zimanî corawcor dedate fêrxwazî seranserî cîhan. Fêrxwazî fireziman le buwarî wehada derfetî xoriskî debêt bo bekarhênanî nûsîn be zimanî cuda bo danûstan. Înternêt derfetîş terxan dekat bo azugiwêzî têkstî serbe karûbarî fêrge letek fêrxwazî şiwênî dîke. Înternêt derfetî danûstan terxan dekat letek fêrxwazanî welatî dîke, be îngilîzî yan her zimanêkî dîkey deyzanin.

Repêşxistinî zimanî zarok le karûbarî zaroxane, polî amadekar û fêrgeda behayekî hêmakarî gewrey bo zarok heye. Hélot & Young (2006) bas le projeyekî fransî deken, polekan fêrxwazî firezimanyan zore. Lem projeyeda dayikûbabî fêrxwaz banghêşt dekirên bas le ziman û ferhengî xoyan bo mindalekan biken. Em hengawe karîgerîy başî debêt Leser “*agayî zimanekî*” lay gişt mindalekan. Sûdî em kare tenha bo mindalî ew dayikûbabane nebû, bigire bo her hemû, çunke xulyay giştyan gerimtir bû hem bo fransî û hem bo zimanekanî dîkey dayikza. Hélot & Young bas leweş deken çi karîgerîyekî hebû Leser fêrxwaz ke dayikûbabî xoy debînêt norey mamostay heye, ke mamostay xoy debînêt wek fêrxwaz fêrî wişe û destewajey zimanî em debin, ke bo yekem car debîstêt nawî xoy be dirustîy le polda dête gutin. Herweha mamostakanîş rûnyan kirdote ke paş em seredanî dayikûbabe, fêrxwazî serbe zimanî dîkey nêw pol, le polda û be zimanî fransî baştir dehatine go û beweş hestî hawkobûn le polda baştir hate kayewe.

## Janrey dîke

Christie (2005) - cige le bêjandin - janrey dîkes rîz dekat ke le berayî temenda debînên: *peyrewkarî, bêjandinewe, bêjandinewey peyrewkarî, raport û rûnkirdinewe*. Yekem janreyan, “*peyrewkarî*”, le layen mamostawe dête bekarhênan bo rûnkirdinewey rahênanêk, belam zarokîş detwanin bekarî bihênin. Christie reçetey xorak dekate nimûne. Hengawî yekem nasandinî ew xorakeye benyazîn sazî bikeyn, bo nimûne şekirleme. Paşan kerestey pêwîst bo ew xorake, pêkhatekanî, dêne berbas. Ewca peyrewkarîy kareke hengaw be hengaw rûn dekirênewe. Zor car têkstî weha le şewey xalî jimaredarda dête dariştin. Mamosta le polda rêniwênîyekan zarekî rûn dekatewe û paşan xale jimaredarekan bo rûnkirdinewey hengawekanî ew peyrewkarîye le ser tablo denûsêt. Zarok em xalane bedem karewe bekar dehênin bo bîrkewtinewey hengawekan.

Janrey dûhem, “*bêjandinewe*”, wate zarok beserhatêkî xoyan debêjinewey. Christie sê hengaw le bêjandineweda diyarî dekat: “*serederî*”, “*ravey beserhateke*” û ewca “*new - serederî*”. Le hengawî yekemeda, “*serederî*”, begîştî beşdarbûwan û şiwên bas dekirên. Hengawî dûhemîş aşkiraye. Paşan beserhatî cudawaz, begîştî be pêy zincîrey kat, dêne berbas. Lem beşeda peywendîy kat le nêwan rûdawî corawcorda girîngin û em base be gerdanî kar dête derbirîn (bo nimûne: “*çû*”, “*çûba*”, “*deba çûba*”) û awelkar (“*ewca*”, “*ewsa*”, “*paşan*”, “*katêk*”). Dîsan girînge axêwer pêşanî bidat kê çî dekat,

wate bekarhênanî nîhad û cênaw be corêkî guncaw. Le hengawî sêhemda, “new - serederî”, weha bawe têksteke girê dedirêtewe be seretay xoyewe: “ewca dîsan geraynewe mal”.

“Bêjandinewey peyrewkarî” şêwazêkî taybete le “bêjandinewe” ke be taybetî le buwarî siruştasîda dête bekarhênan. Bo nimûne dawa le fêrxwaz dekirêt basêk pêşkeş biken derbarey ezimûnêkî piyadeyan kirdûwe, bo nimûne paş çandinî tow, yan paş têkelkirdinî çend şilemenîyekî cudawaz. Christie (2005) bo “bêjandinewey peyrewkarî” sê hengaw diyarî dekat: “mebest”, “ravey hengawî cudawaz” û “serencam”. Sereta “mebest” êk, mijarêk, bo têksteke diyarî dekirêt. Paş ewe “ravey hengawî cudawaz” pêşkeş dekirên, bo nimûne rawestan, awdan, naştin le cêyekî rûnakda, çirokirdinî riwek, geyişte ew endazeye... htd. Le kotada “serencam” pêşkeş dekirêt, ba bilêyn: riwek pêwîstî be rûnakî û awe.

Janrey pêncem ke Christie (2005) delêt salanî berayî birewî heye birîtiye le “raport”. Emyan le babetî siruştasî û civaknasîda bawe. Fêrxwaz ber le nûsîn xerîkî fêrbûnî babetêk debîn, bo nimûne giyanewer. Fêrxwaz maweyek peydozîy lew babete deken, agadarî xir dekenewe û serinc tomar deken bo ewey paşan bibête binaxeyek bo raporteke. Le fêrgey swêdîda beme degutirêt: “fêrxwaz xerîkî tojînewey”. Christie delêt destpêkî raport birîtiye le “polênkarî” yekî giştî: “seg giyanewerî destemon”. Paşan “ravekarî” dêt, bo nimûne şêwey giyanewereke, malekey, reftarî, xorakî... helbet em ravekarîye le giwêrey babetî baseke şêwe degorêt.

Janrey şeşem ke Christie (2005) basî dekat “rûnkirdinewe” ye. Rûnkirdineweş be dîdî Christie dû hengawe: “dyarîkirdinî diyarde” û “zincîrey rûnkirdinewe”. Destpêkî têksteke birîtiye le diyarîkirdinî ew diyardeyey xerîke rûn dekirêtewe. Paşan rûnkirdinewey be zincîre dête pêşkeşkirdin, bo nimûne: “sereta ... û ewca ... paşan ... û le kotada...”.

## Pajî heştem: Xwêndinewey dengdar

*Kitêbîş heye /.../ ke dête ser mebest, hîçî têda nîye. Kitêbeke dadexeyt û delêyt “ewca çî?”.*

*“kitêbî - ewca - çî” kitêbî baş nîn bo zarok. Emane zarok le kitêb û le xwêndinewe detarênin û kes ewey nawêt. /.../ kitêbêk karîgerîy nebêt kitêbêkî baş nîye, ne bo zarok û ne bo gewre. Kitêb ger zarokî hênaye pêkenîn, giryan, hawar, lertzîn yan xo lûldan, ewca le dilyan gîr debêt û têyda demênêtewe.*

Fox2001, p. 110

“Xwêndinewey dengdar” çalakîyeke le nêw zor xêzanda bayexî berzî heye. Kiçe gewrekem her zû fêr bû kitêb bo çî başe. Ew taze pêy girtibû deyzanî ger bête lam û kitêbêkî bedestewe bêt ewa min dest le kar heldegirim, dadenîşim û deyxeme ser koşim û kitêbekey bo dexwênimewe. Wate pey birdibû bewey kitêb “bilît” e bo danîştin Leser koşî daye. Paşan bedem şîrdan be xuşkubiray biçûktirewe, xwêndinewey dengdar û baskirdin le têkst berdeyam bû. Kiçekem xwêndinewey dengdarî hênd le la xoş bû, heta direng ewca xoy destî daye xwêndinewe. Axir hîç pêwîstî nebû xoy bixwênêtewe. Lebîrî xwêndinewe zorî denûsî. Xwêndineweke babilêyn lexora hat. Hêndeş xwêndinewey dengdarî le la xoş bû, le temenî herzekarîşda kitêbî dehênayewe malewe û daway xwêndinewey dengdarî le nêw xêzanekeda dekird. Xoy kitêbekey xwêndbowe û deywîst êmey xêzanîş ew çêjey lê werbigîrîn. Kewate dekirêt xwêndinewey dengdar karkirdî firecorî hebêt, her bo nimûne, wek yarîder bo firajûtînî ziman, wek hokar bo helkirdinî civakî û bo çêjgîrîy hawko.

Xwêndinewey dengdar karîgerîy zorî heye Leser firajûtînî ziman lay zarok, betaybetîş Leser firajûtînî nûsînzanî le layan. Beweş xwêndinewey dengdar noreyekî girîngî debêt le zaroxane, polî amadekar û le fêrge. Sengî gewrey heye ger mamosta û pêdagogî dîke be deng têkst bo zarok bixwêndinewe. Belam xwêndinewey dengdarî rêsabend le polda le layen zarok xoyanewe ew sengey nîye. Em core xwêndinewe dengdare nerîtêkî dêrînî heye le fêrge, mamosta dawa le fêrxwazan dekat, be zincîre û yekbeyek, parçe têkstêk bedeng bixwêndinewe û ewaney dîke temaşay têksteke biken. Berdewambûn Leser em nerête sûdî nîye.

Zor fêrxwaz aşkirayan kirdûwe çend girij û peşêw danîştûn û çawerêy norey xoyan kirdûwe û lebîrî ewey agayan le xwêndinewey hawpolekanyan bêt kewtûnete mezendekirdinî ew parçeyey ber xoyan dekewêt. Xwêndinewey dengdarî bezor sûdêkî berçawî bo firajûtînî xwêndin pêşan nedawe. Belam xwêndinewey dengdar le grûpî bicûkda sûdî zore û paşan dêyne ser ew base. Herweha xwêndinewey dengdar letek kesêkî gewreda, xwêndinewey dengdar dûbedû, derfete bo çêjgîrîy hawko.

Sereta seyîrî çend rûkarêk dekeyn le xwêndinewey dengdarî mamosta. Bo nimûne xwêndinewey dengdarî têkstî edebî û xwêndinewey dengdarî têkstî zanistî. Xwêndinewey dengdarî têkstî edebî, bo nimûne kitêbî zarokan, çîrok û kitêbî wênedar, le zaroxane û le nêw destezarokî berayî le fêrge, debînên. Xwêndinewey dengdarî têkstî zanistî zor car birîtîye le xwêndinewey têkstêk peywend be karêkewe. Bo nimûne xwêndinewey babetêkî serbe civaknasî. Bo nimûne payîz babetî xwêndine û têkstêk dexwênînewe derbarey giyaneweran çon xoyan bo zistan teyar deken. Yan bas le giyanewerî destemoye û têkstêk derbarey manga, hesp yan beraz dexwênînewe. Le babetî “çaxî berdîn” da deşêt têkstêk bixwênînewe şîmaney guzeranî xêzan le çaxî berdînda beser bikatewe. Em core têkstane bo pirkirdinewey wêney ew babeteye fêrxwaz xerîkîyetî. Têkstekan bo eweye yarmetîy fêrxwaz biden



xoy bixate nêw ew basey deyxwênêt, jiyânî ew dem û buware çon bûwe. Her delêyt “*deng*” debexşîne nêwerokî bas û derfet dedeyne fêrxwaz le riwangey xoyewe biriwanête baseke. Xwêndinewey dengdar deşêt le babetî cudawazda “*deng*” bidate basî cuda, bo nimûne zarokî kat û şiwênêkî dîke, yan giyanewerêk. Derfetîş dedat fêrxwaz xoy bixate nêw boçûn û guzeranî kesanî dîkewe. Em xwêndinewe dengdare “*giyan dekat weber*” basekeda bo ewey fêrxwaz hasantir pey berêt bew nêweroke û xoy derikî xoy helbestêt.

Lewaneye le fêrgeda xwêndinewey dengdar le têkstî edebî pitir bawî hebêt. Deşêt xwêndinewey kurteçîrok bêt le yek danîştinda, yan xwêndinewey dastanêkî dirêj yan romanêk bêt be çend danîştinêk. Zarokî biçûk pêyan xoşe giwê bo çîrokî kurt radêrin, ger zorîş biçûk bin ewa firepatbûnewey heman çîrokiyan zor la pesende. Em zarokane zor car têksteke ezber deken û çêj degirin lewey xoyan têksteke pir bikenewe. Eme derfetî nayab dedate fêrxwaz bo têgeyiştin le bekarhênanî nûsîn. Le fêrgeda kitêb heye taybet be xwêndinewey dengdar û le katî diyarîkirawda, bo nimûne “*baziney beyan*” yan civînî ber le firavîn, dehênrêne pêş.

Lay zorbey mamostayanî zaroxane û fêrge, em xwêndinewe dengdare karêkî sûdbexşe. Xwêndinewey dengdar satêkî aram derexsênêt bo çêjgîrîy hawko. Emeş debête rahêz bo hestî yekbûn le grûpda. Her kobûnewe le dewrî babetêkî serincrakêş û dilgîr bo xoy bayexdare û nabêt wîl bikirêt. Lem rojgareda ke jawejawî mêdya têyda behêze û zarok dekewine ber tawî berdaştî<sup>185</sup> zor û tîjrew, lewaneye satêkî xawî aram sûdî xoy hebêt. Têkstî mebest deşêt bibête deraw bo gutûbêj derbarey dozî girîng, çî pirsî serbe bûn bêt, çî pirsî bîrdozekî bêt ke peywende be xwêndinî babetewe.

Xwêndinewey dengdar, bo zarokî hêsta lew asteda nîn xoyan têkstî helkişîw bixwêndinewe, debête derfetêk hem bo wergirtinî ew zanyarey le têksteke heye, hem bo berkewt letek ew şêwaze zimaney heye le têksteke. Serbarî eweş, xwêndinewey dengdar le berayî temenewe derfet dedate zarok beşdar bin le çalakîyekanî serbe zimanî nûsîn û herweha çalakîy civakîy weha ke le dewrûberî nûsînda peyda debin. Zarok derfetyan debêt bo rahatin Leser twanakanî debine beşêk le xwêndinewe, bo nimûne arastey xwêndinewe, serincgîrî le şêwaz, çonetîy kitêbigirtin û heldanewey pere û... htd. Bem core, xwêndinewey dengdar sûdêkî gewrey heye bo firajûtinî nûsîn û beşêkî girînge berew peydakirdnî sewad.

Cige lewaneş, xwêndinewey dengdar diney xeyal dedat. Zarok ke kitêbî hemerengî bo dexwêndirêtewe, berdaştî hemecor peyda dekat ke bo twanay afirandin sûdbexşin.

### **Xwêndinewey dengdar bo fêrxwazî serbe zimanî dîke**

Bo fêrxwazî serbe zimanî dîke, xwêndinewey dengdar yarîderêkî girînge bo fêrbûnî zimanî dîke. Xwêndinewey dengdar deşêt bibête serçaweyek bo daxunêkî baş be mercêk kar letek têkstî weha bikirêt diney fêrbûnî ziman bidat. Wate têksteke debêt resen bin, nek wek ewey carûbar dête berçaw têkst heye تنها bo xwêndinewe darêjrawe. Emeş nimûne le têkstî narsen:

- Şîrîn û Siyamend segêkiyan heye
- Segeke nawî Kemane -ye
- Kemane êskûke
- Şîrîn û Siyamend wazî letek Kemane deken

---

<sup>185</sup> Berdaşt: impression.

Têkstî weha rûnkerewe çî dineyekî zimanekî weha nabexşê zarok lêy sûdmend bin. Ger mebest eweye fêrxwaz bitwanêt nûsîn le bestênî wataarda bekar bihênêt, debêt ew têkstaneş ke rûberûy debinewe lew babete bin. Fox (2001) delêt girînge zarok rûberûy kitêbî weha bêt ke karîgerî hebêt, yan wek xoy delêt: “nîgeranî” -yek lay zarok peyda bikat. Mebestîşî amajeye bewaney girêdirawin bew pêwîstîyey mirov ke xoşewîst bêt lay dewrûber. Fox amaje dekat be kitêbî weha ke bas le tasey mirov deken bo asûdeyî, ranegeyîştin bewey berxwaste, şikesthênan, hêvîdarî, koşan bo şitêk, tirs, xem, şermezarbûn û... htd. Kewate ew dilgerimîyey têksteke deybexşê be mirov, şamebeste.

Pêşmercêkî dîkey girîng bo ewey xwêndinewey dengdar bibête yarîderî firajûtinî ziman lay fêrxwazî serbe zimanî dîke, eweye fêrxwaz bedûy têksteke bikewin û lêy têbigen. Beşêkî zorî ewey le zaroxane û fêrgey Swêdda dengdarane dexwêndirênewe, berhemî nûseranî wek Elsa Beskow û Astrid Lindgren, serşarêkî swêdîy rûnyan heye. Derawî em têkstane ferhengî swêdîye, dîdî swêdîye bo xêzan, zarok û siruşt, cîhanbînîy swêdîye. Zorbey swêdî bo nimûne kitêbeka Elsa Beskow & Astrid Lindgren be “*kitêbî başî mindalane*” dezanin. Min nemdezanî em boçûne hemû kesêk nagirêtewe heta hawkarêkim ke îngilîze û danîştûy Swêde pêmi gut çend kitêbeka Astrid Lindgren dedizênêt û çend larî hebû lewey fêrge ew kitêbane “*bisepênrê*” beser mindalekanîda. Awatexwaz bû derfetî hebêt rê bigirêt le xwêndinewey ew kitêbane le polî mindalekanî xoyda. Helbet boçûnî lem babete lay swêdîyekan zor seyre, belam le fêrgeyekda ke bo hemwan bêt, mamosta naçare carûbar ew “*çawilke ferhengîye*” î xoy lada û hewil bidat têkstekan le riwangey dîkeşewe seyr bikat. [Helbet şitêk nîye tewaw serleber “*ferhengî swêdî*” bêt, belam lêreda em çemike destewajeyekî giştîye bo ewey ême pêman waye swêdîye - nûser].

Ger mamosta pêy weha bêt gişt fêrxwazan beheman şêwe pey be têkste xwêndirawekan deben, ewa zanyar û ezimûnî ew fêrxwazane rûpoş dekat ke serbe zimanî dîken. Katî xwêndinewey dengdar le pol û civînî berînî fêrxwazanda, zor degmene fêrxwazêk tenegeyîştinî xoy le nêwerokî baseke rageyenêt betaybetî ger weha bizanêt ewaney dîke têdegen. Zorbey mindal le barî wehada lebirî aşkirakirdinî tenegeyîştin, bêdenî heldebijêrin.

Gibbons (2005) cexit dexate ser ewey lebirman bêt ke ême zor car pêman wehaye gişt fêrxwazan aşinan bew amaje ferhengîyaney le kitêbî zarokanda dene derbirîn. Fêrxwazî serbe zimanî dîke naçarin cige le fêrbûnî zimanî xwêndin, ke swêdîye, aşinay ew ferhengeş bin ke zimaneky têda deçerxêt. Helbet mebest ewe nîye mamosta beperêz bêt le pêşkeşkirdinî têkstî namo bo ew fêrxwazane, bepêçewane. Aşinabûn be diyardey girîngî ferhengî, wek ew cîhananey Elsa Beskow & Astrid Lindgren helîdebestin, zanyarî girîngin le Swêd, betaybetîş salanî xwêndin. Kewate fêrxwaz lem buwareşda, her wek le buwarî fêrbûnî zimanda, pêwîstî be yarmetîye. Gibbons delêt girînge em zanyare helçinrêt ber le destpêkî xwêndinewe, dena metirsî zore ke têkstekan bibine hoy dabiranî em fêrxwazane lewey ke le polda deguzerêt, metirsîy perawêzkewtinî fêrxwazan.

Leber ewe girînge mamosta derfet bidate fêrxwazî serbe zimanî dîke nêwerokî têkstekan têbigen. Lewaneye wişe hebêt pêwîstî be rûnkirdinewe bêt, lewaneyişe “*pêşzanyar*”<sup>186</sup> derbarey ew diyardaney debine binemay baseke, pêwîst bêt. Kitêbî mindalan heye dîdêk le zarok û perwerdey zarok pêşan dedat deyan salî beserçûwe û lewaneye birewêkî wehay nemabêt. Helbet mebest ewe nîye kitêbî weha behay nemawe, na, belam fêrxwaz debêt yarmetî bidirêt bo ewey derikiyan bikat. Kitêbeka Astrid Lindgren dîdêk pêşkeş deken zarok têyda serferaze û le ast rêsakanî dayikûbabda serçile. Eme lewaneye le ferhengî dîkeda dîdêkî namo bêt. Raste emane wek niwêner bo kitêbî swêdîy zarokan bûnyan girînge, belam le fêrgeyekda ke bo hemwane debêt mamosta twanay hebêt le riwangey dîkeşewe temaşay têkst bikat.

Axaftin derbarey têkste xwêndiraweke, pêşkat û hawkat û paşkatî xwêndineweke, rêgeyeke bo yarmetîdanî derikkirdin lay fêrxwaz. Gibbons (2006) nimûney berhestî başî heye bo rahênanî em

<sup>186</sup> Pêşzanyar: prior knowledge, zanîni pêşkat, zûtir.

babete. Zarok heye, bo nimûne fêrxwazêkî hêšta zımaneke baş nazanêt, pêwîstî heye bewey çend carêk heman têkst bibîstêt, pêwîstî heye bewey pêşkat têksteke le grûpî biçûkda bibîstêt û derfetî axaftinî têda bêt. Ger mamosta hewil bidat têkstî serbe ferhengî dîkeş peyda bikat, bo nimûne çîrok û kitêbî zarokan, ewa xwêndinewey dengdar derfet saz dekar bo gutûbêj derbarey ferheng û behay corawcor, debête derfetêkî fêrbûn bo hemwan, be mamosta xoyîşewey. Lêreda bûnî mamostay zımanî dayikza û mamostay zımanî swêdî wek zımanî dûhem, zor girînge.

Deşkirêt têkst le kitêbî cûtzıman bo xwêndinewey dengdar helbijêrîn. Mebest ew kitêbaneyey ke heman têkstî be dû zımanî cuda têdaye. Kitêbî lew babete le swêdîy em serdemeda degmenin belam le zaroxane û fêrgey welatanî dîke cîhan zorin. Kitêbî weha dekirêt bidirête dest dû mamosta, mamosta û fêrxwazêk dayikûbabêk... û be nore her yek be zımanêk têksteke bo fêrxwazan bixwêndinewe.

### **Xwêndinewey dengdar le grûpî biçûkda**

Gerçî min pêş baş nîye zarok naçar bikirêt bo xwêndinewey dengdar beranber gişt poleke, belam car heye xwêndinewey dengdar le grûpî biçûkda başe. Eger grûpekan biçûk bin, têksteke belay fêrxwazekewe watadar bêt, xwêndinewe dengdareke weha bêt fêrxwazanî dîke bitwanin dûy bikewin û tîy bigen û layan cêgir bêt, ewa xwêndinewey dengdar le grûpî biçûkda karêkî guncawe.

Wate em kare bo katêk başe ke fêrxwaz geyistibête astêkî weha bitwanêt serbexo be corêk bixwênêtewe ke fêrxwazî hawdeste bibistin û tîy bigen. Zorbey mindal heta polî sêhem nagene em aste, heyişe heta polî şeşemî pêwîste û heyişe her nagat.

Rêkxistinî grûpî biçûk bo xwêndinewey dengdar berokgirîyekî pêdagogîye bo mamosta. Weha başe çend kesêkî riskaw bo yarmetîy kesî xwêner lewêda amadebin. Mamosta debêt xeyalfirewan bêt bo dozînewey şewazî rêkxistinî guncaw. Lewaneyey mamostay yarîder hebêt le grûpekanda harîkar bêt. Lewaneyey fêrxwazî gewretir hebêt le polî balatirewe bêt bo harîkarî, “*fêrxwazî piştîwan*”. Lewaneyey kesanî dîke riskaw le fêrgekeda hebin bo harîkarî.

Le mamostayetîy xomda, carêk dawam le karguzarêk kird hawkarîm bikat, zorî pê xoş bû ew core peywendîye hebêt letek fêrxwazan. Ew grûpey karguzar tîyda yarîder bû, lêyan xoş hat lewewla le jûrî karguzar xwêndinewey dengdaryan hebêt. Lewaneyey ew jûre zor lebar nebûbêt, belam hem fêrxwaz û hem karguzar ew grûpkarîyeyan zor pê baş bû, xwêndineweş rêk lem grûpeda zor gerim bû. Grûpêkî dîke hebû, le xwêndineweda baş bûn û deyanwîst kemêk serferazane kar biken. Emane le jûrî cumnastîk, “*espedarîn*” yan be xaney xoyan helbijard. Banekeyan labird û xoyan tîxizand. Cêgeyan teng û tarîk bû belam xwêndinewe çir û pîrî têda encam dira. [Cêy amajeyey bilêm yek lew zarokane emro hunermend û nûserî kitêbî zarokane].

Le xwêndinewey dengdarda, wek le zor barî dîkeda, rêgeçareyekî diyarîkiraw nîye bo hemwan biguncêt, belkû mamosta bepêy barudoxî xoy û twanay fêrxwazanî, rêgeçare helbijêrêt. Be dîdî min, xwêndinewey dengdarî fêrxwaz xoy ew behayey nîye fêrxwazî dîkeş danîşin giwêy bo radêrin ger be başî giwêyan lê nebêt. Le barî wehada pêş waye ew kate bo xwêndinewey bêdeng terxan bikirêt baştîre.

## Pajî nohem: Axaftinî nûsirawî elektronî

Destawêjî elektronî heta dêt pitir birew peyda dekat. Emeş diyardeyeke betaybetî zarok û herzekar degirêtewe boye zaroxane û fêrge debêt helwêstî lê bigirin. Pirsiyar çîdî ewe nîye komputer le xwêndinda bekarbihênrêt yan na, pirsiyar eweye çon bekarbihênrêt. Gorankariyekanî ew rûbere zimanekeyey ême karî têda dekeyn çî karîgerîyekiyen heye leser karûbarî ême? Zanyar û ezimûnî zarok û herzekar çî gorankariyekî beserda dêt û ême çon helwêstî lê bigirîn? Ta çî radeyek karûbar biguncênîn letek barudoxî em rojgareda û çalakane têbikoşîn bo gorînî barudox?

Zor mindal le berayî temenewe berkewtyan heye letek nûsîn le rêy destawêjî firecorî elektronîyewe. Bûnî parçey elektron le nêw lîstokda heta dêt birewî zêdetir debêt û eweş car heye zarok rûberûy nûsîn debinewe. Zarok be dagirtinî dugmey elektronî detwanin “çawdêrî” -y bûkeley elektronî biken û “hawdemî” -yan letek dostî elektronî hebêt, çî rastîne û çî xeyalkird. Be komputer detwanin beşdar bin le helbestinî cîhanî xeyalkirdda, be tenya yan geldest letek yarîderî dîkey xeyalkirdda. Zarokîş destawêjî lew babete bekar dehênin û bew core kar letek nûsînî cuda û zimanî cuda debêt.

Lem rojgareda çî seyr nîye zarok bibînît hêştâ xwêndinewe nûsînî nerêtî fêrinebûwe keçî detwanêt, le rêy bekarhênanî nûsînewe, serederî le datawazîy<sup>187</sup> aloz bikat. Zor car ew têkstane be zimanî îngilîzîn û grafişkî weha helkişîwyan le dewre tewaw cuda lewey ême be guncawî dezanîn bo destpêkî sewad.

Nûsînî elektronî destawêjî dîkeş bo sewadî zarok pêşkeş dekat tewaw cudawaze le pênuş û defterî fêrge. Bo nûsînî, bo nimûne, kurtepeyam be telefonî mobayel dugme dîte dagirtin ewîş be sistemî taybet. Her dugmeyek beranber çend nîşaneyeye û nûser debêt sistemî rêkxistinyan bizanêt. Bo nimûne sistem heye têyda dugmeyekî taybet yekcar dagirît pîtêkit dedatê, dû car dagirît pîtêkî dîkeye û... htd. Heye wişet bo pir dekatewe. Berdewam kurtkirawe û sistemî niwêy hêma peyda debin.

Xwêndineweş le dîmenderî mobayelewe cudawaze le xwêndinewey nerêtî kitêb. Jimareyekî sinûrdarî nîşane le dîmenderî elektronîda cêyan debêtewe, peydabûnî berdewamî zimanî hêmanûs û bersivî xêra le buwarî kurtepeyamda, debine mayey penabirdine ber stratêjî niwê bo xwêndinewe. Diyardey serbe jargon û lazimanî destebendî lem zimanî nûsîneda beheman corî zimanî zarekî birew peyda dekat. Wate bekarhêneran, ke zorbeyan zarok û herzekarin, hem fêrî norm û stratêjî niwê debin bo em core “nerêtey sewad” û hem çalakane beşdarî dariştinyan debin.

Axaftinî nûsirawî elektronî taradeyek cudaye le sewadî nerêtî. Zor car dû - sê zarok wêkira beranber dîmenderî komputer ko debinewe, yekiyen kîbordî bedeste û yekiyen maws. Xwêndinewe têkel be seyrkirdinî wêney hem mend û hem bizoz û herweha dengkarîy corawcor debêt. Karî hemecor leser dîmender pêşan dedirên, nîgar û hêmay corawcor seretatkê deken, kirte lêre û lewêy dîmendereke dekirêt bo cêgorkê le nêwan têkst, reng û dengda. Car heye zarok hawkat kar leser dû dîmender deken, giwê le muzîk degirin û fayel dadegirin, peyam denêrin, muzîk û filim legel kesani dîkey hem nasyar û hem namo, alugor deken.

Maweyek meylêk hebû bo rêbestin le bekarhênanî berhemî elektronî le fêrkarîda û serinc hebû deywîst zaroxane û fêrge beperêz bêt le bekarhênanî komputer. Hawkat meylî dîkeş hebû deygut weha başe herçî tazeye rexnebeder biselmênrêt. Emîşyan her kêşedar bû, çunke kerestey rahênan

---

<sup>187</sup> Datawazî: computer game, gemey corawcorî elektronî.

hebû serbe boçûnî konebaw, bo nimûne kerestey rahênanî serbe boçûnî rewîştayetî, le şêwazî dîjîtalkarda dehatinewe meydan. Belam rahênanî rutînkar, rahênanî beşî biçûkî dabiraw be deng û rengî dîjîtalkar nabine kerestey baş. Bernamey komputerîş wek hemû keresteyekî dîkey fêrkarî debêt rexnegirane bête helsengandin.

Zor le mamostayan hestyan kirdûwe biryarderane layan hasantire pare bo kirîna komputer terxan bikirêt belam bo damezirandinî mamostay pêwîst, bo nimûne mamostay taybet, mamostay ziman û zimanî dayikza, destgîrin. Hest dekirêt kemxercî tenha bo damezirandinî mamostayane nek bo kirîna kelupelî dîjîtal.

Fêrge debêt bizanêt kame cor nûsînî elektronî dozêke bo fêrge xoy pêwe xerîk bikat. Meydanêkî firewan heye lewêda serbe *"katî azad"* e û be hîç corêk basêk nîye biçête jêr sayey fêrgewe. Herzekaranîş pêwîstyan be buwarî xoyan heye. Nakirêt gişt çalakîyek milkeçî rêsa û çawdêrîy fêrge bêt.

Dozêkî dîkeş heye peywest be bekarhênanî destawêjî elektronîyewe, betaybetî komputer û mobayelewe, ewîş dozî yeksanîye. Zarok be paşxanî abûrîy corawcorewe dên bo fêrge. Heye her le berayî temenewe destawêjî elektronîy helkişîwî hebûwe, heyişe çî derfetêkî wehay bo nerexsawe. Fêrxwazî serbe zimanî dîke zorin ke barî darayî xêzanyan weha nîye le mal komputer û mobayelayan hebêt. Helbet zor mindalî swêdîş hen lew baredan. Fêrge çî helwîstêkî lem base hebêt? Nebûnî bîrkirdineweyekî baş lem buwareda debête mayey pitir perawêzxistin û derkinarkirdin. Eme girînge bîrî lê bikeynewe bo nimûne bo biryardan leser ewey kê û key kar leser komputerî fêrge bikat. Ger cilewgîrî têda nebêt, ewa dûr nîye fêrxwazî rahatû be datakarî le fêrgeş zêdetir xerîkî komputer bêt û fêrxwaz ranehatû wela binrêt. Helbet asanîş nîye derfetî zêdetir bidirête fêrxwazî ranehatû eger norekarîy biryarder bêt. Kewate dîsan jîrîy mamosta girînge bo biryardan le basî wehada.

### **Kê pispore, mamosta yan fêrxwaz?**

Em pêşrewte tijrewey destawêje hemecorekanî elektronî, letek ew rastîyey delêt em pêşrewte le nêw cewanda tijrewetire, zaroxane û fêrgey xistote doxêkî tengetawewe - zor car zarok le mamostakanî pitir şarezay em destawêjaneye. Leber ewey yekêk le binemakanî fêrge giwastinewey zanyare le kesanî riskawewe bo newey paş xoy, zor bas dekewête jêr pirsiyarewe ke fêrxwaz le çend babetêkda şarezatir bêt le mamosta. Kewate mamosta debêt taradeyek le rolî xoy wird bibêtewe û be rişîş têbikoşêt bo beşdarîy çalakane lem firajûtineda.

Lewaneyişe katî hatibêt ew efsaney delêt fêrxwaz le mamosta twanatire, pûç bikirêtewe. Raste mirov zanistî cudawazî heye. Le civakî bergorda, wek emey rojgarî ême, zarok û cewan xêratir firayî diyardey niwê dekewin û leber ewe zanistêk peyda deken lay kesanî gewresal peyda nîye. Belam eme nakate reşkirdinewey gişt zanyarî zûtirî nêw civak. Raste zarok detwanin beşêk le karkirdekanî komputer baştir bekarbihênin, belam ew ezimûn û zanyare helkişîweyan nîye ke mamosta heyetî le buwarî wek sewadda. Pêwîstîman be mirovî şareza le bo nimûne stratêjî helkişîwî sewad, ziyadî kirdûwe nek kem. Xwêndinî riştey mamostayetî dirêjtir kirawe, mercîş leser astî zanistaney mamosta helkişîwe, betaybetî mamostayanî zaroxane û salanî berayî fêrge. Kewate hêşta girînge fêrxwaz ew sewade fêr bibin ke pêwîste bo salanî balatirî fêrge. Emeş buwarêke mamosta têyda twanatire. Bekarhênanî *"teknolojîy agadarî û danûstan"*<sup>188</sup> (ICT), dozî serbe akar, destûr û maf, pêdagogî û pirsî mirovkarî giştîgîr, repêş dexat, lem buwaraneşda ezimûnî kesanî gewresal gencîneyekî girînge.

---

<sup>188</sup> Teknolojîy agadarî û danûstan: Information and Communications Technology (ICT).

Firewanbûnî meydanî agadarî û herweha ziyadbûnî bekarhênanî destawêjî elektronî, mercî gewretir dexene estoy mamosta. Deşê bilêyn le civakî emroda “*jawejaw*” -êkî zimaneke heye mamosta debêt rikaberîy bikat. Mamostay emro hem berengarî rikaberîyekî tewaw cudawaz dêt û hem mercîş Leser ewey fêrxwaz debêt fêrî bibêt, ziyadî kirdûwe.

Fêrxwaz debêt hem fêrî hunerekanî sewadî nerêtî bin ke fêrge xerîkiyane, ewaney zûtir basyan hat, hem fêrî stratêjî niwê bin ke pêwîstin bo em şêwaze tazaney “*nerêtî sewad*” ke peyda debin. Emeş mercî giran û taradeyek niwê, dexate estoy mamosta.

### **Xwêndinewey dîmender**

Xwêndinewey dîmender hem wêkiçûnî heye letek xwêndinewey kaxez û hem cudawazî. Emyan zor car parepareye, xwêndinewey kurteriste û peyvî helbirawî lêre û lewêye, lewaneyîşe eme gewretirîn cudawazî bêt. Peydozîy nêw înternêt û rûpelgorîn, seretatkêy rîkilam û babetî dîke debine hoy em pareparebûney xwêndinewe. Rûpelî înternêt heye çendîn lapeyamî cudawazî be tenîşt şapeyamî rûpelekewe rîz kirdûwe û carûbarîş, beder le xwastî xwêner, babetî dîke serheldeden. Emaneş be mebestî rakêşanî serinc, agayane darêjrawin. Tenanet le zorbey bername cîddîyekanda, bo nimûne bernamekanî wişekarî û amarkarî, çêwey cudawaz be agadarîy corawcorewe seretatkê deken. Leber ewe twanay peydozîy agadarî, lebbêjingdan, peycorîy rexnegirane û helbijardinî ewey dirust û lebare, twanagelêkî girîngin bo em core xwêndinewe. Herweha twanay serincgîrî lewey mirovî xoy mebestyetî û xoparêzî le agadarîy labela, twanayekî girînge.

Cige le xwêndinewey parepare, dîmender bo xwêndinewey têkstî dirêjîş bekar dêt. *E-brary*, kitêbixaney elektronî bo pexîşî kitêb û govaran, nimûneyekin lew bernamaney derfet bo xwêndinewey dirêj be dîmender derexsênin. Raste dekirêt ew têkstane Leser kaxez dernûs bikirên, belam be piley yekem bo xwêndinewey elektronîye. Le *e-brary* da xwêner her be şêwazî elektronî detwanêt parçetêkst nîşane bikat, kopî bikat û le cêy dîke têkste cênîşîn bikat. Kewate xwêner debêt şarezay ew core destawêjaneş bêt.

Gutiman xwêndinewey parepare xesletî bawe bo xwêndinewey elektronî û her leber eweş girînge fêrge cexit bikat Leser firajûtinî ew hunerane pêwîstin bo xwêndinewey têkstî serleber û dirêj, bo nimûne xoşrewtî, xêrayî û herweha têgeyîştin û twanay dariştinî têkstî dirêj. Herweha leber ewey xwêndinewey dijîtal rûy le helkişane û xwêndinewey kitêb dadeşkênêt, girînge mamosta diney fêrxwaz bidat bo xwêndinewey kitêb.

Cudawazîyekî serekî le nêwan kitêb û rûpelî înternêtda, saxtarî têkste. Înternêt le şêwey “*nexşey hizir*”<sup>189</sup>-da çinirawe û rûpelî dijîtalîş her ew saxtarey heye, belam kitêb saxtarêkî hêlekî heye, sereta û binetay diyarîkirawe. Emeş basêke dekirêt le polda bibête mayey berawirdkirdin le nêwan şêwey rêkxistinî agadarî le têkstî corawcorda be destawêjî hemereng.

---

<sup>189</sup> Nexşey hizir: mind map.

## Nûsînî elektronî

Nûsînî elektronî bote hoy peresendinî nûsîn be çendîn şêwazî niwê ke têyanda hêma, kurtkirawe, dengnûs,<sup>190</sup> wêlkirdinî nîşaney nawbir û... htd ke wêkiçûnî zore letex axaftinî zarekîda. Herweha nûskarî azmûdeş, bo nimûne: nûser, tojer, rojnamenûs, sekretêr... htd, destawêjî elektronî zor bekar dehênin. Ew core nûsîne zûtir pêman degut nûsînî helkişîw, ke deşkirêt be “*nûsînî zanyarbêjî fêrge*” nawzedî bikeyn, beradeyekî beriz pena debate ber “bernamey wişekarî”.<sup>191</sup> Kewate fêrxwaz bedem peredan be nûsînî xo, debêt şarezay ew destawêjaneş bêt.

Ew derfetaney bernamekanî wişekarî deyrexênin debine mayey peresendinî stratêjî niwêy nûsîn. Dysthe et al. (2002) bas le nûskarî corawcor dekat û be “*planrêj*” û “*darêjerewe*” nawzedyan dekat. “*Planrêj*” ber le destpêkî nûsînî têkstekey xoy planî zor wirdî bo daderêjêt, belam “*darêjerewe*” pena debate ber rêjewî nûsîn û paşan dêtewe ser dariştinewey têksteke. “*Planrêj*” lewaneye weha baş planî xoy daristibêt tenha pirkirdinewey be têkst pêwîst bêt. Belam “*darêjerewe*” lewaneye naçar bêt çend carêk têkstekey xoy binûsêtewe heta degate astêk xoy pêy asûde bêt. Herdû corîş sûd le nûsînî elektronî debînin, belam min pêm waye “*darêjerewe*” pitir lêy sûdmende. Her ew hasanîye le destkarîy têkst, dariştinewey saxtar, lê derkirdin, giwastinewe, firewandin, têbirdin û... htd derfetî baştirîn destkarî têkst dedate “*darêjerewe*”. Ew kesey xoy be tayper têkstî tayp kirdûwe, dezanêt bûnî destawêjî elektronî çî sûdêkî heye bo destkarî û çakkirdinî têkst.

Zarokî zûtir tenha pênuşyan bo nûsîn bekarhênawe û dijwarîyekî zoryan têda dîwe, bekarhênanî kîbord û dîmender debête yarmetîyekî gewre. Kîbord karî nûsîn hasantir dekat û beweş debête handerêk bo firajûtinî nûsîn lay fêrxwaz. Ew derfetaney le bernamekanî wişekarî û nîgarkarîda hen bo nexşandinî têkst be reng û şêwazî firecor, deşêt be heman şêwey pênuş bixirêne kar bo dariştinî çîrok û honrawe. Zarok her zû le zaroxane û polî amadekarda detwanin sûd le destawêjî elektronî werbigirin bo afirandinî wêne û têkst. Deşkirêt berhemî her yek lew zarokane, le “*bergî elektronî*” î taybet be xoyanda paşekewt bikirêt.

## Nûsîn be kîbord

Mamosta heye kîbord bo hengawe berayîyekanî fêrbûnî nûsîn bekar dehênêt, çî kîbordî komputer bêt çî kîbordî sakartir ke terxane tenha bo nûsîn. Çî hokarêk nîye bo bedgumanbûn le bekarhênanî kîbord le berayî fêrbûnda. Zor mindal heye girtinî pênuş û nîgarkêşîy pîtyan le la sexte. Bekarhênanî kîbord derbazyan dekat lew sextîye, Arne Trageton (2005) pêşanî dawê ke fêrxwaz her zû detwanin be kîbord têkst binûsin dirêjtir bêt leçaw berhemî pênuşda. Bem core kîbord le berayî temenda debête dineder bo firajûtinî nûsîn. Hawkat girîngîşe fêrxwaz fêrî destuxetêk bêt xwêndinewey hasan bêt û fêrî bekarhênanî pênuş bêt be corêk destupence û baskî mandû nekat. Leber ewe girînge zarok herdû hunereke fêr bibin, hem bekarhênanî pênuş û hem bekarhênanî kîbord. Kewate erikî fêrge her ewe nîye derfet birexsênêt bo fêrbûnî destuxet, belkû debêt hunerî bekarhênanî çustî kîbordîş fêrî mindal bikat.

Ewca girînge em hunerî sewadey elektronî nekirête bargiranî leser planî wane û xiştey mamosta ke her bo xoy çir û sixnaxe. Baştir wehaye helsengandinewey niwê bo şêwazî karûbar û rêkxistineweyan bikirêt. Bekarhênanî kîbord le berayî temenda debête dineder bo xoşrewtî fêrbûnî nûsîn û zarokî zû fêrî bekarhênanî kîbord û maws bibin, twanayan lew core hunereda helkişawtir debêt.

<sup>190</sup> Dengnûs: nûsînî wişe bew corey dête gutin.

<sup>191</sup> Bernamey wişekarî: Word processor program.

## Nûsînî fireziman

Destawêjî elektronî derfetî niwê dedate fêrxwazî fireziman. Zûtir basiman le nûsînî têkstî fireziman kird, bo nimûne heman têkst be dû ziman binûsirêtewe, her zimaney Leser rûpelêk. Deşkirêt katêk fêrxwaz têkstî kurt denûsin, bo nimûne dêrêkî kurt le jêr her nîgarêkda, nûsîneke bibête dû dêr, her yekeyan bo zimanêk. Fêrxwazî fireziman detwanêt sûd le înternêt û destawêjî hemecorî terceme werbigirêt bo peredan be zimanekanî xoy. Helbet tercemekirdinî elektronî pêwîstî be destkarî heye, belam dîsan yarîderêke lew kareda. Bernamekanî tercemekarî elektronî emro hem berteskin û hem corayetîyan jêrubane, belam berdewam le pêşirewîdan.

Fêrxwazî fireziman betaybetî pêwîstî heye be danûstan letek zarok û herzekaranî welatanî dîke. Xêzan, dost û hawkaran be dunyada bilawbûnetewe û le rêy înternêt û îmeylewe peywendî letek yekdî radegirin û peywendîy niwêyiş debestin. Em base grûpî dînî û zimanekî degirêtewe ke endamanyan be dunyada bilawbûnetewe. Bo ew grûpaney le dest sitem û çewsandinewe helatûn, bo grûpanî le welatanî xoyan yasabederin, înternêt zor car bo pexişî dengûbas sengî gewrey heye. Bo fêrxwazî serbe zimanî dîke, em buware zor girînge, ne tenha bo fêrbûnî zimanî xoy, belkû bo pêkhênanî pênaseyiş. Lem buwareda zanistî fêrxwaz û xêzanyan yarîderêkî başe bo karûbarî fêrge û pêwîst nîye mamosta bikirête yekem serçawey zanyar. Belam girînge mamostay zimanî dayikza yan kesî dîkey ew zimaney fêrxwaz dezanêt, lêreda betaybetî bo nûsîn hawkar bêt.

Le nûsînda kemasîy zimanzanî aşkiratir debêt û le zor bestênda mirov dekewête ber guman û kemirêzî ger zor le normî girdebir la bidat.

## Dataakar û dataparêzî

Ew lafawî agadarîye ke înternêt rexsandûyetî, naçarman dekar zarokîş fêrî “serçawedozî”<sup>192</sup> bikeyn, wate zarok fêr bêt biryar bidat le dirustî û nadirustîy serçawe. Eme basêkî girînge ger fêrxwaz le înternêda xerîkî peydozîy agadarî bêt. Mamosta ger lem buwareda nîgeranîy hebû, weha başe lêgeranî agadarî sinûrdar bikat be saytî diyarîkiraw, bo nimûne ewaney peywendîyanh heye be karûbarî fêrgewe.

Girîngîşe mamosta agadarî rêsakanî “xawendaretî” (Copyright – kopîrayt, mafî kopîkirdin) bêt. Wêne, muzîk û filim be rêsay kopîrayt parêzirawin û mirov boy nîye be arezûy xoy kopîyan bikat û bilawyan bikatewe meger be rûnî nûsirabêt ke ew kare rewaye. Wate mamosta bo nîye bê molet berhemî lew babete le polda bekar bihênêt. Leweş bitirazêt, mamosta debêt agadar bêt lewey buwarî elektronî, bo nimûne înternêt, îmeyl û mobayel, meydanêkin têtayanda buxtan û çepandin birewyan heye.

## Destawêjî dengî

Bekarhênanî teknîkî dijîtal bo dengkarî<sup>193</sup> derwazey niwê be rûy karûbarî fêrgeda dekatowe. Fêrxwaz xoyan detwanin muzîk û berhemî dîke xoyan dijîtalane be komputer, mobayel û... htd tomar biken. Deng lêreda debête fayel û le amêrî elektronîda paşekewt dekirêt bo bekarhênanewe. Fêrxwaz detwanin berhemî xoyan, bo nimûne muzîk yan bernamey radyoy xoyan pexiş biken. Saytî

---

<sup>192</sup> Serçawedozî: source criticism (information evaluation), wirdbûnewe û peycorîy le serçawe be çawêkî rexnegirane bo helsengandinî dirustî û çewtîy agadarîyekanî dêne berbas.

<sup>193</sup> Dengkarî: karkirdin Leser deng, tomarkirdinî deng, destitêwerdanî deng.



firemêdya<sup>194</sup> heye le îternêtda bo rêniwênî berhemhênanî lew babete. Lêreşda, ke dête ser pexîşkirdinî berhemî xo, girînge mafî xawendarêtî reçaw bigirîn. Ewey dengî tomar dekirêt debêt agdar bêt lewey dengekey pexîş dekirêt û eweş derencamî xoy heye.

### **Mêdyay civakî**

Berdewam corî niwêy mêdyay civakî dêne kayewe. Heye megezî kemtemenin heyîşe dewamedar. Rîzkirdinî nawî ew berhemane lêreda zor gunçaw nîye çunke lewaneye ber le pexîşî em kitêbe, beşêkiyan nemênin. Emeş amajeye be rewî gorankarîy le mêdyay dijîtalda leçaw dawestan û negorîy mêdyay kaxezbend. Begîştî mêdyay civakî heye destawêjî pexîşe, bo nimûne Youtube û heyîşe sekoy danûstane bo nimûne Twitter. Seko heye rê be destebendî dedat. Zor mindal hen rûpelî xoyan saz deken û ewca dost û xizmanî xoyan bangêşt deken bo ew rûpele. Sekoy dîke heye derfet dedat mirov daway hawdem bikat. Xêzan heye agayane sekoy weha heldebijêrin ke zarok derfetî peywendîy tenha letek nasyarda hebêt. Sekoy awale metirsîy ewey heye zarok tûşî kesanêk bin mebestî dîkeyan hebêt. Metirsîy le peydabûnî kesanî mindalbaz û gîrodey berhemî sêksî basêkî şarawe nîye. Leber ewe girînge mindal fêr bikirên agadarîy dirust, bo nimûne naw, jimarey telefon û adres nedene kesî nenas. Zarok, bo parastinî xoyan, debêt şarezay rêsa binaxeyîyekanî parastin bin ke danûstanî elektronî degirêtewe. Girîngîşe agadar bin lewey wêneyekî le îternêtda pexîş bikirêt degate dest hemû kesêkî serleberî cîhan û derfetî sirînewey namênêt. Pexîşkirdinî wêneyek yan parçefîlimêk bo şoxîkirdin letek kesêkî dîkeda, lewaneye derhawîşey gewrey hebêt.

### **Komputer - hereşeye yan derfet?**

Komputer hem sûdî gewrey bo karûbarî fêrge heye, hem hereşe. Kewate zor girînge mamosta agadarî em buware bêt û çalakane beşdarî prosey firajûtinî bêt, betaybetî bo mamostay zarokî biçûk. Mamosta debêt beşdar bêt, nek tenha le kirînî destawêjî dijîtalî fêrkarîda, belkû le dariştinî bernamey kirînîşda. *"Tabloy dijîtal"* heye le komputer debestirêt û rê dedat be mamosta bedem bizawtinewe, fermanarîy tabloke bikat. Tenanet fêrxwazîş detwanêt tabloy dijîtal wek dîmender bo pêşandanî berhemî xoy bekarbihênêt.

---

<sup>194</sup> Firemêdya: multimedia, firedestawêjî pexîş, bo nimûne têkst, deng, reng, vîdyo... htd.

## Pajî dehem: Firajûtinî ziman û zanyar - rêbazêkî têkbeste

Mirov, be têkbestinî herdû firajûtinî hem babetî xwêndin û hem “zimanî zanyarbêjî fêrge”, zor sûdmend debêt. Em têkbestine derfet dedate fêrxwaz le bestênêkî siruştîda pere be zimanî xoy bidat. Raste, car heye sûdî heye ger fêrxwazî serbe zimanî dîke, le lawe xerîkî fêrbûnî çend diyardeyekî zimanekî bibin, belam rexsandinî bestênî siruştî le grûpî dabirawda, karêkî hasan nîye. Têkbestinî fêrbûnî babetî dîkey xwêndin û fêrbûnî zimanî swêdîyan, ke lay ewan zimanî dûheme, girîngtirîn hokarî zimanfêrbûn dabîn dekat, ewîş kate.

Belam em kare her bewe tewaw nabêt fêrxwazî serbe zimanî dîke le polda danîşin û giwê le waney asayî bigirin. Ger dozî ziman le planrêjîy waneda cêy bo terxan nekirabêt, ewa metirsî heye fêrxwazî serbe zimanî dîke, ne zimanekî fêr bêt û ne ew zanistey mebeste. Ewsayîş metirsîy heye fêrxwaz le polda xoy be şitî dîkewe xerîk bikat. Leber ewe girînge dozî ziman bibête beşêk le planrêjîy babetî niwê. Gibbons (2006, p 164-167) rûnî dekatewe mamosta çon serinc lew mercane gîr bikat ke zimanekî û babetî waneke dawayan deken û herweha twanay fêrxwaz lew mercaneda. Gibbons ravey dekat çon mamosta detwanêt pirsîyar bikate “*lînzî ziman*” (çawîlkey ziman) bo peybirdin be rehendî zimanekî le babetekeda. Beşêk lew pirsîyaraney pêşnyazyan dekat, emanen:

- çî mercêkî zimanî axaftin lêreda hen?
- çî rahênanî giwêradêran lêreda hen?
- kamane têkst mercin fêrxwaz biyanxwêndinewe?
- çî core têkstî nûsiraw dêne kayewe?
- kame helbestinî rêzimanekî lem babetî waneyeda merce fêrxwaz bekaryan bihênêt?
- kame “wişexan”<sup>195</sup>-î taybet be babetî waneke girînge fêrxwaz heybêt bo têgeyîştinî waneke?

Paş ewey rûn debêtewe kame twanay zimanekî pêwîstin bo waney dahatû, mamosta debêt peycorî bikat derbarey astî zalbûnî fêrxwaz lew twana pêwîstanez zimanekîda. Em peycorîye bo ewe nîye astî fêrxwaz be yekdî berawird bikirên belkû bo planrêjîy waneye. Gibbons em pêşnyazane dekate nimûne bo mamosta çon peycorîy bikat derbarey astî zalbûnî fêrxwaz le twanay zimanekîy pêwîstda: serincgîrî, axaftin, derencam le rahênanî corawcor û herweha xohelsengandinî fêrxwaz xoyan. Raste mamosta natwanêt em helsengandine le gişt waneyekda bo yekbeyekî fêrxwazan encam bidat, belam detwanêt be harîkarîy mamostay zimanî swêdî dekirêt twanay zimanekîy fêrxwaz diyarî bikirêt û bekarbihênrêt bo bernamerêjîy waneke. Tenanet mamostay zimanî dayikzayîş lêreda detwanêt harîkar bêt û agadarî bidat derbarey twanay zimanekîy fêrxwaz lew buwareda û be zimanî dayikza û emeyîş debête hasankarî. Gibbons (2006, p 167-174) nimûne pêşkeş dekat bo rêkxistinî kar be mebestî helsengandinî twanay zimanekîy fêrxwaz ber le çerxandinî wane.

Weha başe rûmalkirdinî zimanzanî geldest be harîkarîy çend mamostayek bête encam, bo nimûne destyekî kar birîtî bêt le mamostay çend polêkî terîb, letek mamostay zimanî swêdî û mamostay zimanî dayikza. Paş ewey mamosta wêneyek peyda dekat derbarey ew berokgîrîy zimanekîyaney karî

---

<sup>195</sup> Wişexan: vocabulary, gencîney wişe, wişezanî.

dahatû xerîkyan debêt, ewca katî planrêjîy ew çalakîyaneye ke pêwîstin. Jim Cummins (2000) em sê binema pêdagogîye diyarî dekat be serşar bo planrêjîy wane:

- serincgîrî le nêwerok
- serincgîrî le ziman
- serincgîrî le bekarhênanî ziman

Mebest le binemay yekem, "*serincgîrî le nêwerok*", eweye mamosta babetî mebest be şêweyekî berderik pêşkeş bikat. Kewate bo fêrxwazî serbe zimanî dîke ke hêştâ zimane swêdîyekey negeyiştote astî hawpolanî, debêt pêşkeşkirdinî waneke be şêweyekî pitir berhest û hemereng bêt. Begiştî, ew zanistey salanî berayî dêne berbas lew coren ke be şêweyekî berhest pêşkeş dekirên. Bo nimûne basî payîz, kêşan û terazû, ajelî nêw mêrg... htd. Ke dête ser basî gerdûn û çaxî berdîn, diyare baseke sextitir debêt.

Ger mamosta twana bêt ew zaniste be şêwazî cuda û be destawêjî cuda rûn bikatewe, baseke baştir berderik debêt. Herweha girînge mamosta agadar bêt lew diyarde ferhengî û civakîyaney peywestin bew babetey pêşkeş dekirêt. Helbestokî zarokan, kitêb û çîrokî zûtir bîstûyane û xwêndûyane nimûnen lew babetaney debête mayey cudawazîy le nêwan fêrxwazda. Serbarî ewaneş ferhengî gelêr heye, bo nimûne bernamêy têvê, muzîk û goranîy baw û govarî nîgarbêj.<sup>196</sup>

Ger mamosta weha bizanêt gişt fêrxwazan her ew çêwey ferhengîyeyan heye ke mamosta xoy heyetî, bo nimûne muzîk, têkstî edebî û masmedya, metirsî zore ke fêrxwazanî serbe ferhengî dîke yan perawêz bikewin yan bêbeş bin le zor babetî girîngî pêwîst bo xwêndinekeyan. Le civakî bergorî em rojgaremanda, weha başe bizanîn ke zorbey fêrxwaz serbe heman çêwey ferhengîy mamosta nîn, bigire çêwey ferhengîy cudawazyan heye.

Nimûneyek dehênimewe derbarey mamosta ke wehay dadenêt gişt fêrxwazanî serbe paşxanêkin belam weha dernaçêt. Mamostay ew poley kiçekem lêy dexwênd, daway le fêrxwazan kird biçinewe mal û pirsîyar le dayegewre û bawegewreyan biken civakî ew deme çon bûwe. Kiçekem hate mal û pirsîyarî kird çon bikat, çunke dayikûbabî min û dayikûbabî bawkî danîştûy dû herêmî cuday welat bûn. Lew poleda fêrxwazî koçhênî têda nebû, belam ger heba, aya rahênanî wehayan çon çareser dekird?

Nimûneyekî dîke ew sê kure koçhêneye ke Inger Tinglev (2005) le tojînewekeyda basyan dekat. Mamostay swêdî dawa le pol dekat parçe honraweyekî xoyan layan ciwane, amadey biken bo sbey. Kurekan têgeyiştin ke bas le honrawey swêdîye. Helbet em rahênaneyan pê saz nekira û sbey bebê honrawe hatine polewe. Ger mamosta gutibay êweş honrawe be zimanî xotan helbijîrin û xotan amade bike be swêdî rûnî bikenewe, ewa emanîş beşdarî rahênaneye debûn û sûdîş werdegîra le zanistî zûtiryan. Leser nekirdin debête hokar bo perawêzxistinî em kurane bewey deçinewe rîzî piştewe û le nêw xoyanda be zimanî xoyan deykene giftûgo û beweş her xoyan çalakane debine hokarî dabiranyan le xwêndin.

Şêwazêk bo wirdbûne le astî têgeyiştinî fêrxwaz, eweye dawayan lê bikeyt be şêwey corawcor bas lew babete biken ke fêrî bûn. Derbirînî fêrxwaz le fêrbûnî xoy deşêt be axaftinî zarekî bêt, hêlkarî û nîgarkêşî, yan nimayîş bêt.

---

<sup>196</sup> Govarî nîgarbêj: comic magazine govarî weha çîrok be nîgarkêşî degêrête.

Binemay dûhem ke Cummins diyarî dekat, *“serincgîrî le ziman”*, delêt mamosta debêt agadar bêt lew rehende zimanekîyey babetî waneke heyetî. Fêrxwaz, cige lewey debêt fêrî wişe, destewaje û çemikî pêwîst bin ke bo derbirînî ew zanyare dêne bekarhênan, debêt agadarîş bin lewey ew zaniste çon dête derbirîn. Emeş her le salanî berayî fêrgewe daway mamostay weha dekat astî başî hebêt lew zanistey degutirêtewe. Katêk fêrxwaz sergerimî ezimûnêkin, bo nimûne kelupelî dakewte<sup>197</sup> û serkewte,<sup>198</sup> girînge derfetyan hebêt bo derbirîn lewey fêrî bûn, ewca be harîkarîy mamosta ew şewazî derbirîne fêr bibin ke bawe le ravey siruştasîda. Kewate lay zarokî biçûk, debêt derbirînî zanist sereta zarekî bêt û paşan rû le nûsîn bikat. Helbet dawa le zarokî biçûk nakirêt ezimûnname darêjin belam dekirêt aşina bin be raportandinî lew babete. Deşêt bo nimûne diyarîkirdinî serdêr bikene destpêk, paşan lîstêk rêz biken be kerestey bekarhatû, mebestî tojîneweke aşkira biken, çîyan kird û le kotada geyîştine çî. Bem şewaze zarok fêr debin ziman bew core bikar bihênin ke dîskorsî siruştasî daway dekat.

Binemay sêhem, *“serincgîrî le bekarhênanî ziman”*, basî le bekarhênanî zimane lay fêrxwaz xoy, ke fêrxwaz xoy derfetî hebêt hem bo derbirîn le zanyar û hem bo afirandinî zanyar. Lêreda dîdêkî berfirewan le ziman detwanêt derfet bidate fêrxwaz bo afirandinî huner, honrawe, wêje û muzîkî peywest be babetî wanekewe. Le axaftinî zanyar û firewandinî riwangey zanistaneda, dekirêt şewazî ciwankaraney firecor bo derbirîn bête bekarhênan. Bem core ziman be şewazêkî berîn letek babetî waneda dêne têkbestin.

Ewey debête binaxey ew sê binemaye û herweha binaxey têkbestinî firajûtinî ziman û babetî wane, bûnî karlêke hem le nêwan mamosta û fêrxwazda û hem le nêwan fêrxwaz xoyanda. Ew yarmetîyey mamosta pêşkeşî dekat debête hoy firewandinî ew gencîneyey fêrxwaz heyetî û Vygotsky le bîrdozekey xoyda derbarey *“nêzîktirîn zonî firajûtin”* (ZPD) basî dekat. Fêrxwaz bo derbirîn le zanyar, le seretada zimanêk bekar dehênêt adgarî zimanî rojaney pêweye, belam be yarmetîy çalakaney zimanekîy mamosta le mawey karekeda, fêrxwaz fêr debêt zimanêk bo derbirîn lew zaniste niwêyey xoy bekar bihênêt rûy le *“zimanî zanyarbêj”* bêt. Kewate mamosta û fêrxwaz be şeweyek le zanyar ko debinewe ke fêrxwaz xoy têgeyîştinî xoy helbestêt û hawkat twanayîş peyda bikat bo derbirîn lew zaniste.

Gibbons (2006a) em prosey fêrbûne weha rave dekat: *fêrxwaz destpêk le rêy zimanewe fêrî zanist debêt, ewca, leber ewey mamosta serinc le ziman gîr dekat, fêrxwaz fêrî ziman debêt, paşan fêrxwaz dekewêtewe ser fêrbûnî zanist le rêy zimanewe, belam em careyan le astêkî helkişawtirda.*

Laberhemêkî geş lem rêbaze, ke sûdî bo fêrxwazî serbe yekem zimanîş heye, eweye fêrxwazî serbe zimanî dîke detwanin têhelkîşî karûbarî pol bibin bê ewey dabirên le prosey firajûtinî zimanî dûhem, ke swêdîye. Fêrxwazî ser be zimanî dîke, le birî ewey le pol dabirên û le penawe xerîkî fêrbûnî zimanî swêdî bin, her le polekeda firayay beşêkî berînî ew firajûtine dekewin.

Belam em rêbaze mercî giranî heye Leser mamosta û daway lê dekat derikî hebêt bo norey ziman le fêrkarîda, daway lê dekat harîkar bêt letek mamostay babetî dîkeda bo rêkxistinî waneke be şeweyek fêrxwazî cêy mebest lêy sûdmend bêt.

Helbest aşkiraye ke mamosta le karûbarî xoyda boy heye kerestey hemecorî fêrkarî bekar bihênêt, belam girîng eweye mamosta, rehende zimanekîyekanî nêw babeteke û herweha pêwîstîyekanî fêrxwaz bikate serşar bo planrêjîy wane û çalakîy nêw pol. Kewate karûbarî mamosta naşêt be darêjgey pêşkat biryarde araste bikirêt.

<sup>197</sup> Dakewte: şitêkî jêr aw bikewêt, pêçewaney *“serkewte”*, biriwane Celîzade, *“Zarawesazîy pêwane”*.

<sup>198</sup> Serkewte: şitêkî ser aw bikewêt, pêçewaney *“dakewte”*, biriwane Celîzade, *“Zarawesazîy pêwane”*.

Ew tojeraney dîvçûnyan hebûwe derbarey ew mamostayaney fêrbûnî ziman û fêrbûnî babet têk debestî, nimûneyan pêşan dawey lewey çon mamosta detwanêt yarmetîy firajûtîni zimanekîy fêrxwaz bikat. Derewianka (1991) rûnî dekatewe mamostay Awistralya çon kar letek zarokî biçûk deken derbarey babetî “berd” û dawa le fêrxwaz deken norey “*zanistkar*” bigirin û bikewine rîşedozi û şirovekarîy babeteke. Schleppegrell & de Oliveira (2006) berhemî projeyekî waney mêjû şirove deken têyda fêrxwaz fêrî derbirîn debin le zanistî mêjû be zimanêkî zanyarbêj ewîş le rêy giftûgoy geldestewe derbarey hem ziman û hem nêwerokî kitêbekanî mêjû.

Gibbons (2006) tojînewey heye le karî mamosta çon rêberayetîy fêrxwaz dekat le rêy çend rîşedoziyek derbarey magnêt û hawkat yarmetîyan dedat bo derbirîn le encamî rîşedoziyekanî xoyan le çêwey dîskorsêkî siruştanasaneda. Kramer-Dahl et al. (2007) şirovekarîy heye derbarey karî mamosta le waney civaknasîda ke hewil dedat bo serxistinî derikî fêrxwaz le dozekanî serbe danîştwan û hawkat peydozi dekat le twanayan bo derbirîn ew zaniste. Hammond (2006) tojînewey heye derbarey hewilî mamosta bo têkbestîni ziman û nêwerok le waney wêjeda.

Xalî hawbeş le gişt ew tojînewaneda birîtîye le têkbestîni waney patewpatî ziman letek waney babet, herweha rexsandinî derfetî berheste bo fêrxwaz fêr bin bas “le” ziman biken, û fêrî nexşî nûsîn bin. Fêrxwaz, hengaw be hengaw, fêr debin norey “*zanistkar*” bigirin û têkstî weha darêjin xoteyar bêt.

Ew tojînewane pêşanîşî deden ke fêrxwaz, bedem peredan be twanay derbirînî pitir patewpat le derikî xoyan, pereş deden be derikî rojanebînî zûtirî xoyan berew derikêkî pitir sîstembend û taybetmend. Fêrxwaz rastewxo neçûne ser janrekanî zimanî nûsîn, belkû firajûtînyan pilepile û be yarmetîy mamosta bû. Paş axaftinekanî sereta ke fêrxwaz deybêt letek kesani nasyarda, degene bêjandinewe ke janreyekî axaftinî rojaneye û fêrxwaz baş şarezayetî. Bêjandinewe daway huner dekat bo mewdagirtin le nêwerok, ke mirov le derikî beranberewe bête go, basekey rageyen bêt, be zimanêkî patewpat bête go.

Norey mamosta le bêjandineweda birîtîye le yarmetîdanî bêjandin û amajedan be diyardey zimanekîy weha ke bêjandin lêy sûdmend debêt. Bo nimûne bekarhênanî awelkar bo derbirîn le zincîrey kat: “sereta... ewca... paşan...”.

## **Bernamerêjîy wane**

Kramer-Dahl et al. (2007) sîstemêkî “potan”<sup>199</sup> bekar dehênêt bo rûnkirdinewey dariştinî wane le layen mamostawe be mebestî yarmetîdanî fêrxwaz bo firajûtinî rûwew zanistêkî pitir taybetmend û zimanêkî zêdetir xoteyar. Mamosta bedem katewe rahênanî diwartirî dedaye fêrxwaz, hem le rûy zanistewe û hem le rûy zimanewe. Em modêlê lêreda pêşan dedirêt berhemî ew tojeraney kirdote serşar bo pêşandinî bernamerêjîy wane le zaroxane û salanîy berayî fêrgeda be mebestî serxistinî hem zimanzanî û hem babetzanîy fêrxwaz. Kewate em modêlê nimûneyekî dîkey tazeye serçawe le modêlî Kramer-Dahl et al. degirêt, nek heman modêl.

Tewerî asobar, tewerî-X, firajûtinî ziman pêşan dedat le astêkî sakarewe bo astêkî balatir. Tewerî stûnbar, tewerî-Y, firajûtinî zanistî babet pêşan dedat le sanawe bo aloz. Mamosta bo yarmetîdanî firajûtinî hem ziman û hem zanistî fêrxwaz, wanbêjîyekey xoy weha bernamerêj dekat le goşey desteçepî xwarewe (1A) destpê bikat û ewca hengaw be hengaw, be rahênanî hemecor,

---

<sup>199</sup> Potan: coordinate system, sîstem yan tewerî potan, sîstemêke bo diyarîkirdinî şiwênî xalêkî taybet be yarmetîy çend tewerêkî yektirbir, jimarey tewerekan wabestey jimarey rehendekanî sîstemekeye.

berokgîrîyekan ziyad bikat rûwew goşey desterastî serewe (3D). Her bo ewey modêleke rûntir bêt, firajûtinî ziman be pîtî A-D û firajûtinî zanistîş le 1-3, le sakar û berhestewe bo aloz nîşane kirawin.

Dekirêt şêwazî em modêle berawird bikeyn be sîstemtî potanî Cummins (biriwane pajî pêncem) ke têyda firajûtinî zimanî dûhem le sakar û berhestewe heldekişêt bo aloz û derhest. Le fêrkirdinî fêrxwazî serbe zimanî dîke girînge mamosta le seretada cexit bixate ser helkişan bo astêkî başî zanistî û mercî zimanekî sûktir bikat.

Deysa planî wane deşêt le xaney 1A we dest pêbikat û biçête 1B & 1C û paşan helkişêt bo 2A, 2B & 2C û... htd. Bew core planeke rewteki lem babetey lê saz debêt:

- 1A - bîrokebarane
- 1B - bêjandinewe
- 1C - gutûbêj
  
- 2A - wirûjandinî pirsiyarî niwê
- 2B - bêjandinewe
- 2C - encamî niwêy peywendî be basî zûtir
  
- 3A - wirûjandinî pirsiyarî niwê
- 3B - bêjandinewe
- 3C - girdkirdinewey encamekan
- 3D - pêşkeşkarîyekî ferimî

Mamosta le rêy em planewe rêniwênîy firajûtin dekat le astêkî berhestewe bo astêkî derhest, le pirsiyarî diyarîkirawewe bo giştandin û le saxtarêkî zimanekî rojanewe bo zimanekî pitir zanyarbêjî patewpat, ke hem zimanî ferimîy axaftin û nûsîn degirêtewe, hem destawêjî dîkey derbirîn, bo nimûne wêne, muzîk û drama. Hengawekanî berayî weha başe le *“grûpî ziman”* da piyade bikirên bo ewey fêrxwazî dîkeş ke ser bew zimanen, beşdarî bîrokebaraneke bibin. Deşkirêt fêrxwaz beşdarî dû grûp bibin: *“grûpî binema”* û *“grûpî şarezayan”*. Le grûpî corawcorî şarezayanda xerîkî tojînewey corawcor debin û paşan degerênewe bo grûpî binema û bas lew zaniste bo fêrxwazanî dîke deken ke le grûpî şarezayanda peydayan kirdûwe.

Em şêwazî kare derfetî xorisk dedate fêrxwaz bo derbirîn lew zanistey peyday kirdûwe. Letek gişt helkişanekî mercî zanistî, wate letek her hengawêk bo helkişan be tewerî stûnî zanyarda, le zimanda degerênewe bo rahênanî sakar û lewêwe heldekişêyn bo astî zimanekîy beriztir. Bo zarokî biçûkî zaroxane û salanî berayî fêrge, lewaneye weha baş bêt kar tenha be çend hengawêk bikeyn. Belam mamostay polî beriztir detwanin gişt hengawekan piyade biken. Em kareş daway terxankirdinî katî tewaw dekat bo her mijarêk (têma, babetî xwêndin). Her mijarêk, lanîkem çend hefteyekî pêwîste bo bizawtin le 1A bo 3D, lewaneyişe çend mangêk. Le rêy têkbestinî babetî cudawazewe, ne tenha babet û ziman belkû letek ewanîşda babetî cud, be hunerîşewe, detwanîn beşêkî zorî xwêndineke berew yek mijar araste bikeyn.

3	3A	3B	3C	3D
Dijwestan heye le nêwan serçawekanda, zanîni pisporane beranber diyardey rojane, giştandinî zanyar	Pirsiyarî niwê →	Bêjandenewe be yarmetîy mamosta →	Girdkirdinewey encam, planrêjîy raportandin û pêşkeşkarî →	Pêşkeşkarîy ferimî be têkst, wêne û şêwazî dîkey rageyn
2	2A	2B	2C	
Serçawey firecorî zanyar	Wirûjandinî pirsiyarî niwê, axaftin derbarey çonetîy bersiv, dariştinî şêwazî kar →	Bêjandenewe be yarmetîy mamosta →	Encamî niwê debestirênewe be encamî zûtirewe	
1	1A	1B	1C	
Serçawey takuteray zanyar	Bîrokebarane le grûpda →	Bêjandenewe be yarmetîy mamosta →	Gutûbêj derbarey ew dozane y dêne arawe	
	A	B	C	D
	Bestênbend, naferimî le grûpî biçûkda	Xoteyar, gutarî ferimî, raport le beranber polda û be harîkarîy mamosta	Gutarî xoteyar, riwangey firecor	Dariştinî têkstî ferimî, be nûsîn, gutar, wêne û... htd.

Bo fêrxwazî serbe zimanî dîke ke hêştay zimanî swêdîyekey zor baş nîye, harîkarîy mamostay zimanî dayikza, lem buwareda zor girînge. Bo geyîştinî fêrxwazî lew core be astî zanistîy pêwîst, lewaneye weha baş bê jîmarey babetekan kem bikirêt belam bê kemkirdinewey qûlî xwêndineke. Wate next û puxt, karî tewaw Leser çend babetêkî kem bikirêt baştîre le karî nîweçil le zor babetda. Xalî geş bo firajûtinî hem ziman û hem zanist lay fêrxwaz, rêk geyîştinî fêrxwaze bew astaney mercî zanistîyan heye û berokgîrîy têda debînin.

«...»

## Serçawe

Abrahamsson, Tua & Bergman, Tua (red.) (2008). Tankarna springer före. Att bedöma ett andraspråk i utredning, Stockholm: Stockholm universitets förlag.

Au, Katheryn; H. & Asam, Claire, L. (1981). Effective literacy instruction: Findings of the Kamehameha elementary education program. I: Flood James, L, Heath, Shirley, B. & Lapp, Diane (red.) Handbook of Research on Teaching Literacy Through the Communicative and Visual Arts. New York: Macmillan Library reference USA, s. 688-693.

Axelsson, Monica (2004). Skolframgång och tvåspråkig utbildning. I: Hyltenstam, Kenneth & Lindberg, Inger (red.) Svenska som andraspråk - i forskning, undervisning och samhälle, Lund: Studentlitteratur, s. 503-537.

Axelsson, Monica (2005). Litteracitetsutveckling i Stockholms flerspråkiga forskolor. I: Axelsson, Monica, Rosander, Carin & Sellgren, Mariana, (red.) Stärkta trådar Flerspråkiga barn och elever utvecklar språk, litteracitet och kunskap. Stockholm: Rinkeby språkforskningsinstitut.

Axelsson, Monica, Rosander, Carin & Sellgren, Mariana (red.) Stärkta trådar - flerspråkiga barn och elever utvecklar språk, litteracitet och kunskap. Stockholm: Rinkeby språkforsknings institut.

Bachman, Lyle, F. & Palmer, Adrian, F. (1996). Language Testing in Practice. Designing and Developing Useful Language Tests. Oxford: Oxford University Press.

Baker, Colin (2001). Foundations of Bilingual Education and Bilingualism. Clevedon: Multilingual matters.

Barton, David (2001). Literacy in everyday contexts. I: Verhoeven, Ludo & Snow, Catherine (red.) Literacy and Motivation. Reading Engagement in Individuals and Groups, London: Lawrence Erlbaum associates. Publishers.

Barton, David & Hamilton, Mary (1998). Local Literacies. Reading and Writing In one Community. London: Routledge.

Barton, David, Hamilton, Mary & Ivanic, Roz (red.) (2000). Situated Literacies, Reading and Writing in Context. London: Routledge.

Baynam, Mike (1993). Literacy in TESOL and ABE: Exploring common themes. Open letter, 2:2, s. 4-16.

Bergman, Britta & Nilsson, Anna-Lena (1999). Teckenspråket. I: Hyltenstam, Kenneth (red.) Sveriges sju inhemska språk. Ett minoritetsspråksperspektiv. Lund: Studentlitteratur, s. 329-351.

Bergman, Pirkko; Sjöqvist, Lena; Bülow, Kerstin & Ljung, Birgitta (1992). Två flugor i en smäll. Att lära på sitt andra språk. Stockholm: Liber.

Björklund, Elisabeth (2008). Att erövra litteracitet. Små barns kommunikativa möten med berättande, bilder, text och tecken i förskolan. Göteborg: Acta Gothoburgensis.

Bästa språket. En samlad svensk språkpolitik (2005). Regeringens skrivelse 2005/06:2.

Cazden, Courtney (2001/1988). Classroom Discourse. The Language of Teaching and Learning. Portsmouth: Heinemann.

Celîzade, Mesûd Muhemmed. Saytî Mamosta, [www.mamosta.net](http://www.mamosta.net):

- *Zarawesazîy pêwane* - [http://mamosta.net/Kteeb/Kteebi\\_PDF/ZarawesaziyPeewane.pdf](http://mamosta.net/Kteeb/Kteebi_PDF/ZarawesaziyPeewane.pdf)
- *Mirov û dewrûber* - [http://mamosta.net/Kteeb/Kteebi\\_PDF/Mirov\\_u\\_Dewrûber.pdf](http://mamosta.net/Kteeb/Kteebi_PDF/Mirov_u_Dewrûber.pdf)

Chomsky, Noam (1959). Review of "Verbal Behavior" by B. F. Skinner. Language, 35, s. 26-58.

Christie, Francis (2005). Language education in the Primary Years. Australia: University of New South Wales Press Ltd.

Cummins, Jim (1979). Cognitive/academic language proficiency, linguistic interdependence, the optimum age question and some other matters. Working Papers on Bilingualism, 19, s. 121-129.



- Cummins, Jim (1996). *Negotiating Identities. Education for Empowerment in a Diverse Society*. Ontario: California Association for Bilingual education.
- Cummins, Jim (2000). *Language, Power and Pedagogy. Bilingual Children in the Crossfire*. Clevedon: Multilingual Matters Ltd.
- Cummins, Jim (2006). *Identity texts: The imaginative construction of self through multiliteracies pedagogy*. I: Garcia, Ofelia, Skutnabb-Kangas, Tove & Torres-Guzman, Maria, E. (red.) *Imaging Multilingual Schools. Languages in Education and Glocalization*. Clevedon: Multilingual Matters, s. 51-68.
- Deen, Jeanine; Hajer, Maaïke & Koole, Tom (red.) (2008). *Interaction in Two Multicultural Mathematics Classrooms: Mechanisms of Inclusion and Exclusion*. Amsterdam: Aksant.
- Derewianka, Beverly (2004). *Rocks in the head. Children and the language of geology*. I: Carter, Ronald (red.) *Knowledge about Language and the Curriculum*. London: Hodder & Stoughton, s. 197-215.
- Dyson, Anne, H. (1993). *Social Worlds of Children Learning to Write in an Urban Primary School*. New York: Teachers College, Columbia University.
- Dyson, Anne, H. (1997). *Writing Superheroes. Contemporary Childhood, Popular Culture, and Classroom Literacy*. New York: Teachers College, Columbia University.
- Dysthe, Olga; Hertzberg, Frøydis & Løkenstgard, Hoel Torlaug (2002). *Skriva för att lära. Skrivande i högre utbildning*. Lund: Studentlitteratur.
- Edfeldt, Åke (1982). *LUS. Läsprocessen, grundbok om läsforskning*. Stockholm: Liber utbildningsförlag.
- Edling, Agnes (2006). *Abstraction and Authority in Textbooks. The textual paths towards specialized language*. Uppsala: Acta Universitatis Upsaliensis.
- Van Eerde, Dolly & Hajer, Maaïke (2008). *The integration of mathematics and language learning in multiethnic schools*. I: Cesar, M. & Kumpulainen, K. (red.) *Social Interaction in Multicultural Settings*, s. 269-295.
- Ellis, Rod (1985). *Classroom Second Language Development A Study of Classroom Interaction and Language Acquisition*. Oxford: Pergamon.
- Ewald, Annette (2007). *Läskulturer, elever och litteraturläsning i grundskolans mellanår*. Malmö: Malmö högskola.
- Fasth, Carina (2007). *Sju barn lär sig läsa och skriva. Familjeliv och populärkultur i möte med förskola och skola*. Uppsala: Acta Universitatis Upsaliensis.
- Folkeryd, Jenny (2006). *Writing with an Attitude. Appraisal and Students texts in The School Subject of Swedish*. Uppsala: Acta Universitatis Upsaliensis.
- Fox, Mem (2001). *Läsa högt. En bok om högläsningens förtrollande verkan*. Ystad: Kabusa Böcker.
- Ganuza, Natalia (2008). *Syntactic Variation in the Swedish of Adolescents in Multilingual Urban Settings. Subject-verb order in declaratives, questions and subordinate clauses*. Stockholm: Stockholm University.
- Garcia, Ofelia, Skutnabb-Kangas, Tove & Torres-Guzman, Maria, E. (red.) (2006). *Imagining Multilingual Schools. Languages in Education and Glocalization*. Clevedon: Multilingual Matters.
- Gee, James, P. (1996). *Social Linguistics and Literacies. Ideology in Discourses*. London: Routledge Falmer.
- af Geijerstam, Åsa (2006). *Att skriva i naturorienterade ämnen i skolan*. Uppsala: Acta Universitatis Upsaliensis.
- Gibbons, Pauline (2006). *Stärk språket, stark lärandet. Språk-och Kunskapsutvecklande arbetssätt för och med andraspråkelever i klassrummet*. Uppsala: Hallgren & Fallgren.
- Gibbons, Pauline (2008). *"It was taught good and I learned a lot": Intellectual Practices and ESL learners in the middle years*. *Australian Journal of Language and Literacy*, 31:2, s. 155-173.
- Gustavsson, Lennart (1988). *Language Taught and Language Used. Dialogue Processes in Dyadic Lessons of Swedish as a Second Language Compared with Non-didactic Conversations*. Linköping: TEMA Communication Studies, University of Linköping.
- György-Ullholm, Kamilla (2010). *Flerspråkighet, enspråkighet och etnisk identitet*, I: Musk, Nigel & Wedin, Åsa (red.) *Flerspråkighet, identitet och lärande. Skola i ett föränderligt samhälle*. Lund: Studentlitteratur.

- Hagberg-Persson, Barbro (2006). Barns mångfaldiga språkresurser i skolan. Uppsala: Skrifter utgivna vid Uppsala universitet.
- Hagtvet, Bente, E. (2002). Skriftspråsutveckling genom lek. Hur skriftspråket kan stimuleras i förskoleåldern. Stockholm: Natur och Kultur.
- Halliday, M. A. K. (1993). Towards a language-based theory of learning. *Linguistics and Education*, 5, s. 93-116.
- Halliday, M. A. K. (2004). *An Introduction to Functional Grammar*. 3:e utgåvan. Reviderad av Matthiessen, C. M. I. M. London: Hodder Arnold.
- Hammond, Jennifer (2006). High challenge, high support. Integrating language and content instruction for diverse learners in an English literature classroom. *Journal of English for Academic Purposes*, 5, s. 269-283.
- Hansegård, Nils, E. (1968). *Tvåspråkighet eller halvspråkighet?* Stockholm: Bonniers.
- Hatch, Evelyn, M. (1979). Discourse analysis and Second Language Acquisition. I: Hatch, Evelyn, M, (red.) *Second Language Acquisition. A book of readings*. Rowley, Mass. Newbury House, s. 401-435.
- Heath, Shirley, B. (1983). *Ways with Words: Language Life and Work in Communities and Classrooms*. Cambridge: Cambridge University Press.
- Helot, Christine & Young, Andrea (2006). Imaging multilingual education in France. A language and cultural awareness project at primary level. I: Garcia, Ofelia; Skutnabb-Kangas, Tove & Torres Guzman, Maria, E. (red.) *Imaging Multilingual Schools. Languages in Education and Glocalization*. Clevedon: Multilingual Matters, s. 69-90.
- Hyltenstam, Kenneth & Tuomela, Veli (1996). Hemspråksundervisningen. I: Hyltenstam, Kenneth (red.) *Tvåspråkighet med förhinder? Invandrar- och Minoritetsundervisning i Sverige*. Lund: Studentlitteratur, s. 9-109.
- Håkansson, Gisela (1995). *Yla som vargar tala som folk. Om djurens och Människornas kommunikation*. Stockholm: Liber.
- Isling, Åke (1991). Från Luther till LTG. I: Malmgren, G. & Thavenius, J. (red.) *Svenskämnet i förvandling. Historiska perspektiv – aktuella utmaningar*. Lund: Studentlitteratur, s. 140-157.
- Johansson i Backe, Kerstin (2003). *Som om jag inte fanns*. Stockholm: Rabén & Sjögren.
- Johansson, Ken & Hayes, Debra (2008). "This is as good as it gets ": Classroom lessons and learning in challenging circumstances. *Australian Journal of Language and Literacy*, 31:2, s. 109-117.
- Jönsson, Karin (2007). *Litteraturarbetets möjligheter. En studie av barns läsning i årskurs F-3*. Malmö: Malmö högskola.
- Kjertmann, Kjell (1999). Skriftsprog og skolestart. En effektsundersøgelse i to klasser af en sammenhaengen mellem förskolepaedagogik och laese- och skriveudvikling i skolestarten. Danmark: Sprogpaedagogisk Skriftserie 1 årg 1 nr 1.
- Kramer-Dahl, Anneliese, Teo, Peter & Chia, Alexius (2007). Supporting knowledge construction and literate talk in secondary school studies. *Linguistics and Education*, 18:2, s. 167-199.
- Krashen, Stephen, D. (1982). *Principles and Practice in Second Language Acquisition*. Oxford: Pergamon.
- Lainio, Jarmo (1999). Språk, genetik och geografi – om kontinuitetsproblematiken och debatten om finska som minoritetsspråk. I: Hyltenstam, Kenneth (red.) *Sveriges sju inhemska språk*. Lund: Studentlitteratur, s. 138-204.
- Leimar, Ulrika (1976). *Läsning på talets grund. Läsinlärning som bygger på barnets eget språk*. Lund: Liber Läromedel.
- Liberg, Caroline (2006). *Hur barn lär sig läsa och skriva*. Lund: Studentlitteratur.
- Lindberg, Inger (1995). Referential Choice in Swedish Narrative Discourse. I: *Scandinavian working Papers on Bilingualism (SWPB) nr 10, Centrum för tvåspråkighetsforskning, Stockholms universitet*, s. 1-104.
- Lindberg, Inger (2004). *Samtal och interaktion. Ett andraspråksperspektiv*. 1: Hyltenstam, Kenneth & Lindberg, Inger (red.) *Svenska som andraspråk. I forskning, undervisning och samhälle*. Lund: Studentlitteratur, s. 461-497.

- Lindbladh, S. & Sahlström, F. (red.) (2001). *Interaktion i pedagogiska Sammanhang*. Stockholm: Liber.
- Lundberg, Ingvar & Frost, Jørgen (red.) (1988). *Om Sproglig opmærksomhed*. Hvidbog fra Fredensborg-konferencen 8-10 oktober 1987.
- Macken-Horarick, Mary (1996). *Literacy and learning across the curriculum. Towards a model of register for secondary school teachers*. I: Hasan, Ruqaiya & Williams, Geoffrey (red.) *Literacy in Society* New York: Addison Wesley, Longman, s. 232-278.
- Marainen, Johannes (2007). *Jag – en same i det svenska samhället*. I: Westergren, Eva & Åhl, Hans (red.) *Mer än ett språk. Antologi om flerspråkigheten i norra Sverige*, Stockholm: Norstedts akademiska förlag.
- Mehan, Heugh (1979). *Learning Lessons, Social Organization in the Classroom*, Cambridge: Harvard University Press.
- Mål i mun, Förslag till handlingsprogram för svenskaspråket (2002), Kommittén för svenska språket. Stockholm: Fritzes offentliga publikationer.
- Naucler, Kerstin (2000): "... sen blev det svårare och svårare". Om turkiska och svenska barns socialisation inför skolstarten och deras läsförståelse i år 4. 1: Åhl, Hans (red.) *Svenskan i tiden. Verklighet och visioner* Stockholm: Nationellt Centrum. HLS Förlag, s. 225-243.
- Nya språk lyfter (2008). Stockholm: Skolverket.
- Ogulnick, Karen (2006). *Popular education and language rights in indigenous Mayan communities. Emergence of new social actors and gendered voices*. I: Garcia, Ofelia, Skutnabb-Kangas, Tove & Torres-Guzman, Maria, E. (red.) *Imaging Multilingual Schools, Languages in Education and Glocalization*, Clevedon: Multilingual Matters.
- Philips, Susan, U. (1993). *The Invisible Culture, Communication in Classrooms and Community on the Warm Springs Indian Reservation*, Illinois: Waveland Press, Inc.
- Schieffelin, Bambi, B. & Ochs, Elinor (1986). *Language Socialization Across Cultures*, Cambridge: Cambridge University Press.
- Schleppegrell, Mary, J. (2001). *Linguistic features of the language of schooling*. *Linguistics and Education*, 12:4, s. 431-459.
- Schleppegrell, Mary, J. (2004). *The Language of Schooling A Functional Linguistics Perspective*, London: Lawrence Erlbaum Associates, Publishers.
- Schleppegrell, Mary, J. & Oliveira, Luciana C. (2006). *An integrated language and content approach for history teachers*. *Journal of English for Academic Purposes*, 2006:5. London: Elsevier, s. 254-268.
- Sinclair, John, Mch. & Coulthard, Malcolm, R. (1975). *Towards and Analysis of Discourse. The English Used by Teachers and Pupils*, London: Oxford University Press.
- Slotte-Lüttge, Anna (2005). *Ja vet int va de heter på svenska. Interaktion mellan tvåspråkiga elever och deras lärare i en enspråkig klassrumsdiskurs*, Åbo: Åbo akademisförlag.
- Snow, Catherine (1977). *The development of conversation between mothers and babies*. *Journal of Child Language*, 4:1, s. 1-22.
- Street, Brian, V. (1984). *Literacy in Theory and Practise*, Cambridge: Cambridge University Press.
- Street, Brian, V. (red.) (1993). *Cross-cultural Approaches to Literacy*. Cambridge: Cambridge University Press.
- Street, Brian, V. (1995). *Social Literacies Critical Approaches to Literacy in Development, Ethnography and Education*. New York: Longman Publishing.
- Communicative Competence: Some roles of Comprehensible Input and Comprehensible Output in its Development*. I: Gass, Susan, M. & Madden, Carolyn, G. (red.) *Input in Second Language Acquisition*. Rowley, Mass: Newbury House Publishers, s. 235-256.
- Säljö, Roger (2000). *Lärande i praktiken. Ett sociokulturellt perspektiv*. Stockholm: Prisma.
- Säljö, Roger (2005). *Lärande och kulturella redskap. Om lärprocesser och det kollektiva minnet*. Stockholm: Norstedts akademiska förlag.
- Söderberg, Margareta (2002). *Interaktion i språkbadsdaghem*. Vasa: Universitatis Wasaensia.

- Söderbergh, Ragnhild (1988), Barnets tidiga språkutveckling. Malmö: Gleerups.
- Teleman, Ulf (1979). Språkrätt Lund: Liber Läromedel.
- Teleman, Ulf (1991). Lära svenska. Om språkbruk och modersmålsundervisning Stockholm: Almqvist & Wiksell.
- Thomas, Wayne, & Collier, Virginia (1997). School Effectiveness for Language Minority Students. NCBE Resource Collection Series, No. 9, George Washington University, <http://www.ncbe.gwu.edu/ncbepubs/resource/effectiveness>.
- Thomas, Wayne & Collier, Virginia (2002). Reforming educational policies for English language learners means better schools for all. *The State Education Standard*, 3:1. (The quarterly journal of the National association of State Boards of Education, Alexandria, Virginia).
- Tinglev, Inger (2005). Inkludering i svårigheter: Tre timplanebefriade skolors svenskundervisning. Umeå: Umeå universitet.
- Trageton, Arne (2005). Att skriva sig till läsning. IKT i förskoleklass och skola. Stockholm: Liber.
- Tvingstedt, Anna-Lena (1993). Sociala betingelser för hörselskadade elever i vanliga klasser. Stockholm: Almqvist & Wiksell.
- Tvingstedt, Anna-Lena, Preisler, Gunilla & Ahlström Margareta (1999). Cochleaimplantat på barn: en psykosocial uppföljningsstudie. Malmö: Malmö högskola.
- Wagner, Daniel, A. (1990). Literacy in a Global Perspective. I: Lundberg, Ingvar & Høien, Torleiv (red.) *Literacy in a world of Change*. Stavanger: Centre for reading research.
- Watson-Gegeo, Karen-Anne (1992). Thick explanation in the ethnographic study of child socialization. A longitudinal study of the problem of schooling for Kwara'ae (Solomon Islands) children. *New Directions for Child Development*, 58, s. 51-66.
- Wedin, Åsa (2004). Literacy Practices in and out of School in Karagwe, The Case of Primary School Literacy Education in Rural Tanzania. Doktorsavhandling, Stockholm: Centre for research on Bilingualism, Stockholms universitet.
- Wedin, Åsa (2009). Monologen som en resurs i klassrummet. *Pedagogisk forskning i Sverige*, 13:4, s. 241-256.
- Wedin, Åsa (2010). A restricted curriculum for second language learners – a self-fulfilling teacher strategy? *Language and Education*, 24:3, s. 171-184.
- Wedin, Åsa (2011). Utveckling av tal och skriftspråk hos andraspråkselever i skolans tidigare år. *Didaktisk tidskrift*, 20:2, s. 95-118.
- Vesteraas Danbolt, Ann-Marit & Iversen Kulbrandstad, Lise (2008). Klasseromskulturer for språklcering. *Didaktisk fornying i den flerkulturelle skolen*. Oslo: Oplandske Bokforlag.
- Westergren, Eva & Åhl, Hans (red.) (2007). *Mer än ett språk: en antologi om flerspråkigheten i norra Sverige*. Stockholm: Norstedts akademiska förlag.
- Viberg, Åke (1993). Andraspråksinläring i olika åldrar. I: Ceru, Eva (red.) *Svenska som andraspråk. Mera om språket och inläringen*. Lärarbok2. Stockholm: W & K Utbildningsradion, s. 13-83.
- Wittenstam, Rune, Nordling, Erik, Fröroth Marianne & Fröroth, Rune (2002). *Vida världen3*. Stockholm: Almqvist & Wiksell.
- Wong-Fillmore Lily & Snow, Catherine (2000). What Teachers Need to Know About Language. Clearinghouse on Languages and Linguistics. Special Report.
- Värna språken. Förslag till språklag (2008). Språklagsutredningen. Stockholm: Fritzes.

«...»